

Digel Bêmilkkirinê Kitêbeke Çalakîyan



- 3 *DESPOJATE!* XWE BIWEŞÎNE
Û XWE PAK BIKE! AMRAZÊN
GÎYANÎ BO BÊMILKBÛNÊ
Pêşgotin Rubén
Gaztambide-Fernández
- 7 Malavayîname
- 9 BÊMILKBÛNÊ GIRINGÎYA XWE
HEYE: VEXWENDINEK
Koma Lêkolanê ya Zîwanên Xweragir
- 15 TÊKOŞANA ZÎWANÊN XWERAGIR
Koma Lêkolanê ya Zîwanên Xweragir
- 33 XWÎNA GIRAN
Naomi Rincón Gallardo
- 53 LUZ, CLARÃO, FULGOR/
RONAHÎ, PÊT, FULGOR
Sílvia das Fadas
- 75 LI DOR Û BERÊ ÇEMEKÎ
Rojda Tuğrul
- 97 DESPÎNA
İpek Hamzaoğlu
- 121 WARÊN KAXIZ
Janine Jembere
- 145 QEWÎNÎYA CIRBOQÊ BIKÎS
Naomi Rincón Gallardo
- 169 XEMXURÎ Û HALGUHESTIN
Berhanu Ashagrie Deribew
- 193 HEZKIRINEKE REXNEYÎ LI SER
KÊLIYA HEVÇERX A BAŞÛRÊ
GLOBAL
Paşgotin Elizabeth W. Giorgis
- 197 SERVEHÎ:
ZÎWANÊN XWERAGIR PROTOKOL
Koma Lêkolanê ya Zîwanên Xweragir
- 205 Digel Bêmilkkirinê
Kartên Çalakiyan

Digel Bêmilkkirinê

DIGEL BÊMILKKIRINÊ

Kitêbeke Çalakîyan

K. Verlag
2021

BERHANU ASHAGRIE DERIBEW li Dibistana Alleyê ya Hunerên Ciwan û Sêwiranê ya li Zankoya Addis Ababayê hunermendekî hunerên dîtbar û mamostayê hunerê ye. Xebata wî bi pirranî dêhna xwe li qonaxên hevçerxkirinê yê cîgehên/derên bajarî û mercên neseqamgîr ên jîyanê dicivîne. Projeyên wî bi pirranî qonaxbingehî ne û li derveyê nêvengên stûdyoyê tên berhembênan. Berhanu xebatên xwe yê hunerî li Hebeşistanê û li welatên dereke li ciyên curecur pêşkêş kirine û nişan dane.

ANETTE BALDAUF vekolîner û perwerdekareke civakî ye. Bala wê li ser yektirbirrana hunerê, pedagogiyê û polîtîkaya cîgehî/xakê ye. Baldauf ji mêj ve di projeyên vekolanê yê hunerbingehî yê hevbeş de dixebite, yê dîtir tê de, her wekî *Qadên Şîrîkandinê*. *Sepan û Bînayiyên Hunerî yê Guheranê* (li gel Stefan Gruber, Annette Kraussê, Hong-Kai Wangê, Mara Verliçê, Vladimir Miller, Julia Wiegler û Moira Hilleyê sala 2017an). Baldauf li Peymangeha Hunerên Ciwan a Vîyanayê li Awusturyayê profesor û rêvebera cigîr a bernameya pileya doktorayê ya Sepanî ye.

SÍLVIA DAS FADAS (bi navê 'eslî Sílvia Salgueiro) filîmçêker, vekolîner û perwerdekarek e ku li başûrê Portûgalê akincî ye. Fadas li Peymangeha Hunerên Ciwan a Vîyanayê berendameke pileya doktorayê ya Sepanî û li Navenda Keltor û Polîtîkaya Cî, Navenda Gera Derçûnê, CUNYyê vekolînerêke mêvan e. Bala wê li ser polîtîkaya berevnaviyî sepanên sînemayî û li ser sînemayê wekî rêyeke bihevrebûnê di bêaramiyê û dilmayîtiyê de ye.

IPEK HAMZAOĞLU hunermend, filîmçêker û vekolînerêk e ku li Vîyanayê û li Stembolê akincî ye. Xebata wê dêhna xwe li cîgehan û li şeweyên cîyawaz ên çirokgotinê, rûhevûnan, melankolîyê û zincîreyên sivik dicivîne. Hamzaoğlu hevdamezirînerêke çendî projeyên kombendî yê li ser feminîzma kûyir, polîtîkaya arxîvî, hevalîniyê û berhembênanana zanyariyê ya kombend e, her wekî Mercury Productions (2015), "ff. Feministisches Fundbüro" (2015), Hayırlı Evlat (2017).


JANINE JEMBERE hunermend, filîmçêker û vekolînerêk e ku li Vîyanayê û li Berlînê akincî ye. Jembere di komên cîyawaz ên li ser performansan û projeyên perwerdeyî, vîdyoyî û dengî de dixebite. Xebatên wê der barê nefsiyê û bedenê de ne û bi pirranî têgehên nimanê û wergerbariyê, cudakarîya dijî kêmendaman, regezê û cinsiyeta civakî didine ber pirsan. Bala wê li ser hev dengvedanên zanyariya şênberkirî, hayirarkiyên nefsiyê ye û li ser têgeha bêahengiyê wekî amrazêke ku mirov di nava cîyawaziyê de bihire û bijî.

NAOMI RINCÓN GALLARDO hunermendê berhemên dîtbar, vekolînerêk û xebatkareke warê keltorî ye ku li bajarê Meksikoyê akincî ye. Gallardo projeyên duristkirina cihanên ên rexneyî-mitî çêdike ku berê xwe didine afirandina dij-cihanên li hawirên neo-kolonyal. Xebata wê eleqedarîyên wê yê bi feminîzmên dîkolonyal, kûyirîya rexneya rengan, mosîqaya popûler û ezmûngerayî, gemeyên şanoyê, estetîka BXÇyê (bi xwe çêke), cejnên û sen'etên devokî û zaravayî, fenteziyê û honaka zanistî ya spekulatîv têkelî hev dike û li hev dirikibîne. Wê pileya xwe ya doktorayê ya Sepanî li Peymangeha Hunerên Ciwan a Vîyanayê kuta kir. Gallardo wekî *Miembro del Sistema Nacional de Creadores de Arte 2019-2020 del Fondo Nacional para La Cultura y las Artes* (Endama Pergala Neteweyî ya Afirînerên Hunerê ya 2019-2020an a Fanda Ji Bo Keltorê û Hunerên) piştevaniya darayî werdigire.

ROJDA TUĞRUL hunermend û vekolînerêke navdisiplînî ya ji Amedê ye ku li seretayî li ser teoriyên vekolanbingehî yê babeta xwe nasnav wekî peywendîdarî mekanî dixebite. Projeyên wê bi giştî bi rêya wênekêşanê û înstîleyşînen odîyovîjûwil li vê peywendîya cotebînemayî dikolin. Piştî Pileya Mastirê ya di Zanista Veterineriyê de Tuğrul sala 2016an bi Pileya Mastirê ya di hunerên ciwan de ji Zankoya Artukluyê ya Mêrdînê derçû. Vê pêlê, li Peymangeha Hunerên Ciwan a Vîyanayê ew berendameke pileya doktorayê ya Sepanî ye.

RUBÉN GAZTAMBIDE-FERNÁNDEZ bi lêgerîn û xebata xwe, bi taybetî bala xwe dide di konteksta perwerdeyîyê de pirsên di derbarê sînorên sembolîk, fêlîten afirandina kulturî û pêvajoya danasînê. Ew hev-edîtorê (bi Amy Kraehe û B. Stephen Carpenter re, 2018) kitêba bi navê "The Palgrave Handbook of Race and the Arts in Education" ye. Xebatên wî yê teorîk li ser pêwendiyên navbera afirînerî, de-kolonîyalîzm û piştgiriyê de nin. Ew di Enstîtûya Perwerdeyê ya Ontorîoyê de profesore Kurrikulum û Pedagogiyê, her weha edîtorê kovara *Curriculum Inquiry* ye.

ELIZABETH W. GIORGIS di zankoya Addis Ababayê, di Navenda Xebatên Afrikî, Beşa Hunerên Dîtbarî û Performatîf te doçenta Dîroka Hûnerê, Rexne û Teorîyê ye. Her weha di zankoya Addis Ababayê de serwêra Mûzeyê Hunera Hevçerx: Gebre Kristos Desta Centerê ye. Ew di zankoya Addis Ababayê de wek seroka Fakûlteya Hunerên Dîtbarî û Performatîf û Enstîtûya Lêgerînê ya Etîyopyayê xebitî. Wê kuratorîya gelek pêşengehan kiriyê, wek edîtor û nivîskara gelek kovar û pirtûkan xebitîye û gelek caran bûrs qezenc kirine. Her weha wê berhema yekemîn "Hunera Modernîst li Etîyopyayê, Ohio University Press, 2019" nivîsiye ku ew modernîzma dîtbarî ya Etîyopyayê di pêwendiyêke berfireh î çandî û entelektûelî de dinirxîne.



Digel Bêmilkkirinê

DIGEL BÊMILKKIRINÊ

Kitêbeke Çalakîyan

PÊŞGOTIN

iDESPÓFATE! XWE BIWEŞÎNE Û PAK BIKE! Amrazên Gîyanî bo Bêmlkbûnê

Rubén Gaztambide-Fernández

Xweweşandin û xwepakkirin, yan jî *despojos*, tiştêkî belave bû ku li Puerto Rîkoyê çêdibû. Heyna ku ez zarok bûm, ku yek piçikekî jî li ber xwe biketa, *abuelitaya* (bi Spanyolî, pîrika) min dianî darû û dermanekî *despojo* jê re lê dikir. Heke xelq ji bextê reş bigazinîya, pêdivîya wan bi *despojoyekê* çêdibû da ku berî wî bextê reş bidana; heke orta jin û mêrekî ne xweş bûya, *despojoyek* dibû çareserî; heke ba û bapêşê bavêta qulpa paşiyê û qet pak nebûya, derman di ser *despojoyekê* re tinebû. Ev *despojo* bo *abuelitaya* min rêya çaresaz bûn ji bo jinavbirina pêsiirtengiyên manewî û enerciyên nerênî yên ku dibûne bayîsê her tengasiyekê. *Despojarseyê* dê cinên nepak, çavsûtî û nezerîbûn, lereyên xerab û her nifir yan jî sêhreke neyarên belafiroş bitirsandana û bidana revê. *Despojarseyê* dê xwe biweşanda û pak bikira; da ku tu ji hêzên bêqidoş rizgar bibûyayî; da ku rê xweş bikira li ber şifayê.

Her wiha, li Puerto Rîkoyê texlîdên dîtir ên *despojoyan* yan jî bêmlkbûnê hebûn. Artêşa Dewletên Yekbûyî, bo nimûne, bêtir ji sê parên ji çar parên Viequesa dorje-şaroçke îstimlaq kir da ku bîne bi rê ve behere bizavên serbazî yên ku derbeke wêranker li jîngeh û jîyana nîşteciyên wê yên Puerto Rîkoyî dan. Di 1982yan de, hukimeta mêtîngehkar a Puerto Rîkoyê 'erd û xaniyên nîşteciyên Villa Sin Miedoyê bi navê dewletê îstimlaq

kirin û di wê hengê de pêşenga civakê û dayîk Adolfina Villanueva kuşt. Di nava sî salên dawîn de, banqe û veberhênerên mezin aborîya xwecî îstimlaq kirin û xelq di nava kavlên topavêtinê de û bê par hiştin ji hêz û şîyana biserxwehatinê wekî dûr bimînin ji bobelatên siruştî yên ku di van salên axirîyê de derbên giran li dorgeyê xistin. *Abuelitaya* min digot tiştê ku pêdivîya Puerto Rîkoyê pê heye *despojoyek* (xweweşandin û xwepakkirinek) e; ne ku *despojoya* (îstimlaqkirina) wêranker a mêtîngehkarîyê, digot, pêdivî bi *despojoya* azadker a sawêran û qencên Xwedê heye; xweweşandin û xwepakkirineke gîyanî da ku em vegerine jîyanê.

Ji bo *despojosa abuelitaya* min, pêdivî bi amrazan hebû û çu tişt ji gîhayên şifadar ne giringtir bû. Ev gîhayên ku *abuelitaya* min dianî ji bo *despojoyan* germavên xweweşandin û xwepakkirinê pê amade dikirin hemû zîwanên xweragir bûn, her wekî pûjan, sipend, teraşa gulzer, merzekew, okalîptûs û zîwana sîyamî. Her wisa jî, nivîserên *Digel Bêmlkkirinê: Kitêbeke Çalakîyan* rêzek amrazên bo afirandina texlîdên cîyawaz ên *despojoyan* bi pêş de tînin. Ev amrazên afirandinê yên ku nivîser bi pêş de tînin amraz in ji bo ku em xwe biweşînin û pak bikin ji îstimlaqkirinên mêtîngehkarîya hêzê; ev *despojoyên* li dijî *despojoyan* in. Ev amraz, bêtir ji astengkirinê, ji bo vekirina berê deweranê ne; da ku

em hêzên mêtinkar ên pelixîner bidine ber pirsan, pê re jî, wek *ch'ixiya* ku ramanwer û ektîvîst Silvia Rivera Cusicanqui bi pêş de tîne, da ku “em pelên mirî yên nehewce hemûyan nehêlin, ên ku lêkdanê û hema hema enerjîya elektrîk, pêkdengvedêrîyê, dixitimînin, ya ku rê dide me wekî em tevî nakokîyê bijîn, em pê wê cureyekî hêza bînayîyê hilberînin ku rê dide me wekî em peyda bikin şeweyên dameziranê yên ku rûxarê ji binî de qayîm dikin.”¹

Di nava heft rojan de, ku min serpişkî hebû li Vîyanayê ez li gel vê koma xebatkarên warê keltorî yên civîyayî wekî Koma Lêkolanê ya Zîwanên Xweragir hevbeşîyê bikim, gotûbêjan bikim û fêr bibim, me cureyekî *despojoya* kombendî kir, wate, qonaxeke xweweşandin û xwepakkirinê ku tê re me zanyarî û ezmûn pênase kirin da ku em pîgarîyeke afirîner pê pêk bînin. Afirandina, bi peyvên Rangoato Hlasane, “mercên bo berhevbûna vegêrranên nû,”² vegêrranên li dijî îstimlaqkirinê, vegêrranên bê-milkkirî. Her wisa jî, ev kitêb bêtirî qutîyeke amrazan e; kitêb qutîyeke surprayzan e ji bo hêskirina bizava kirdewar a heyîna me bi xwe; da ku em ji nû ve vegêrrin bê ka em kî ne û çawa bi beranberî em yek û din çêdikin; bi kurtasî, ev kitêb ji bo pedagogîyeke pîgarîyê qutîyeke amrazan e. Ev amraz ji taybetîyên xwecî yên nû dîyar bûyî yên curecur peyda dibin, ên ku ji alîyê vê koma *pedagogistayan* ve bi xwebexşîyeke ku dimsa şêkir a giran û ji ber qonaxên mêtîngehkarîyê bûyî gincî veguhêzin hatin çalakkirin, ne ku ji navê beherin, ber'eks, di nava wan rageşîyên


Cusicanqui yê bi nav kirî de bijîn; da ku enerjîyan vejînin û devên bendavan vekin bo sêhrên gîyanî yên nû yên bûyînên bi zêdebarî mirov ên fenteztîk ên ku rê xweş dikin li ber xweragirîya dijmêtinkar a ku gelên me rexmî îstimlaqkirinê bi xêra wê zindî man.

Ev kombenda rêberên afirîner me vedixwîne ku em serî bikutine hev û ruh bi mîten nû de bînin, li ser robaran li gel bûnewerên derasayî seyr û seferê bikin, derz û qelîştikan tev bidin û hest bikin bi xusareta tiştê ku di qonaxên mêtîngehkarîyê de wan ji me standiye û bermayîyên jehrî yên tiştê wan di nava kavilan de ji me re hêlayî dahênineve. Ev e tevayîya babeta *despojoya* efsûnî – germava xweweşandin û xwepakkirinê ya ku vê koma afirîneran bi amrazên xwe yên ji bo xebata keltorî bo me çêkir; xebitîna bi şeweyekî heçku bê milk bûyî (ne li ser destê) mêtîngehkarîyê, neyî her wekî dawîyeke ku em digihîjinê – lê heçku em dikarin dawîya dawîn feramoş bibin ji mêtîngehkarîya hêzê bi xwe ya ku me bê par û îstimlaq dike, heçku em di nava bêmilkbûnê bi xwe de bijîn – di nava navbera warê *ch'ixi* yê weku Rivera Cusicanqui dibêje, “berxwedanê pêk tîne” û “lêkdanek, krîzek, qeyranek anîye holê, lê her wiha magmaya zîrek ku reng e enerjîyên azadker jê zîl bidin.”³ Ev bo metamorfosîsê amraz in, lê metamorfosîseke afirîner a ku şeweyên berê ji nû ve bi çarçove dike: anarşîst, feminîst, çîrokanî, efsaneyî, ajelî, hov. Amrazên bo berhemhênana sînematografîyên jixweber li cî û warên çaverênkirî, ji bo bê-milkkirina yên berze û ji bîr bûyî di nava girî û şînîyê de; lê her wiha vegeyîyayî di nava yadkirina laqirdîyê û reşxelqî de; da ku mirov bireşîne tovê nû yê ku, wek zîwanên xweragir, distewin li dijî çementoya kirêt a mêtîngehkarîyê; da ku mirov sax bike û xemxurîyê bike; da ku, gava ku devê wê çu caran negihîje hev jî, mirov birînê pak bike; da ku, wek *tlacuache* [cirboqê bikîs; bi Îngilîzî, *opossum*], mirov dîsa bijî jîyana ku mirinê jî çu caran ranewestandiye.

¹ Silvia Rivera Cusicanqui, *Un mundo ch'ixi es posible. Ensayos sobre un presente en crisis* (Buenos Aires: Tinta Limón, 2018), 152–53; wergera nivîskarê.

² Peywendîya şexsî ya Rangoato Hlasane li gel nivîskarê, 26 Reşeme 2020.

³ Rivera Cusicanqui, *Un mundo ch'ixi es posible*, 44; wergera nivîskarê. Ji bo guhertoyeke bi Îngilîzî ya metnê, binihêrin li Pêrista Jêderkan a di vê cildê de.



Dijwateya bêmilkbûnê
ne milkîyet e.
Ne danehev e.
Ne jibîrnekirin e.
Xwedangiringî ye.


— Angie Morrill, Eve Tuck and the Super Futures Haunt Qollective (û Qollektîva Hêlîna Dahatûyên Raser), “Before Dispossession, Or Surviving It” (“Berîya Bêmilkkirinê, Yan Jî Bi Saxî Filitîna Ji Wê”)

MALAVAYÎNAME

Em malavayîyê didine her kesekî û me hemûyan ji bo hevpişkîyê, cîbicîkirina erk û karan û bihevrebûnê, nemaze dema ku kar û bar li ser dîwarê alebilê disekinîn. • Ji bo gelek pêşniyarên wan ên comerdane em malavayîyê didine rexnegirên xwe yê dilgerm: Epifania Amoo-Adareê, Rubén Gaztambide-Fernández, Angela Melitopoulósê, Margarita Palaciosê û Eve Tuckê, ku hemû di tevayîya vê rêwîtiyê de bi me re meşîyan. Em malavayîyê didine Epifaniayê ji bo ku bi destpêşxerîya xwe berê me da gerdûna fêrbûna senifandin û bikaranîna wargehan bi kartêkerî û spas bo xatirxwestina wê ya germ dema ku bere bere me lê da û em çûne hêlên cuda. Em malavayîyê didine Rubén ji bo ku serinca me kêşa ser mercên û paramêtroyên ji bo peywendiyên zincîre. Em malavayîyê didine Angelayê ji bo ku hişt di orta projeya xwe de em daynamîkên vegeerên firehhêl binasin; mala Margaritayê ava ku her tim hêza kartêkê û vîyanê anî bîra me; û mala Eveê ava ku em fêr kirin çawa me yê bendên takekesî bi zembîleke lêkolanê ya kombendî ve girê dana. Mala we hemûyan ava, proje li jêr bayexpêdana we vegeş bû. • Ji bo dabînkirina piştevanîya darayî bo projeyê em malavayîyê didine Fona Zanistê ya Awusturyayê (FWF) û em malavayîyê didine piştevanên xwe yê li Peymangeha Hunerên Ciwan a Vîyanayê: Andrea B. Braidtê, Michaela Glanzê, Annina Müller Strassnigê, Dunja Reithnerê, Renate Lorenzê, Moira Hilleyê û berendamên bernameya pileya doktorayê ya Sepanî, mala wan ava be, nemaze yê ku di henga meşên me yê curecur de tevî me bûn. Em malavayîyê didine Stefanie Sourialê ji bo ku di hewildana me ya bo pêkanîna koroyekê û pêkvestrîna de piştevanî li me kir. Em malavayîyê didine Naoko Kaltschmidtê ji bo vexwendina bo birêxistina nîşandaneke li ser ekranê di mumok kinoyê de. Ji bo tûra pêşîn a sererastkirin û pêdeçûna li ser metna xam em malavayîyê didine Rafal Morusiewicz. Em malavayîyê didine Pelin Tanê ji bo dayîna hindêk fîdbekan. Û em malavayîyê didine K. Verlagê, nemaze Anna-Sophie Springerê, ji bo ku weşandina kitêbê gengaz kir. • Ji bo pêşgotin û gotina wan a dawîn ên dawetkar em malavayîyê didine Rubén Gaztambide-Fernández û Elizabeth Giorgisê. • Naomi malavayîyê dide Rosalinda Dionicioyê, Masha Godovannayayê, Claudia López Terrosoyê, Oliver Martinez Kandt, Jánea Estradayê û Instituto de Artes Gráficas de Oaxacayê (Enstîtuya Hunerên Grafîkî ya Oaxacayê (IAGO)). • Silvia malavayîyê dide mirovên merd û xwedanberhelistî hemûyan ên ku li Alentejoyê ew rastî wan hat, nemaze Joëlle Ghazarianê û Júlia Henriquesê, pê re jî hogir û gundiyên Troviscaisa São Luísê, Odemirayê. • Rojda malavayîyê dide hevalê xwe yê jîyanê Murdoch MacLeod ji bo pêşniyar û piştevanîya wî ya zehf giranbûha û dayîka xwe û bavê xwe ji bo piştevanî û handana wan a di tevayîya vekolana wê de. Herî dawîn malavayîya Rojda Yaşîkê û Ekrem Yıldizî dike ji bo sererastkirin û xwendina dawîn ya wergera Kurmancî. • İpek malavayîyê dide Cemil Hamzaoglu, Laura Nitschê, Malu Blumeê, Melih Görgün, tîma Sinopale 7ê û dê û bavê xwe. • Janine malavayîyê dide Nicole Suzukiyê, Philipp Khabo Koepsell, Regina Sarreiterê, eoto e.V.yê û Berlin Postkolonialê. • Berhanu malavayîyê dide jina xwe ya xoşewîst û pîyar, Liya Girmayê, û dotmîrên xwe yê biçûk, Dina Berhanuyê û Maya Berhanuyê. • Anette malavayîyê dide Eve Tuckê û Silvia Federiciyê ji bo sirûşa wan a mandegar.

Erka peroşbexş û dijwar a li ber me meşa li cîhanê û axaftina ji cîhanê bûnê wekî firehgerdûnê bi xwe ve digire. Cîhaneke ku tê de firehtexlîdîya zindîyan û tiştayan wekî hevsal tîen hêlsengand li nava zanyarîyên û cîhanên pêkhêner.

— Juanita Sundberg, “Decolonizing Posthumanist Geographies” (“Dîkolonîzekirina ‘Erdnîgarên Posthumanîst’”)



BÊMILKBÛNÊ GIRINGÎYA XWE HEYE Vexwendinek

Koma Lêkolanê ya Zîwanên Xweragir

Zîwanên xweragir bizrên kulîyê ne ku bi nebezî li xwe zêde dikin ji derzên talan û tajana mêtîngehkar û rûxana sermayedar. Ku pê de pê de têkoşanên cîyawaz li cîhanê gişî di ber zindîmayîna firehgerdûnê de şer dikin, em tevî vê civatê dibin ji ber ku em vexwendinekê jî dişînin da ku em li xakên bêmilkbûnê hêza veşarî bo afirandina cîhanekê vekolin.

Digel Bêmilkkirinê: Kitêbeke Çalakîyan encama projeyeke vekolanê ya hunerî ya war-navendî ye; kitêb şopên xalên peywendîyê digerin, yên ku me komek hunermendên/vekolînerên dûajo yên xelqê hindêk deverên yekser ketî ber kartêka siyaseta bêmilkkirinê bi rêya xwe de, ya ku tê de em pêk ve meşîyan, li tevî xistin. “Em” a liva nîskê, bêqulbe û firehçeşn pê berdeyam e saz dibe li ser destê komeke girê dayî deverên cihêreng her wekî Sinopê, Addis Ababayê, Amedê, Alentejoyê, Berlînê, Oaxacayê, Zacatecasê û Vîyanayê, ku hemû jî, bi awayekî ji awayan, peywendîdar in li gel Başûrê Global. Em vêk ketin û ji alîyê profesoreke Awusturyayî ya spî, Anette Baldaufê, ya ji bo projeyeke bi sernavê “Bêmilkkirin. Sepanên Hunerê yên Pişt-Beşdar û Pedagogîya Xakê” (2018–2020) ji Fona Zanîstê ya Awusturyayê fon wergirtî ve hatin vexwendin û me li Peymangeha Hunerên Ciwan a Vîyanayê şêwe girt. Têgihana me ya der barê “Bêmilkbûnê” de di sêrî de besta xwe ji kitêba bi navê *Bêmilkkirin: Kiryarîya di ya Polîtîk de* girt, a ji alîyê Judith Butlerê û Athena Athanasiouyê ve hatî nivîsîn, ên ku berevanîyê jê dikin wekî têgeha bêmilkbûnê cotwateyekê hildigire: Bêmilkbûna her wekî rewşa pesenda bi darê zorê ya li ser xakê, bedenên, vîyanan, mafan û peywendîyên civakî bi zoremilî û her wiha şêweyekî bêmilkbûnê ya ku li pey encama qonaxêke timî cîyê dudilîyê û bingeheqels a rajêrîyê ya ku kirdewarîyê pêk tîne me wekî bûnewerên peywendîyî û hevhemet saz dike.¹

Bi lêkvekirina ezmûnên ji şûnwarên ku gelek kes dibêjinê, mal, me dest bi gengeşîyên xwe kir. Em peyivîn li ser listîkên polîtîk ên warşihîtkirinê ku dewlet serkêşîya wan dike, şêweyên neofîbîril ên rapêçkirina ‘erdan, tovrindkirinê û rêveberîyîtiya asayîşgerî, pê re jî li ser çawa bi rêya şêweyên nû yên bendekirinê û kolonîzasyonê bedenên mirovan û der-mirovan dibine maddî û ji dirûvê maddî derdikevin û çawa tundûtûjîya sistematîk a ku îro ji me re wekî mîrate dimîne pê berdeyam e peywendîyên me bi rêk dixê. Me ev têkoşan wekî şêweyên cîyawaz ên bêmilkkirinê pênase kirin û di nava taybetmendîyên van mercan re em li pevgerêdanan gerîyan.

Jêderka sirûşa duyem, û ji gelek hêlan ve tewawker, ji bo vê projeyê ji xebata vê axirîyê ya li ser epîstemolocîyên Başûr hat: ku em tê koşîyan em bi dîr bikevin (her çend em lê bi cî û war bûyî bin jî) ji şêweyekî serdest ê berhêmhênanana zanyarîyê ya Ewrûpanavendî, me ji xwe re kire armanc ku em peywendîyeke germ daynin li gel zanyarî û ezmûnên Xwecî û binecî yên ku ji alîyê û li nava cîhanên cîyawaz ve tîne pêşkêşkirin. Em li têgehên digerin ku tîra rastîyên berçav ên li Başûrê Global bikin – têgehên ku me hêvî dikir em pê bihizirin û hest bikin. Kitêba *Boaventura de Sousa Santos Epîstemolocîyên Başûr: Dadperwerî Li Dijî Epîstekujîyê asoyek* bo me dabîn kir da ku em serê xwe hîn bêtir biêşînin li ser hizrên

¹ Judith Butler & Athena Athanasiou, *Bêmilkkirin: Kiryarîya di ya Polîtîk de* (Cambridge: Polity, 2013).

der barê firehgerdûnîtîyê de û awata me ya bo biparvekirina bi awayê pêkve-heyîna radîkal a firehtexlîdîyeke epîstemeyan, ontolocîyan û polîtîkayê han da.² Me da ser rêçên tundûtûjîya hovane û talan û tajana kavilker û ji xwe pirsî: gelo ew kîjan çîrok in ku em dixwazin di cîhanên jîyanê yên li jêr gefa rehbirbûnê de vegêrrin û vegêrrineve. Gelo em dixwazin li kîjan çîrokan guhdarîyê bikin, dema ku ekstraktîvîzma firehneteweyî, tundûtûjîya dewletan, şeweyên nû yên şer û polîtîkayên neofaşîst li çarnîkarê cîhanê bi şeweyekî kartêker ber li xwe fireh dikin? Gelo em dikarin derfetê



bo çîrokbêjîyê û duristkirina cîhanekê dabîn bikin ku dahatûyan texeyyul bike, yên ku ne bi tenê bi tirsê, azarê yan jî bêhêvîyê bêne pênasekirin? Gelo çawa em bikaribin piştevanîyê bikin li rûyetên dahatûyekê yên ku li ser destê hêzên înfialê, vîyanê û texlîdên nû yên peywendîyîyê bêne berpêşkirin?

Me kar û xebata xwe ya kombendî ya geş û gurr bi gereke kurt bo Alentejoya Portûgalê da destpêkirin, ku Sílvia das Fadasê mazûbanîya me kir. Wê ji me re qala matmayîna xwe ya berdewam a li ber kavilên

komîneke anarşîst kir. Di henga gera xwe ya kurt de, em çûne dîtina şaroçkeye kangeran a kevn, li kê derê em li kevîya deryaçeyê şêfî bê deng û his sekinîn; ew der kevnêkanekê vekirî bû, ji ber çavbirçîyê têrnexur bo kar û kespê ketiyê halê cismekî mirî yê vala kirî ji tevayîya jîyanê. Her wê êvarê me li koroya kangeran temaşê kir ku stranên gerdîşî stran, û pê re jî ku peyayên xort û pîr milên xwe kirine milên hev û bejn û balên xwe di nerma xwe de bi pêş de û bi paş de kil kirin, anîne bîra me ku, digel van yekan hemûyan, li wir hê jî bizav heye.

Em vegeyane Vîyanayê û pê ve, ew lêgerana bo “her çend”ê bû ku berê me da derve bo meşan: em meşîyan, bi hev re peyivîn, rawestîyan, me bêhna xwe berda û em bi meşê berdewam bûn. Xwendinên me sirûş bexşande me ku em li gel hev û bo piştevanîya hev û li gel nêzehevalên xwe û li gel dûrehevalên xwe bimeşin. Li nava daristanên Vîyanayê û li ber çemê Dûnayê û me kesine dîtir jî vexwendin ku bi me re bimeşin. Em meşîyan, me dûr û dirêj li rehenda dengî guhdarî kir, me seyran kirin, kufkarik berhev kirin, em çûne bindarûkan, me bi hev re xwend û ezmûnên *buen vivir* [jîyana xweş] a ji derawayên cîyawaz parî hev kirin. Hevalekî xebatê tewqe li me kir ku di nava daristanê re rêberîyê li me bike û *Sin’k* pêşkêşî me bike ku nanekî taybet e, li welatê wî yê bav û kalan, rêwî bi xwe re dibin da ku bi bîyanîyan re parî hev bikin. Beyanîya berîya meşê, ev hevalê xebatê hat dertixûbîkirin. Dema ku rojtirê em bêyî wî çûne meşê, me çiçekî vêsa xwe girt da ku em nameya wî ya der barê mêjûya *Sin’k* û hêjayîya lêgerana bo rastîhevhatinên li ser rêya yekî de bixwînin; nebûna wî ya li wê derê lêbelavîya neyeksan a derfet û delîvên tevgerîna di mekanî re anî bîra me. Ji bo hindekan ji me, xwedanderfetbûna bo meşîna wisa bi bîstehî û bi hêsanî ne ezmûnek bû ku me bikaribûya sivikbuha bihesibanda. Her çawa bûya jî, bicîhiştina nivîsgehê alîkarî bi me re kir wekî em zêhnên xwe û bedenên xwe saz bikineve û bi cîyawazî bihizirin/hest bikin.

Li cîyê nivîsgehê yê lapî dilguvêş # A4239A yê li Peymangeha Hunerên Ciwan a Vîyanayê em bi şeweyekî bi rêk û pêk li hev rûdiniştin û me geşedana projeyên her yekî me heldisengand. Me li

¹ Berhevkirina Kufkarikan, Vîyana, 2019; wêne ji alîyê Koma Lékolanê ya Zîwanên Xweragir ve

² Boaventura de Sousa Santos, *Epîstemolocîyên Başûr: Dadperwerî Li Dîjî Epîstekujîyê* (Boulder: Weşanên Paradigmê, 2014).

ber laptopên xwe pişta xwe xûz kir, post-ît li hev zêde kirin, tekst bi dengê bilind xwendin, berhemên hunerî hêlsengandin û pîr û gelek nîşe nivîsîn, wisakarî li dora mêzê rûniştî, me saet derbas kirin. Hêdî hêdî, me hewzeke hevbeş a têgehên dagirt, – tê de her wekî xeta dojhî, firehgerdûn, hizirîn/hestkirin, *buen vivir*, komên kavilan, cinawiran, sawêran. Me navê vê hewza hevbeş danî “sêl” a me ya “esmanî”. Hewz ji têgehên ji xwendinên curecur pêk hat û wê araste dabîn kir hem ji bo karîwerîyên hevbeş, hem jî yên takekesî araste. Her çend şûnwarên me ji layê mercên cîyopolîtîk, çapanên deranîna puxteyê û her wiha straticîyên berxwedanê ve bi têra xwe ji hev cîyawaz bûn jî, gava ku me ev şûnwar li hev raçandin, toreke li hev alizî hate mexderê – ew destpêkeke bê qeys û qerar bû bo çêkirina pireyan di navbera Başûr-Başûr de. Me çemê Dîcle berçav kir û pê ve, hema bêje rê tê re tinebû wekî mirov dêhna xwe nedaya tiştê ku li çemê Tagûsê diqewime, yan jî, hizra xwe nekira li ser peywendîya di navbera gir û gazên pişirî û jehrî yên li Zacatecasê û şantîyeyên rûxanê û avakirinê yên hûtasa yên li Addis Ababayê de. Wan der barê alozîyên babetê, demê û mekanî de bi hûrgilî em serwest kirin. Di kargehên li gel Rubén Gaztambide-Fernández, Angela Melitopulosê, Margarita Palaciosê û Eve Tuckê de, em fêr bûn ku van peywendîyan kûr bikin û tiştê ku bi dîtina pêşîn re gelek caran wekî yekane û bê peywendî tê hêlsengandin bi hev re raçînin.

Dema ku em li Vîyanayê xebitîn, her wiha me nas kir ku puxteya, yan jî gelek puxteyên, projeyê di rastîya xwe de li dereke dîtir bûn. Projeyê rê da me ku em rêwîyê bikin berev şûnwarên cîyawaz ên vekolanê. Em bi berdewamî ji cîyekî derbasî cîyekî dîtir bûn û dîsa vegeyîyan, em ji hêwra navendî ya Ewrûpayê ya spî ya berhemênana zanyarîyê, ya ku, digel vîzayên me, çu caran bi pakî bixêrhatin neda bejn û balên me yên rengîn, başûrî û koçber, derbasî peywendên xwe yên awatê û aîdîyetê bûn. Xeta dojhî civakîyîya me, şeweyên me yên peywendîbestinê û xalên hevbirrînê yên firehhêl bi rêk xistin û koma me pê ve qut kir û kire du qet. Têgeha “yektirbirrîn”ê ya Gloria Anzaldúayê alîkarî bi me re kir wekî – bi rêya dabeşkirinê û bezandina tixûban – em bizavên berev-pêş-û-paş î firehhêl ên di navbera vir û wir de bi wate bikin. Aşnayîya me ya li gel yektirbirrînan ronî bû bi xêra gelek vegeyan, cî û bergehên ku em rastî wan hatin, mirovên ku me nasîya xwe da hev û hevaltîyên ku em pîr pê ve bûn. Me red kir wekî em li ser vî yan jî wî alîyê xetê pêk bînin û di dewsa wê yekê de em rijd bûn li ser akincîbûna di cîhanên firehhêl de û bestina peywendîyên pihêt li gel dudîlyan, nakokîyan û yektirpollîneyşinan.³

Bo komeke hunermendên/vekolînerên (demkî) li Vîyanayê hêwirî, kêliyên çepevebûna ji “em”ê berhemdar û veguherîner bûn. Wan kêliyên her hişt ku em bilivin û lê bixebitin da ku em pêgavên xwe bi wate bikin. Di navbera firêtekê û firêta paşê de, xebata me geş û gurr bû bi rastîhevhatinên li ser şûnwarên ku her yekê ji me bi wan re peywendîyên pihêt li gel wan bestin. Rastîhevhatinên rêya hêza înfialê û vîyanê nîşanî me da; înfial û vîyan peywendîdarî derawayên û têgihanên rewîştî yên têvel ên der barê cîhanê de ne. Înfial desthîlanîneke kartêker e li bêdadîyê; înfial dîmaneyî kerbê û bêgavîyê ye wekî, bi “bawerîya ku tûşî reftareke neheqane hatibe”,⁴ yek ji bo rûmetê xîretê bikêşe. Vîyan, bi gotinên Eve Tuckê, “derevekirina sedemên têkçûnê û bêhêvîyê, lê her wiha sedemên hêvîyê, rûyetan, zanayîya jîyanên û civatên jîyî pêwîst dike. Vîyan “hê nebûyî”yê û, car û baran, “êdî ne”yê bi xwe ve digire.”⁵

Di henga çavpêketinên me de, pêdivî çêbû ku em beşdarîyê bikin li duristkirina têkilîyên watedar li gel ektîvîstan, komên feminîst, destpêşxerîyên ku li gel bêmilkkirinê tê dikoşin, civatên ku hewil didin şeweyên xweser ên jîyînê peyda bikin, komên ku xwe terxan kirine ji vegeyan û pakkirina qada giştî ji bo şîngerandina kombendî re û hunermend û ektîvîstên xerîkî rêbazên spekûlatîv ên çîrokbêjîyê yên ku lêqewimîyê red dikin. Ew in ên ku em vê xebatê rewa dikinê. Kitêb obceyê vegeyan, reng e yeke bêgerew. Çavpêketinên me em fêr kirin ku me pêdivî bi amrazan heye ku em şîna rabirdûyê bigerînin û li ser dahatûyêke pêguhêr çîrokan fenteztîk vegêrrin, gilîyan bigerînin û jehrîyê xwemalî bikin. Piştî ku em pîrepîreyî bûn, pêdivîya me bi amrazan heye ku em bi hev û din re bimeşin û dîsa bêne ba hev. Me nas kir ku pêdivîya me bi amrazan heye da ku em çîrokan xwe tevî koroyê firehdengî ya zîwanên xweragir bigihînine hev.

³ Gloria E. Anzaldúa, *Deverên Tixûb/ La Frontera: Mestîzên (Colên) Nû* (San Francisco: Kitêbên Aunt Luteê, 2012).

⁴ de Sousa Santos, *Epîstemolocîyên Başûr*.

⁵ Eve Tuck, “Gîrokirina Xusaretê: Nameyek Bo Kombendan,” *Kovara Perwerdeyê ya Harvardê* 79, nmr. 3 (Payîz 2009): 417.

Me amraz di henga projeyên xwe yê lêkolanê yê hunerê yê takekesî de bi destên xwe çêkirin. Me ew di rêzeke çalakîyên di kargehên li gel hunermendan, ektîvîstan û endamên civatê yê dîtir de ceribandin. Ji ber ku bikarhênerên amrazan dikarin amrazan bi kêfa xwe bi kar binin, me xwest ku em wan pêşkêşî kesên din bikin da ku bi nêzikîya li têkoşanên cîyawaz li gel bêmilkkirinê wekî tişteki bîn bikaranîn, bîn sererastkirin û guncandin li gel qonaxên duristkirina cîhanekê. Em li rênîşên bikaranînê û formatên rênimayî jî gerîyan bê ka çawa qalibên bar û doxên 'edetî yê peypêbirinê û kardihevîkirinê bêne şikandin û, di navê de lîstik, hêlengandin û kitêbên çalakîyan, me firehgerdûneke dewlemend a pergalên pedagogîk vedît.

Digel Bêmilkkirinê:
Kitêbeke Çalakîyan

belgekîrîna rêzek nêzepeywendîyên li gel şûnwarên cîyawaz berhev dike. Di her beşê de, piştî nîşeyên pêşgotinî yê li ser vekolana war-navendî, peywendîdarî û peyda bûyî ji têkoşanên dîyarkirî yê li şûnwarên takekesî, behs tê ser hûrgilîyên amrazên dîyarkirî û, dawîyê jî, pênaseya hindêk çalakîyên ku li ser şûnwarên dîyarkirî hatine ceribandin. Amraz û çalakîyên spekûlatîv ên ku em berpêş dikin besta xwe ji govanîya me ya li zindîmayîne, berxwedanê, qewîniyê, rûmetê û şadîyê digirin. Ew tewqe ne bo dahênerîya mirovên ku



miqate ne li pêkveheyîna texlîdên zindîyan ên cîyawaz, demkîtiyan, pê re jî pîvangan, mirovên ku peywendîyan datînin li gel bar û doxên jîyînê, hizîrînê û hestkirinê. Em hêvîyê dikin ku di destên we de, ev amraz û çalakî bifirin mîna bafirokeke ku ji alîyê bayê arezûyên we ve bihê arastekirin.

Kitêba Çalakîyan Digel Bêmilkkirinê bi hêviya ku destpêşxerîyê li hev dengvedanên di nava straticîyên û awatên firehhêlî tixûbbezên de bike, kûrbîniyên li ser heft vekolanên war-navendî berdest dike. Beşa di pey re, "Têkoşana Zîwanên Xweragir," a ku ji alîyê Koma Lêkolanê ya Zîwanên Xweragir ve bi şeweyekî kolektîv hatiye nivîsîn, kûr û dûr dihizire çî ka ji bo projeyekê, ya li sazûmaneke akademîk a Ewrûpayê danayî û dirifkirî û beşbelek ji ber mîrateya xwe ya mêtîngehkar, rê tê re heye ku mirov bi helwesteke bêmilkkirî vekolanê bike yan na. Di "Xwîna Giran" de, Naomi Rincón Gallardo fêr dibe ji û bi heyberên sawêrane yê ku di nava kavlên jehrî yê Vetagrandeya Zacatecasê de rehenda tolhildana xwe dipîvin. Sílvia das Fadas, di tevkarîya "Luz, Clarão, Fulgor/Ronahî, Pêt, Fulgor" de, peywendîyên pihêt dibeste li gel mêtîjûya dirêj a komîneke anarşîst û dide pey hev dengvedanên wê yê bi şeweyên xweser ên jîyînê re, yê ku îro ro li Alentejo yê tene rahênan. "Li Dor û Berê Çemekî," xebata Rojda Tuğrulê, dide pey Çemên Dicle û Ferêt bi rêya perspektîva reqekî, kosîyekî avî, yê ku ji ber projeyên bendavan ên li Mezopotamyaya jorîn li ber xetera nemanê ye. Di "Despîna" yê de, İpek Hamzaoğlu serê xwe pê re diêşîne wekî çî dê bimîne li pey rûxana jîngehê ya ku ji ber sentrala nûkleyir a li Sînopê, û li gel mirovan û sawêran çavpêketinan dike.

"Warên Kaxiz" a Janine Jembereyê dide ser şopên liberrabûna li hemberî serwerîya mêtîngehkar a Almanan ên ku di navbera 1880yî û 1914an de

⁷ Meşa bi hev re bo kanekê vekirî ya xalî ya li Mina de São Domingosê, Corte do Pintoyê, Alentejo yê/Portûgalê, 2018; wêne ji alîyê Koma Lêkolanê ya Zîwanên Xweragir ve

ji alîyê Efrîqayîyan ve hatine nivîsîn û berdewamîyên têkoşana dijmêtinkar a xweserî Efrîqayê û peywendîyên wan ên li gel Almaniyayê kûr û berfireh dike. Di "Qewîniya Cirboqê Bikîs" de, Naomi Rincón Gallardo dide pey ektîvîzma dij-ekstraktîvîst a xwecî da ku li ser mîtên Mezoamerîkayê (Meksîko û Emerîkaya Navîn) yê bêtîkîrî yê li Oaxacayê çîrokên fentezîk vegêrre. Dawîyê, di parçeyê xwe "Xemxurî û Halguhestin"ê de, Berhanu Ashagrie dipirse çawa sepandên şîngerandinê dikarin bibin amûreke polîtîk, pedagogîk û estetîk a ku rege tevkarîyê li qonaxa pakkirina kombendî ya li bajarê Addis Ababayê bike.

Her çend me ev kitêb bi Îngilîzî nivîsî, proje û kargehên lêkolanê, ku tê de em li amraz û çalakîyên di vir de berhev bûyî gerîyan, bi gelek zimanên cîyawaz pêk hatin. Zimanê zikmakî yê ji me ti kesî ne Îngilîzî ye, lê belê, digel yan jî ji ber sazûmana wê ya împeryal, Îngilîzî zimanê hevbeş ê me hemûyan bû. Ji ber ku xewna me bû wekî em projeyê veguherînine kitêbekê, gengazîya ku em wê bi Îngilîzî biweşînin têra awata me nedikir wekî ev bibe obceyeke vegeê. Me destnivîs wergerande Amharî, Kurdî, Portûgalî, Tirkî û Spanyolî û nusxeyeke çapkirî ya biçûk a her wergerê dê nêzik berdest bibe di ser malpera weşangera me k-verlag.org re. Lê, divê em dupat bikin: *Digel Bêmilkkirinê: Kitêbeke Çalakîyan* ne rênîşeke bikaranînê ya ji bo projeyê hunerê ya beşdarîkar e. Ku beşdarî pêdivî bûya, wate, me yê mekanê çîrokê pênase kiribûya û em bi babeta çîrokê dizanin. Li şûna wê yekê, li nik amraz û çalakîyan, em hêvîyê bo van vebeyanan dikin da ku pêşkarîyê û destpêşxerîyê bikin. Destpêşxerî têgehek e ku ji vekolanên li ser dansê û performansê bi deyn hatiye standin û pêşengîyê û paşengîyê pêk ve dibeste: paşengîkirin destpêşxerîkirin e.⁶ Hêviya me ew e ku ev kitêb bikaribe şeweyekî pêşengîyê dabîn bike wekî, henga ku destpêşxerîyê li vebûnekê bike, pê re jî ku bere bere di dergehêkî re tê keve hundir, ew bide pey desthilanînê.



Û, bi xulqê Audre Lordeê, her wiha em hêvîyê dikin ku ew ê "bi rastî pêşkarîyê bike, her wekî raperînekê," pêşkarîyê bike li duristkirina cîhanekê ku piştevanîyê bide têkoşanên bo parastina axê, avê, hewayê, derametên hezar salî, pê re jî peywendîyên pîroz ên di navbera jîyana mirovan û siruştê de. Ev xebat vexwendinek e ku em berhingarîyê bikin li mantiqên hetero-baviksalarî, nijadî û sermayedar ên xwedîtiya gerestêrkê, pê re jî şeweyên wan ên zordestîyê yê ku li ser derûnê kartêker in.

Em hêvîyê dikin ku amraz û çalakîyên di vir de berpêş kirî dê


bestê li we rakin ku hûn bibine pişkdarên hewildana me ya ku em tevî texlîd bi texlîd rehendên wê têtîkîyên bi axê re bînine bîra xwe, bisêwirînineve û zareve bikineve. Em bi amraz û çalakîyan xebitîn ku em li şûnwarên cîyawaz rastî wan hatin. Êdî em hêvîyê dikin ku tu, xwînera/ê delal, di rêwîtiya kitêbê de berdewam bibî û wê beherî cîyên çaverênêkirî.

ZÎL BIDE!

⁵ Işaretên li kana vekirî ya xalî ya li Mina de São Domingosê, Corte do Pintoyê, Alentejo yê/Portûgalê, 2018; wêne ji alîyê Koma Lêkolanê ya Zîwanên Xweragir ve

⁶ Lepecki, André, "Ji Beşdarîkirinê Ta Destpêşxerîkirinê: Rêberî Li Lipeyçûna Wekî Yekejîmarîya Polîtîk (A-Takekesî) ya Dansê." Di *Dans, Polîtîka û Pêk ve-parêzbandîyê* de. Edkn: Stefan Hölscher & Gerald Siegmund. Berlîn û Zurîx: Diaphanes, 2013. 21–38.

Li cîyên nivîsgehê yên dilguvêş
 Bêdengî qala rageşîyê dike
 Paşê deng di koroyekê de digihîjine hev
 Û hêwirze dadigirise tev



TÊKOŞANA ZÎWANÊN XWERAGIR



Koma Lêkolanê ya Zîwanên Xweragir

Viyana, Awusturya

Di demên cîyê lezê de, dilê gelek kesan ji me lê ye, wekî peywendîdarî bistehkirina dahatûyeke xeyalî, rawestandina qewimîna tişteki ku di dahatûyê de tê xuyanê, rêşkirina nihayê û rabirdûyê da ku ji bo nifşên ku tên em dahatûyan çêkin, çelî arîşeyê bike. Mayîna li gel arîşeyê pêdivî bi peywendîyeke bi wî rengî ya li gel wan deman nîne ku dibêjinê, dahatû. A rast, mayîna li gel arîşeyê pêdivî bi fêrbûnê heye ku mirov yekcar bibe niha, ne ku wekî tewereyeke li ber betavebûnê ya di navbera rabirdûyên kambax yan jî biheştî û dahatûyên peywendîdarî wehîyan yan jî rizgarker de, ber'eks, wekî mexlûqên nemîn ên alizî li bêjimar şewegirtinên tewawnekirî yên cîyan, deman, babetan, wateyan.

— Donna J. Haraway, *Staying with the Trouble* (Mayîna Li Gel Arîşeyê)

Awayê we yê şerkirinê dîyar dike ka hûn ê bibin kî dema ku ceng biqede.

— Taiiake Alfred, *Wasáse*



Deqa li jêrê hatî rahênaneke nivîsîna kombendî ye ku bi kûrî hizra xwe dike li ser gihanekên cîyawaz ên ku em wekî takekesan û wekî komekê tê re bihurîn di henga çonaxa xwe ya lêkolanê ya fetlonekî û carinan li ser dîwarê alebilê sekinî de. Ji dêvla berpêşkirina honaka “em” eke hevgir û bihendaze, mihaweleya me ya di vê beşê de ew e ku em deng bidine vegêrranên parparî yên rêyên bi hevraz û berjêr, di kîjanan de me yektirbirranên firehhêl ên di navbera şûnwarên cîyopolîtîk û kartêker de gotûbêj kirin. Di van yektirbirranan de, em ghiştine ezmûnkirina kêliyên deqerûyîya veguherîner, li kîjan tangê, bi serî gelek rasthatinên li mirovan û ne-mirovan, pê re jî bi serî kesên din ên di komê de, hewesa wan û kêferata wan bi qasî xem û jana wan kêşayî, em berra jî hatin şuştin ji xweyên xwe yên takekeskirî.

*

Ka em binîne bîra xwe wê tîra çaverênekirî ya vexwendinekê û pêşnumayekê ya ku berê me da jûreke hevbeş û zemînekî hevbeş î spekûlatîv: xwendina bi hev re, girtina sirûşê ji pedagogîyên Xwecî yên xakê, hizirîna li ser awayê ku em bikin ew di peywendên me yên cîyawaz de li hev deng vedin, nivîsîna bi kombendî, strîna stranên, xwe li nedîtina kêşeyan danîn, xeyalkirina cîyên dîtir û vekolîn. Tê bîra me wekî me jûra xwe ya li Vîyanayê bi cî dihişt da ku di daristanê de em kufkarikan

↑ Koma Lêkolanê ya Zivanên Xweragir li Portûgalê, 2018; wêne ji aliyê Koma Lêkolanê ya Zivanên Xweragir ve.

berhev bikin, di ber re jî em bi dengê bilind Anna Tsingê bixwînin. Û di henga bahozêke li ser pêyê qeraxên Dûnayê de me bi bêhedari li *Sanrizukayê: Gundîyên Kelata Duyem a Ogawa Pro Collectiveê* temaşe kir. Tew me li mûzexaneyekê, rûpoşên kaxiz bi rûyên me de, me stran strîn, bi dilêrî û bi nazikî.

Di Îlonê de li dîyarên bejî yên Alentejoyê me Sala Nû ya Hebeşî pîroz kir. Me bi hev re xwarin çêkirin, dans kir û ger û geryan kirin. Me govanî li nîgeraniya xwe kir wekî şênîyên bajêr ên bi şayîşê ketî ji ber nemana avê di bîrê de. Me nexşeyên xwe û reşnivîsên xwe û bernamêyên xwe yên negengaz parî hev kirin. Em meşîyan di kanzaya xav a kevn re, ku bi jehrîtiya xwe ya sergêjker ve, yekser berevajî dilgermîya gundîyan bû. Bi hev re me dema xwe bihurand li ser pêyê peravên bendaveke nîvenîv vala, em berze bûn li wargehekî ekstraktîvist. Me kevir avêtine nava avê, em ji xwe re simsimîn û gerîyan. Gelo ew çi bû me bi hev re fikir? Me gotê – duristkirina cîhanekê.

Van yektirbirrînên berdewam ji bo me wateya çi da? Ji bo her yekî me û me hemûyan, bi hev re? Gelo em dikarin xwe bi teorîyên xwe yên guheranê bigirin, yên nû peyda bikin, jîyanên xwe bimesixînin, pêşniyarên xwe bikin? Kêmekê ji tirsê û kêmekê ji mereqê rêzê bigirin û, di heman katê de, bêmilkkirî bin pê heyînen û sepana yek û din, pê jîyanên kesên dîtir û dîtirên wan. Di nava bêaramiyê de.

Wekî komekê, çend caran em jêk ve bûn û bi dûrî hev ketin? Çawa dîsa em li hev kom bûn? Çawa me serederî kir (yan jî nekîr) li gel ya nehatî derbirrîn, tîrsa ji paposiyê, hayirarkîyên neviyayî, hêvîyên me yên sernegirtî û, digel arîşeyê, me hilbijart ku em bibin hevpar û xemxur? Bi kirina bi wî awayî, me ew şadîya bişkojdayî peyda kir bi xêra wateyên girift ên ku di nava xwe de me şêwe dayê. Vîyana rijd a kombendê, bo xebitîna bi hev re di dewsa xebitîna bi tena serê xwe de, û tişteki çawa qelp bû heçku ku di nava dîwarên sazûmanekê de me wisa kir... di rewşa pûtepê-ne-kerîyê de, bînine bîra xwe, rewşa têdebûnê lê *nejwêbûnê*. Gelo berra jî em ê bikaribûna wek zîwanan bin?

*

Gelo çawa rê tê re hebe mirov wê *derê* bîne, a ku ez li gel pabend im, bîne vê *derê*yeke ku em lê dixebitin biafirînin? Gelo çawa em wê *derê*yê bikin xwedangiringî. Û, çawa em dest pê bikin ku vê qonaxê bişayesînin? Gelo em pê şayesa bêhna morana li ser deryayê dest pê dikin yan pê raberkirina rastîyên diyardeyî yên req wekî çi dê biqewime li wê deryayê? Gelo em qal dikin çend xweş e mirov di wê deryayê de avjenîyê bike yan qal dikin çi ka kartêkeke çawa dê li pileya germa wê bibe, ku sentralên nûkleyir hatin avakirin û pê ve? Em tê hizirîn çi ka çawa em civakîtiyeke, civateke, xakeke, êkosîstemeke *li wê derê*yê bînin berev “em”ekê – pêşîn, em bînine nivîsgeheke li Vîyanayê ku me hewil da em bikin xwedangiringî. Em çi zimanî

Em li kê derê ne? Li kê derê? Li kê derêyek heye,
ji ber ku em in, bi serhişkî, û em bûn,
û kî ne em, heke ji te û ne ji min be?

— Etel Adnan, *There (Wê Derê)*

bi kar tînin û çawa em qala bêmilkirinê dikin, nemaze dema ku em ji Donna Harawayê serwext dibin ku “giring e tiştê ku giring e em bi kar tînin da ku em pê tê bihizirin bo ya/ê din giring e”?¹ Çawa em ê bi hev re dibin xwedangiringî? Çawa em ji hev û din fêr dibin? Çawa em bikaribin vê xemxurîya ku me di “em”ê de afirandiye dîsa bi şûn de bînine “ez”ê, bi gotineke mayîn, wekî em wê bi wan ên dîtir î hê jî *li wê derê* re parî hev bikin?

Ew yek sepaneke xemxurîyê ye, xemxurîya li yek û din, xemxurîya li sepanên yek û din. Sepaneke fêrbûna ji şûnwarên ku em pê ve pabend in û sepaneke vegeerîna bo wan cîyan bi dengê rayedarîya bi nav heyî, ango, bi rola hunermendekê/î/ vekolînerê/î bi piştevanîya sazûmanekê Ewrûpayê ya ku vîzayan, pere û pêbawerîyê dabîn dike da ku piştevanîyê bike li kêferata me ya keltorî ya wek liva nîskê bê ber û bê pişt. Em vedigerin bi awata ku em jêderkên xwe leva bikin da ku em çirokên dîtir û cîhanên dîtir biafirînin. Berpirsyarîya di nava navberê de bûnê: vegeerîna li rastîyên dîtir ên ku yek ji ber rihetîya van serpişkîyan bi hêsanî jî bîr dike; dubare fêrbûneve wekî çawa em bimeşin, çawa em biaxêvin, em biçine kê derê, em çi li xwe bikin, saet çi em li malê bin, di nava civatan de em çi bibêjin û bibêjine kê.

*

Lihevciwînê û pêkvexebitînê carinan heçku tiştê din divê ku cîyawaztir e ji tiştê me jixwe heyî û wisa jî peydakirina wî “tiştê din” wê yekê dike qonaxê aloz. Ji rastîya ku ew yek aloz e wate diçe ku ew yek hevrûbûneke fêrbûnê ya bi rêbazeke bênavbirrî ye. Lê belê, hindî ku em wekî kombendekê dixebitin, çawa em rêyên berhemdar ên bizivînê û vebizivînê diperisînin? Rageşî negengaz dikin ku mirov li hev bicivin û pêk ve bixebitin, lê xeterek jî heye ku mirov bi wî awayî di wê yekê bihizire. Di rêya lihevciwînê/pêkvexebitînê re, her tim kêliyê heye ku destpêşxerî li enerjîya berhemdar tê kirin û ji girîftîyên kombendî peyda dibe. Di wê rewşê de, tew rageşî û çewttêgihîştin jî pê de pê de heçku dibine beşeke giring ji hevrûbûnê. Pêşdestîyek e ku mirov bibe parçeyekî têkoşaneke kombendî ya bi vî rengî û bikaribe govanîyê bike çi ka ev qonax dikare çend dewlemend be.

*

“Em” komstêrêke neseqamgîr û newestar e, ku ji alîyê hevgerîna demkî yên hêzên pabendî mercan hatiye şewandin. Me ne/gengazîyên, xuyabûna demborî û betavebûna wê “em”ê bi şeweyekî cîyawaz nasîn, her wekî tiştê ku car û baran kurmên wê hatine “em”ê û her wiha jê hevreşî bû. Piştî ku di destpêka projeyê de me govanî lê kir ku hevlekî me yê xebatê hat dertixûbkirin û fermanberên fermangeha penaberîyê her gav der gav yên din ‘aciz dikirin, pê re jî çawa li kûçeyê rojane çav zûr û ziq dikirin, êdî me çu fentezî nema der barê “qadeke

hevbeş” de, dereke ku em hemû bi germî bihatana pêşwazîkirin. Ji bo hindekan ji me, kurteawirên “em”ekê birûsîn, dema ku me bi hev re list, dema ku em bi hev re çûne meşan yan jî em lê xebitîn fêrî figûrên reqsa Hebeşî bibin. “Em”eke kêliyî peyda bû dema ku me rûpoşên ji kaxizên prîntkirî fesilandî bi rûyê xwe de kirin û, rûpoş bi rûyên me de, bi dengên ku bi ‘edetî ne guncan bo performanseke gelemperî me bi dilêrî koroyeke kombendî berceste kir. Şerma giran bû: ji şermê rûyê “em”ê çû erdê. Bo kêliyê kurt, me rê dabû xwe ku ji alîyê kesên din ve em bêne bêmilkirin.

*

Em vegeerîyane nivîsgehê û pê ve, piştî derevekirinên bihûrgilî yên şûnwaran, car û baran bédengîyê giran a dagirtî bi agehdarnebûna me ya hevbeş ji peywendên vekolanê yên hev û din peyda bû, ya ku bihevrebûneke havîker û şeweyekî cîyawaz ê bêmilkirinê bi rêya hebûna havîker a kesên dîtir afirand. Navenda epîstemolocîk a tundûtûjîya kolonyal di rewşa bizavê de bû egera berhevbûna derbabetî ya derevekirinê û zanyarîyan li ser destê kirdeyên Başûrê Global; peypêbirin ketine valayîyê hewayî ji ber dijwarîya ku em tûş hatinê di pênasekirina xalên peywendîyê û çepevebûnê de û wê yekê dê bikaribûya rê bide wekî ew li hev deng vedin û ‘hota dengê xwe bidin. Em ê bihatana vexwendin ku em bipeyivîyana, lê kî dê li me guhdarî bikira? Çawa em ê bipeyivîyana û bi seranserê qonaxê bi çi armancê em ê nediyar bimana. Heke hedefa me dê bêmilkbûn bûya, wa ye em hatibûna ser dangê xwe: bêmilkbûna ji û li nava sepanên ku dibûne pal û pişt ji yektirbirrîna me yên firehhêl re gîro dikirin. (Ev yektirbirrîna ku carinan te digot qey wek xwînjêkîsanê bûn: heçku, piştî yektirbirrîna gelek caran, çu cî nebû ku em vegeerîyanayê, heçku me dikaribû hemîşeyî em xwe bigihînine nava dîyarê hesretkêşîyê.) Di nava hewildana me re ku em bigihîştana ser zemînekî hevbeş, me carinan pişkeke hevbeş a lap rûxarkî çêtir girt.

*

Ku em bêne ser pîrsa pere: pereyê bacê yê Awusturyayê bû piştevanîya darayî bo projeyê, her wiha bacên ji kompanîyên her wekî Andritz AGyê, komeke endazyarîya amûr û alavan a Awusturyayê ya ku navenda xwe ya giştî li Grazê ye, jêrxaneyê dabîn dike ji bo projeyên bendavên asayîşê yên li Kurdistanê – ku yek ji hunermendan ev yek pênase kir wekî “siruştî çekkirî” ji ber ku gundên Kurdan di binê avê de dihêlê, warên bav û kalan wêran dike, koka êkosîsteman diqelîne. Û, heke em qala nimûneyêke dîtir bikin, OMVya kompanîyê niftê û gazê ya întegrekirî ya Awusturyayî ya ku navenda xwe ya giştî li Vîyanayê ye, ya ku niftê û gazê derdixe ji yek ji çendek deverên Maorîyan ên mayî yên li perava Ziyilanda Nû. Em bê par bûn ji karzanîyên û

¹ Donna J. Haraway, *Mayîna Li Gel Arîşeyê: Çêkirina Lêzimîyê Li Chthuluceneyê* (Durham and London: Weşana Zankoya Dukeê, 2016), 12.

bînayîya ku me pê berhingarî bikira li van girîftîyan, ji me nedihat ku wê rastîyê qebûl bikin wekî em, berra jî, asê mabûn di vê bêdadîya global a şaşwazker de.

*

Ku pê de pê de me hev du nas kir, tîrçetîrç û sivikbûn jî peyda bû. Pê zanyarîya çaverênekirî dubare û dubare me hev du matmayî hêla. Dihate bîra kê wekî yekî ji nav me pê dizanibû çûkeke/î perlezgîn dikare û nikare çi bibîne (b.n. rengên xwerû), yan jî me hînî çî dike wekî bike ku di nava civatan de em zorê bidine pişikên xwe û bistrên (b.n. pê pêkolî û qijîniya ji pêş de), yan jî di henga meşê de çawa me yê rê bigirta li dadana seyekî ku bihata me (b.n. bila keviyek di destê te yê rastê de be)? Em pê hesîyan ku hindêk ji nav me stranbêjên stêrk ên popê ne û yên din jî di dans û reqsê de jêhatî ne; yek ji me yeke xeyalperest bû ku UFOya xwe li paş berûya tepedoran a nêzik park kiribû. Me hewil da ku em ji hev û din fêr bibin, me hewil da ku em qedrê cîyawazîyên xwe bigirin û kûrayîya taybetîyên xwe yên xilqetî bipîvin.

*

Car û baran, di civînên me yên komî de te digot qey dilsozîyên me yên kûr ên di nava komên xelqê û şunwarên vekolanê de, yên ku di pey re di xebata me ya hunerî ya takekesî de berceste bûn, hatin berederîkirin yan jî me xwe li nedîtina wan danî, heçku ew bi tenê hilgirên îgoyeke hunerî ya xwedî û takekesîperest bin. Timî dijwar ma wekî em çêlî xebatan bikin her wekî tevkarîyên girîft ên ku bikaribûyana gotûbêjên der barê estetîkê û hunerê wekî qonaxên fireh-tewqî yên peywendîyîyê û duristkirina cîhanekê de bidana destpêkirin.

*

Lewma, em tê koşîyan. Em tê koşîyan li gel peydakirina zimanekî hevbeş – hindêk ji me bi Îngilîzî (ya akademîk) perwerde bûbûn, yên dîtir ne. Hindekan çu dijwarî nebû di civatan de bipeyivin, lê ji yên dîtir re ev yek zehmet bû (qet nebe û nemaze di sêrî de). Em tê koşîyan li gel hayirarkîyên navxweyî û tiştê ku carinan wekî navendeke reqkîrî hate xuyanê, navendeke valayîyên kevîyên xwe û navbirîyêke xwe ya di nava navberê de heyî. Me wekî nedîbar û kêr qedirgirtî hest bi xwe kir. Me pîlan danîn, lê me xwe bi mêjûyên radestkirinê re negihand. Me wekî asêbûyî hest bi xwe kir. Gelek ji me di înisîyatîvên komî de xebitîbûn, lê, wekî hunermend û teorîsyen, em hatibûne perwerdekirin jî ku em rêzimana û tûrikê xwe yê peyvan berpêş bikin. Îcar, di paldankên nerihet î darîn de li dora mêzekê em di cî de hatibûne qefaltin, bi tenê laptopê li ber me bû ku car caran dabîn dikir em xwe berdine nava cîhana dicîtil. Dijîftîyên ku her yekê/î ji me di warê xwe de ji xwe re kiribûne

armanc – Bakur û Başûr, navenda sazûmanî û tixûbên wê, welatîni dij bi îqameyê, her wekî din – rast li ber me bûn.

*

Rûniştî li dora mêza li Jûra #A4239Ayê, me çav bi derfeta çêkirina pireyên Başûrê Global û Başûrê Global xist, dilê me germ bû li gengazîya dayîn û standina zanyarîyan û straticîyan ji peywendekê bo yeke dîtir, xeyalkirina duristkirinên cîhanan ên ku ji tixûban û bi wê de peywendîdarî babetê bûna.

*

Çi wate jê diçe gava ku yek bibe “Pêşikêşa Projeyê” bo projeyê komî li ser bêmilkkirinê, nemaze heke qaşo-pêşikêş profesorek be, li Bakurê Global ji dayîk bûbe û zorîneya “endamên tîmê” xelqê Global be? Çi wate jê diçe ji bo komekê ku li dora pêşnumayeyêke projeyê hatibe civandin ku ji alîyê vê profesora spî ve hatibe nivîsîn, profesora ku, piştî wergirtina piştevanîya darayî, şeş hunermendan vedixwîne ku beşdarî projeyê bibin? Çi wate jê diçe ji bo merdîya ferzkirî ya vê vexwendinê ku bihê tawanbarkirin bi tundûtûjîya berfireh a bêmilkkirinê, ya ku ji Bakur belavî Başûr dibe? Bi kompanîyên bazirganîyê yên Bakur ên ku li Başûr jêderkên dewlemendîyê derdixin, di ber re jî pergalên zaldestîyê û gendeliyê hêdî hêdî fêr dikin? Bi zankoyên Bakur ên ku kanên zanyarîyên “dîtir” dikolin û derdixin, ji alîyê ve red dikin ku rê bidine van zanyarîyan da ku ew zanyarî bi rastî lingê xwe li lingê damezraweyê bixin?

Gelo rê tê re heye ku mirov bi rêya hevraz û berjêrên projeyêke vekolanê pêşikêşîyê li komekê bike û, di heman katê de, xebata vepirsîna xwe ya bêagehîya epîstemîk bike, ya ku berhema perwerdebûna li Ewrûpayê û DYê ye? Gelo rê tê re heye ku mirov rêgeha komê beralî bike û, di heman katê de, berhingarîyê bike li pêketina yekê pê tiştê ku Gloria Wekker dibêjê, “xalîxerezîya spî” – ango, redkirineke pejirandina serpişkîyê û destûrdayîtiyê?² Na, wisa xuya ye ku rê tê re nîne, lê zerûrî ye. Ji ber hindê, mebesta vê xebatê dibe ku ne ew be yek ji taqîyekê re xwe amade bike, ber’eks, ew e ku fêr bibe wekî di rêyên kêmtir jandar de têk biçê. Fêr bibe çawa bibe berpirsyar. Fêr bibe bizanibe kingê wext e ku guhdarîyê bike û kingê biaxeve. Fêr bibe xemxurîya li hev û din sanahî bike, dema ku pêlên janê li ber bêhêzîyê komê ji rê difilitînin û dema ku hêrs bi serbestî dimilmile û li cîyekî digere ku bo kêlîyekê xwe lê dayne. Fêr bibe xemxurîyê li xwe bike, dema ku nîgeranî wek vayrûseke vegir belav dibe. Fêr bibe li ser nêzikîyê û dûrîyê seyr û seferê bike. Rageşîyê bîne zêftê. Fêr bibî ku bibêjî, li min bibore, dema ku tu çewt tê bigihîjî. Û, fêr bibî ku bi xebata arasteyî zankoyekê berdewam bibî, li kê derê kompozîsyona şarezayîyê bi şeweyekî berra amajeyê bi kompozîsyona xwendekaran dike.

*

² Gloria Wekker, *Xalîxerezîya Spî: Nakokîyên Mêtînghekarîyê û Regez*. (Durham: Weşana Zankoya Dukeê, 2016), 1–29.

Serdana bo şûnwarên vekolanê dê bikira ku dijarîyên kargêrîyî li jêr temasa pêşîn a tavê betave bibin. Şûnwarên ku hem bijûndar û belengaz, bedew û tirsnaq in, hem bergirtî û, di heman katê de, bervekirî ne bo delîvên nû, cîyên ku li her quncikî dilgermîya xerîbdostane û tundûtûjî zil didin, li kê derê li devereke mişt ji gorrên nepenî berxwedanên Xwecî cînumayeke rewiştî pêşkêş dikin, li kê derê bêjimar şêweyên şeydaker ên pîrozbayîyê li rex hev li gel dagirîyên milîter û paramilîter pêl bi pêl belav dibin, li kê derê xezeba birûmet xîretê dikişîne ku têk behere xofa kapê xwe qetandî ya ku tê sorkirin ji alîyê şêweyên nû yên şerê bo xwedîti û kontrola li ser deveran ve. Bo derbasbûna ji Bakur bo Başûr perwerdenebûna tundrew divê. Yek gewî dibe piştî ku, bo demeke kurt be jî, li Bakurê halxweş dimîne; yan jî, ya rasttir, yek hîn dibe hindêk şêweyan û fonksiyonan di berîka xwe de bihesibîne. Tiştê ku dimîne wekî birîneke kewnegirtî dîsa jî, ezmûna rojane ya kêmnirxkirinê ye. Dema rêwîtiya li Başûr, divê yek fêr bibeve çawa li ser derzîdanka lingan be, vekirî be bo neberbînbarîyên metirsîdar ên jîyana rojane, xwe bihêvişîne ji gerandina laptopan û kartên banqeyê bi xwe re, sewzeyan ji mîkroban paqij bike û ava vexwarinbar bikirre, amade be bo asêmayîna di hatûçûyê de, bipejirîne ku xweparastin nayê dayîn lê tiştê e ku tu bi xwe bi dest ve bînî, xwe bi bêberevanîya li zêdebûnê re bigihîne, ya ku kesên yek hez dike her roj tecrube dikin. Yektirbirrînen di navbera rastîyên bi vî rengî dijraber de pêdivîya xwe bi veguhêzanên nava rêzeyên cîyawaz ên nakokîyan heye. Dereke ku xwebiderawakirinek û peypêbirinek jî gava xwe davêjine hewêrkeyeke nexalî: yek tu dibêjî qey bi serpişkîya akademîk a xweserî Ewrûpayê hatiye şûştin û veşûştin, ku ev wisa tê famkirin heçku yek jixwe parîyekî bûye kesekî xwedanprestîc, û tew tiştêkî xiniz.

*

Cîhaneke şêwane ye ku em hê jî der barê wê de qewî hindikî dizanin. Li raserê Çîyayên Kurdistan, nihêrîna li “wêne”yê vê axirîyê yê çehleke reş dil û dîne min ê lawaz tevî hev kir; ev yek her wiha qewimî dema ku min behsa şantaja nûkleyir bihîst. Ev gerestêrk qûçtişî ye ji surprayzan; efsûnker, hêrsker, sirûşbexş e, û em, heft kesên xweragir, li dora mêzekê rûniştibûn û me dabû pey şopên hindêk ji guheranên ku cîhan tê re derbas dibe. Em berhingarî warşihitîkirinên komelî û têkoşanên politîk, bobelatên êkolocîk û xudmuxtariya siruştê bûn; henga gotûbêjkirina van qonaxan bi zimanên cîyawaz û bi peypêbirinên cîyawaz, em ketin ber veguherana xwe bi xwe.

*

Çawa dê çêbûya ku li Sînopê, li Addisê, li Amedê, li Alentejoyê, li Berlînê, li Oaxacayê yan jî li Vîyanayê keyb biketa ber kar?





↑ Performansa koroyê ya vekolînerên Zîwanên Xweragir li mumok kinoyê li Viyanayê, 2019; wêneyekan: Pat Blashill; bexşa wênekêş bi xwe.

Amraz

KORO

Koroyek dihêle ku mirov kom bibin, 'hota dengê xwe bidin, zareve bikin û deng vedin ji nîgeranîyan, hestan û vîyanan. Di koroyekê de, her kesek guh bi hev û din dike, ku di heman katê de jî cîyê vala vedike ji boşayîyeke derbirranên (carinan dijraber). Ev yek rê dide zarevekirineke kombendî ya gelek dengên cîyawaz. Di koroyekê de, takekesê xwedî rêya xwe winda dike – ji bo ku li ser destê û bi rêya yên dîtir tê livandin, tê bê/milkkirin bi wateya ku Judith Butler û Athena Athanasio didine têgînê – ji bo ku beşdar li ser destê û bi rêya yên dîtir tèn livandin.(1)

Koroyek bi her duyan didebire: bi gelek kesan û bi cîyawaziyên wan. Koro wisa jî tê şûna "fîgûranan", wan gelekên ku navên wan nayên hildan ên ku, di gel rolên xwe yên negiring û bikarbarîya xwe ya ferzkirî, neavêtinbar in, çawa ku Saidiya Hartman di teorîya xwe ya koroyê de tîne bira me.(2) Ber'eksî sûretê pêlewana/ê yekejimar, koro ji pîrr û gelek sûretan pêk tê, ku çîrokên wan nehatine bihîstin û exlebe ji bîr bûne, jîyanên wan hatine ferzkirin ku hema ji dera hanê ne.

Her wiha, her wekî di tracidîya Yewnanan a klasîk de, koro bedeneke kombendî ya şiroveyê ye. Takekesên birûpoş, nasnav nediyar ne beşeke rûdana qewaman in, lê serincê dikêşine ser tiştên nesehkirî, ji ber ku, beranberî dramaya ku ji hev vedibe, amanek in ji bo hestên her wekî kerbê û janê Tiştên ku koroyên curecur ên ji têkoşanan zayî peywendîdar dikin, wek koroyên kangaran, bandoyên bendixaneyan û vê pêla hanê ya nêzik, birrek koroyên gazinan, ew deq û awaz in ku qala awatê, kerbê û çetinayîyê dikin, pê re jî vîyana ku bi kombendî wan vegêrrin. Ku stran bi hev re tèn gotin, têkoşan û awat bi rêya hev dengvedana di nava bedenên hev û din de tèn levakirin, 'hota dengên wan tê dayîn û tèn veguherandin. Awaz

gelek daran dubareker in û dibine sedema transê, rola dermanekî digêrrin ku giyanan zindî digire û wan ji zewalê diparêze.

Paulo Freire em fêr kirin ku pejirandina rastiya xwe-nezanîyê gava pêşîn e di fêrbûna beranber de: heke tu yê tiştêkî fêr bikî, gotî tu tiştêkî nû jî fêr bibî, – ango, bi kirinê fêr bibî. Koma vekolanê *Koroya Ji Bo Zîwanên Xweragir* pêk anî. Koro ji heyranmayîna li ber koroya kangaran za ku me li Alentejoyê dît, pêşandana wan a tenikîyê, dilêriyê û hevgirtinê best li me rakir. Ji bo me, koro navgînek e ku em bêtir bi ser ve bibin çawa em li hev kom bibin – henga ku em firehtexlîdîya xwe û cîyawaziyên xwe di ser her tiştî re bigirin, em 'hota dengê xwe bidin, li hev deng vedin û bi kombendî dengên xwe zareve bikin. Em bi mamosta û ekstrîsekê re, bi Stefanie Sourialê re xebitîn, ya ku di gavên me yên pêşîn de rêberîya me kir û ziravê me qalind kir. Me bi kombendî gotinên xwe yên stranan nivîsîn û li hev kir ku em rûpoşan bi rûyê xwe de bikin, ne bi mebesta ku em li ber her kesî nasnavên xwe bê milk bikin, lê ji bo ku em yekejimarîya her şûnwarekî xwe yê vekolanê binine nava koroyê û bi paşekişiyekê piştevanîyê li lihevkomîyên xwe bikin. Berîya bernameyêke filîman a li jêr sernavê "Bêmilkkirin, Zîwanên Xweragir û Duristkirina Cîhanekê Ji Kavilan", me performansa xwe ya li ber bîneran a pêşîn li mumok kinoyê bi rê ve bir.

- (1) Judith Butler & Athena Athanasiou, *Bêmilkkirin: Kiryarîya di ya Polîtîk de* (Cambridge: Polity, 2013), 1-10.
- (2) Saidiya Hartman, *Jîyanên Hevnegir, Ezmûnên 'Ezamet: Dîrokçeyên Ji Dil û Can ên Geremola Civakî* (New York: W.W. Norton, 2019), 475-80.

Çalakî

PÊKANÎNA KORROYEKÊ

Pêkanîna korroyekê xetera bi navê ahengê perpûtkirina cîyawazîyan, yekşewekirina tiştê neyî bi xwe ve digire. Heke hûn biryarê bidin ku bi pêşikêşên/şefên koroyê re bixebitin, rola wan a birêvebirinê roleke cîyê berpirsariya giran e, ji ber ku merc e ew hem here ser kurm û kirasê takekesî, hem jî ê kombendî. Ji bo vê rolê, ji bo ku mirov nebe otorîter, pêdivî bi helwesteke bikêrhatina cîyê agehdariyê heye. Heke hûn biryarê bigirin ku bêyî şefekê/î koroyekê pêk binin, dijwarî her heman in, lê nabine barê hew takekesekê/î. Pêdiviya vê pê heye ku her kesek baldar be û beşer bike (dubare, bo nimûne) ku bi hev re bistrê.

PEYDAKIRINA MIROVAN

- . Ji bo ku hûn koroyekê pêk binin, pêwîst e ku hûn mirovan peyda bikin ku hûn bi wan re bistrên.

XWEGERMKIRIN

- . Laşê xwe germ bikin, li mekanekî ji xwe re bimeşin, çena xwe vezelînin û bilivînin, piçekî lêvên xwe li hev binin û ji hev beherin.
- . Bi ser peywendiyên laşî yên li mekanî ve bibin, peywendiyên nêzikî û dûriya cografîk a laşên ku li wir in.
- . Xerîkî rahênanên henaseyê bibin: henaseya kurt, paşê ya kûr, paşê jî ber'eks.
- . Bi kêşên dangan bilîzin.



Çalakî

PEYDAKIRINA STRANA XWE

- . Biryarê bidin heke hûn bixwazin kereseşê berê heyî bistrên (b.n., bizava koroyê ya Hildegard von Bingenê, di kîjanê de bi sedan kes kom dibin) yan jî bi bijartina straneke ku bibe modêl ji bo strannivîsîna we bi xwe, kereseşê nû biafirînin.
- . Bastûra rîtmîk pênase bikin ku dê rê li ber we bixe, yan jî, wekî vebijarkekê, peyvên di rêya jixweberiyê re yan jî bi rahênanên nivîsîna serbest (a kombendî) peyda bûyî qut bikin û venijînin û li ser kaxizê wan bi şeweyekî rîtmîk saz bikin.
- . Yan bi bikaranîna awazên berê heyî yan jî, heke gengaz be, bi çarkirina awazê nû, deqê bi awazekê ve girê din.

XWEAMADEKIRINA BO PÊŞKÊŞKIRINÊ

- . Wekî berevajiyê bi tenê eleqedarbûna bi encamê, bi watedarî rahênanê bikin.
- . Bi baldarî biryarê bidin hûn dixwazin ahenga xwe li kê derê bi cî bikin.
- . Cil û bergên û rûpoşên BXÇ (bi xwe çêke) bisêwirînin; bila cî ji cîyawazîyan re hebe.
- . Ji bo ahengê geşeyê bi dramaturciyekê bidin.
- . Bi boneya dilêriya xwe ahengê bigêrrin.
- . Pêşkêş bikin!




⁷ Rûpoşên koroyê yê ji aliyê Koma Vekolanê ya Zîwanên Xweragir ve çêkirî; ji nû ve çêkirî bi destûra hunermendan.

JÊDERKÊN VESER

- Adnan, Etel. *Wir: Li Jêr Ronahî û Tariya Xwebûnê û Dîrbûnê*. Sausalito: Weşanên Post-Apolloyê, 1997.
- Alfred, Taiaiake G. *Wasáse. Şiverêyên Xwecî yên Lêkdanê û Azadîyê*. Toronto: Weşana Zankoya Torontoyê, 2005.
- Haraway, Donna J. *Mayîna Li Gel Arîşeyê: Çêkirina Lêzimîyê Li Chthuluceneyê*. Durham: Weşana Zankoya Dukeê, 2016.
- Morrill, Angie, Eve Tuck û Qollektîva Hêlîna Dahatûyên Raser. "Berîya Bêmilkîrinê, Yan Ji Bi Saxî Filitîna Ji Wê." *Liminalities: A journal of Performance Studies* 12, hjmr. 1 (2016): 1-20. Onlayn li ser: liminalities.net/12-1/dispossession.pdf.
- Sundberg, Juanita. "Dîkolonîzekirina 'Erdnîgarên Posthumanîst.'" *'Erdnîgarên Keltorî* 21, hjmr. 1 (2014): 33-47. Doi: 10.1177/1474474013486067.

Li nava kavilan
 Me kemîn vedaye
 Ji ber rûxanê
 Em hilgirên dêrisan in



XWÎNA GIRAN



Naomi Rincón Gallardo

Zacatecas, Meksîko

Yek ji bar û doxên navendî yên sermayedarîya nijadî ya bê navbirrî berdewam li Başûrê Global, li gel bendîxane û recîmên asayîşgerî yên ku ber li xwe fireh dikin, di rastîya xwe de projeyên mega-ekstaktîv e, her wekî bendav û kanzayên hûthûte, yên ku pêdivîya xwe bi destkeftîyên jêderkî û teknolocîk ên wekî çil û çîya heye, li nik wê yekê jî, pêdivîya xwe bi wî tiştî heye ku Enrique Dussel wekî “teretûreya geşedanî” bi nav dike, yan jî ferzkirina modernîtîyê wekî bar û doxeke gerdûnîkirî ya rêbaza birêvebirinê. Dewlet û projeyên mega-geşedanê yên kompanîyên bi şeweyê yekbûyî sêwirandî bi rêya mantiqeke aborîyî dixebitin bêyî ku bipîvin çapa şeweyên jîyanê yên ku li jêr çavzûrîya pîlan û nexşeyên bi vî rengî gewre li jîyanê ne. Ekstraktîvîzm di nava wê bergehê de dişuxule ku Anibal Quijano cara pêşîn wekî meytrîksa mêtîngehkar a hêzê darişt, ku tê de dezgehên kompanîyên bazirganîyê û dewlet di bara berjewendî û çalakîyên xwe yên aborîyî de ji hev nayêne vavêrkirin; dewlet bo berjewendîyên kompanîyên bazirganîyê tevdigerin û dezgehên kompanîyên bazirganîyê jî hêzên asayîşe kirê dikin da ku birêkxistina dij-ekstraktîvîst kontrol û serkut bikin.

— Macarena Gómez-Barris, *The Extractive Zone* (Herêma Ekstraktîv)

Polîtîkayên nijadîkirî yên bêmilkkirinê, warşihitîkirinê, û cudaxwazî; hilberandina gelên ne bi destê xwe û deverên jibîrbûyî; mêtîna jêderkan û keda berhemdêr a jinan; mêrînî bi xwe: hemû wê xala peywendîyê pêk tînin ku “başûrandin” bi rêya wê peyda dibe. Di heyna demên mêtîngehkarîyê de, çîya hatin warşihitîkirin, berên çeman hatin guhestin, daristan hatin wêrankirin û riwek, ajel û mirov hatin pîrepîreyîkirin. Aydîyolocîya postkolonyal a geşedanê da ser rêça heman mantiqê: çu tişt neşê vîyana mirovan rawestîne li ser rêya şewandina jîngeha xwe û çêkirineveya wê di şiklê hêmaya xwe bi xwe de.

— Françoise Vergès, “Like a Riot” (“Wekî Raperînekê”)



↑ Vetagrande li Zacatecas parêzgeha Meksîkoyê; wêne ji aliyê Naomi Rincón Gallardoyê ve, 2018

Ez li dor û berê girekî pişirî yê li Vetagrandeya Zacatecasê ji xwe re digirim. Ku ez hizra teqînên berê yên li vî derwazeyê nîvebeyabanî dikim, lertzî tê min: çawa, çawa diqewime ku girek dikare wiha veqelişe? Ez di cî de pê ve hişk dibim. Li wê derê qûçeke ‘ezamet a kevirên gewr î hûr hûr hêrandî heye, dibe gorristaneke jehrî ya ku mezin dibe. Pirtikên xubarî dikevîne pişikên min. Strî û pîjik hemû bi solên min ên werzîşê û pantorê min ê kot ve dimînin. Li ha û li hê hindê kaktûsên li ber tavê qelîyayî. Mînilîrên qetîtketîtkî yên birqonek bivê nevé mirov dixine ber bayê xwe. Ez hê berejortir dimeşim û li wê derê ez bergehêkê peyda dikim: berev hêla çepê şaroçkeya mêtîngeh a warê cin û perîyan, berev hêla rastê kortaleke hûtane ya li çarmedora wê komek xaniyên prefabriq ji bo kangerên nûhatî.

Peyv bi peyv, wateya “rehê mezin” ji Vetagrandeyê diçe. Şaroçke bi çend kilômêtroyan dûrî paytexta Parêzgeha Zacatecasê ava ye. Bi navê xwe yê din, Zacatecas, di sedsala şanzdehem de li jêr rêveberîya recîma mêtîngehkar a Spanyolan wekî şaroçkeye kangerîyê hatiye damezirandin. Ji wê demê û vir ve ye, nifira bi navê “Nifira Mînilîran” li seranserê navçeyê belav bûye. Şênîyên deverê jê re wilo dibêjin, çima ku dever ji ber êwrên xwe yên dewlemend ên zîv, mis, çingo û mînilîrên dîtir pênc sedsalan hatiye talankirin. Pêlêke ekstraktîvist a nûtir – seretayî bi pêşikêşîya kompanîyên Kenedayîyan û Emerîkanan – di sedsala bîst û yekê de qewimî û ji layê mafên bikaranîn û sûdmendbûna ji jîngeha xwe ya siruştî ve komên xelqê xwecî hê bêtir bê milk kirin.

Li jêr sazandinên birêvebirina sermayedarîya nijadî, ekstraktîvîzm destwerdaneke berfireh û mandegar di jîyana civakî û jîngehî bi xwe ve digire.¹ Kelk û sûd digihîje Bakurê Global. Hukimetên xwecî li jêr alaya geşedanê bi sermayeya firehneteweyî daherizandinên xwe yên qanûnî û sazandinên xwe yên gendel tehfil dikin. Başûrê Global her dimîne warê jehrîtyê, warşihîtkirina bi zoremilî, milîterîzasyonê û paramilîterîzasyonê, bêserûşûnbûnan, rûxana siruştî û bi pêşwextî tûşbûna tevayîya gelheyan li mirinê. Rehê mezin birîneke bêxwîn, kewnegirtî ye.

Mêjûya tundûtûjîya mêtîngehkar û bêmilkkirinê, bi rehbirbûna komelî ya bê hesab şeweyên jîyanê, sawêrên mirov û der-mirov hişyar dike ku li herêmên ekstraktîvist akincî bûne. “Xwîna Giran” projeyeke çîrokbêjîyê ye ku babeta wê heyberên sawêrane ne ku di nava kavlên jehrî yên Vetagrandeya Zacatecasê de dilûbînin û wek elokan dikine wilû lûlû. Min sawêrên ji bo vegêrranê di henga meşên xwe yên li tevayîya gir û gazên pişirî de, di serdanên xwe yên bo arxîva deverî ya wênekêşîyê û arxîva mêjûyî de, ji rojnameyan û bendên kovaran, di nava çavpêketin û hevpeyvînên li gel rojnamevanan û ektîvîstan de û, dawîyê, li mûzexaneyê civakê ya deverî ya kangerîyê berhev kirin, li kê derê min çavpêketin kir li gel jinebîya kangerekî rehmetî yê ku her wiha danerê mûzexaneyê bûye. Vegêrrana ne-lîniyî a vîdyoyê dabeşî ser şeş paran e: Pişikêkan; Berbêjî; Çûka/ê Perlezgîn; Xatûna Diranmis; Nifira Mînilîran û Xwîna Giran.

¹ Macarena Gómez-Barris, *Herêma Ekstraktîv: Êkolociyên Civakî û Perspektîvên Dîkolonyal* (Durham: Weşana Zankoya Dukeê, 2017), xvii.



Cinawirek çî teba ye? (Cinawirek ew e ku tûşî reftareke neheqane hatiye û li dadperwerîyê digere.) Bo çî cinawir pêxemê lê dixin? (Cinawir pêxemê lê dixin dema ku bêdadî li ber e ji bîr bibe. Cinawir têne mexderê dema ku têne mandelekirin; lê dîsa jî çu peypêbirin nîne der barê cinawiran de.) Çawa yek serê xwe ji cinawirekî difilitîne? (Ti rêyeke mandegar nîne ku cinawirek pê bihê têkdan; çêdibe ku cinawir bes bêne gîrokirin, reşandin; çêdibe ku derîyê sivdera wan bes bo demekê bi ser wan de bê radan.)

— Eve Tuck & C. Ree, “A Glossary of Haunting” (“Ferhengeke Têgînan a Raselitînê”)

PIŞIKEKAN

Lîstikvanek di dilqên du qereqterên cîyawaz de dilîze: kangerek û karkereke seksê ya têlefônê. Her yek ji qereqteran li ser dîmenderên hevterîb tê xuyanê. Ew li mûzexaneyeke civakê ya kangerîyê ne, dora wan bi dîwarên kufikî û obceyên zengarî girtî ye. Kanger, gava ku hilma xwe bi giranî digire û berdide, bizavên mekanîk pêşkêş dike. Karkera seksê ya têlefônê, ji oxînen xweşîyê bigire heta bi bêhnçikînê, kêş û weznên cihêreng pêşkêş dike. Rajêrîya çînî, regezî û cinsîyeta civakî dikeve pişikên wan ên proleter. Du qereqter lezê didine rîtm û teqla henaseyên xwe, hema hema ta bi asta xeniqanê. Dema ku ew nema dikarin xwe lê ragirin, madeyekî reş tif dikin. Dengên saksofona fetisî diçin ji cot-figûreke bi tora reş pêçayî.



↑ Wêneyên vîdyoyî, *Xwîna Giran* (Vîdyoya HD, 18'46"), xebata Naomi Rincón Gallardoyê, 2018



KEHANET

Qereqter vê carê li beyabanê tê xuyanê û di dêst de tomakereke dangan heye. Dengê dereke berbêjîyekê vedigêrre:

Hûn pê dizanin çî ka zemanekî kalik û pîrikên me çî digotin: di roja hesab û kîsaban de, tarî dê bikeve 'erdê û zerîyên kezî yên xwînxwar dê dagêr bibin û me pûrteve bikin. Û paşê cîhan dê bihê veguherandin.²

Figûrên rûpoşkirî yên porçeyên bisk-kaktûs ji nava devî û kaktûsên li beyabanê de derdikevin. Figûr dişibine Tzitzimimeya (vacînayên diranokî) ku xwedawendekê Mezoamerîkan e, ku enerjîyên wê yên xurre û çaralixur tînin ku nûbûna werçerxan ragihînin. Qereqter rûpoşekê bi rûyê xwe de dike û dibe yek ji wan. Jinik dibişire û diranên xwe yên mis nîşan dide.

↑ Bárbara Lázara di *Xwîna Giran* de (Vîdyoya HD, 18'46"), xebata Naomi Rincón Gallardoyê, 2018

² Ev beş ji Weqayinameya Juan Bautista hatiye adeptekirin ku berhevokeke deqên ji sedsala şanzdehem e, ên ku bi *náhuatl* (zimanê gelê Nahua yê li Mezoamerîkayê) hatine nivîsîn.



ÇÛKA/Ê PERLEZGÎN

Çûkeke/î perlezgîn li nava kavlên bergehê kangerîyê ya li Vetagrandeyê dijî. Li gorî kozmolojîyên Mezoamerîkan, çûkeke/î perlezgîn şervanek e ku di şer de têk çûye, sîmboleke cinsîyê û mexlûqeke pîroz e ku esmên bi 'erdê ve girêdide. Çûka/ê perlezgîn a 'emelî, fêlbaz a di "Xwîna Giran" de li beyabanê li nektara kulîlkan û li stargehekê digere, lê bergeha wê ya xwemalî hatiye teqandin. Wê/î rêya xwe wînda kiriye, nema dizane bi kû de biçê, her difire li bergehê ku li ser dîmendera kesk tê nîşandan. Çûka/ê perlezgîn şikeftêkê peyda dike û dikevê, di şikeftê de rastî Xatûna Diranmis tê ku pê re hevrûbûneke navtexlîdî ya canecan diqewime.

Flecha
Espina sangre
Borracha de miel
Inmóvil en el aire
Zumbando sortilegios

Nómada
Vuelo vibrador
Libando el nectar
En intercambio mutuo
Para una muerte pasajera

Picaflor
Caldera interior
Guerrero caído en combate
Alas batientes que guían
A los que desaparecieron como por magia

Zurda
Piedra tornasol
Dardo que se desplaza
A sus paisajes natales
Ruinas tóxicas y cerros triturados

Vuelan
Larga ruta
Los resucitados
Que mueren en la sequía
Y reviven con las lluvias

Desierto
Vine a buscar
A la mujer que se quema
La de los dientes de cobre
La destructora telúrica. Monstruo

Tîr
Strîya xwîn
Ji hingiv serxweş
Bê lebt û liv li hewayê
Gotinên efsûnî yên bixumexum

Koçer
Fira leredar
Nektarê firr dike
Bi alegoreke beranber
Ji bo mirineke demborî

Çûka/ê perlezgîn
Sîtîla derûnî
Şervana/ê têk çûyî di cengê de
Baskên ku tên vedan û rêberiyê dikin
Ew ên bi matmayîhêlî bê ser û berate çûyî

Çepo
Kevirê bi rengê qozeqerê
Rima ku berepaş dilive
Berev bergehên xwe yên xwemalî
Kavlên jehrî û gir û gazên pişirî

Firîn
Dûr û dûredest
Vejandiyên
Ku ji hişkesalîyê û ji bêavîyê yeko yeko dimirin
Û bi şilî û şepelîyan re vedigerine jîyanê

Beyaban
Ez hatim ku bigerim
Li jîna ku dişewite
Wê ya diranmis
A cîhanrûxîner. Cinawir.

XATÛNA DIRANMIS



Xatûna Diranmis di nava bedena xwe de û di nava dîwarên qelaç ên şikeftê de bi ser hevdengvedana dengê xwe yê hinavî ve dibe. Ew xwe tomarî tomakereke dangan dike. Ew dişibe fiğûreke mê ya Mezoamerîkan, Tlantepuzilamaya xatûneke pîr a tirsnak a ku di şikeftekê de dimîne û bi tenê ji bo ku bi xwîna zarokan û dilên mirovan mehdeyê xwe xweş bike derdikeve derve. Ew parçeyekî yekîneya serbazî ya mexlûqên cîhanî yên mê yên Mezoamerîkan e ku hêzên wan ên rûxîner tevkarîyê li nûbûna werçerxên jîyanê û mirinê dikin. Xatûna Diranmis bi sewtên cîhanî yên dîyarekî zêrandî dizûre û dixume.

↑ Bárbara Lázara di *Xwîna Giran* de (Vidyoya HD, 18'46"), xebata Naomi Rincón Gallardoyê, 2018

NIFIRA MÎNIRILAN



Di nava kevirên gewr î pişîrî yên kana vekirî de, Xatûna Diranmis seyranekê seyr digêrre. Li ser betanîyekê rûniştî ye, bi vexurkeke sor serî li xwe xweş dike, pê re jî nêrgîleyeke sor dikişîne. Di marpêçekê re ji şûşeyeke plastîk şilemenîya sor ji xwe re hildimije. Xatûn dikişîne û dikuxe. Mirîya dilbijokîyên xwe yên devkî yên jehrî ye, di bergeha kavilkirî de kêfa wê kêçê nal dike. Tomakereke dangan dide ser, pê re jî çeteya Tzitimimeyê refaquetê bi wê re dike û tevî kiryarên wê yên nepak dibe. Ew xwe amade dikin ku agirê hesreta xwe ya bo tolhildanê vêsînin.



↑ Wêneyên vidyoyî, *Xwîna Giran* (Vidyoya HD, 18'46"), xebata Naomi Rincón Gallardoyê, 2018

↖ Bárbara Lázara di *Xwîna Giran* de (Vidyoya HD, 18'46"), xebata Naomi Rincón Gallardoyê, 2018



XWÎNA GIRAN

Çeteya Tzitzimimeyê li beyabanê saksofonan û daholan dijene. Xatûna Diranmis di nava koreografiyeke xweparastinê de direqise, gava ku bi qîjeqîj vê stranê distrê:

Desde las ruinas
Nuestras vidas al acecho
Por el expolio
Portadoras del desecho
Desde las ruinas
Aguantando la rapiña
Desde las ruinas
En defensa expulsiva

Sangre pesada
Resiste, persiste
Sangre pesada
Necea, perrea
Sangre pesada
Más deseante que deseable
Sangre pesada
Durable e indomable.

Inhala
Exhala
Liba!
Escupe!
Deglute!
Muerde!
Arranca!

Blue grabbing!
Land grabbing!
Pussy grabbing!

Aunque sedientas seguimos escupiendo
Aunque chimuelas vorazmente mordemos
Aunque explotadas viviendo en exceso
Agazapadas lamiéndonos los dedos
Muertas fallidas comiéndonos las uñas
Intoxicadas con hambre de venganza


Li nava kavilan
Me kemîn vedaye
Ji ber rûxanê
Em hilgirên dêrisan in
Li nava kavilan
Xwe li ber jana talan û tajanê radigirin
Li nava kavilan
Em berevanîyê dikin û diqewitînin

Xwîna giran
Li ber xwe dide, pêdagir e
Xwîna giran
Ji kit û nîva xwe nayê xwarê, kil ha kil direqise
Xwîna giran
Arezûdar bêtirî ku bihê arezûkirin
Xwîna giran
Zorkêş û stûxwarneker.

Henaseya xwe bikêşe
Henaseya xwe berde
Firr bike!
Tif bike!
Daqurtîne!
Bide ber gezan!
Behere devê kullê!

Rapêça şîn!
Rapêça 'erdan!
Rapêça quz!

Çi qasî em ji tînan behicîbin jî, em her tif dikin
Çi qasî em bê diran bin jî, em wek gurên birçî dîgezin
Çi qasî em olamkêş bin jî, em di ser û binê xwe re dikin
Em çong vedidin, tilîyên xwe dadilêsîn
Em ên cendekên qûş lê qetîyayî, neynûkên tilîyên xwe dicûn
Mest jî vêsandina agirê hesreta xwe ya bo tolhildanê



Amraz

SAWÊR & CINAWIRÊN LI BERGEHÊN BÊMILKKIRINÊ

Tiştêkî çawa ye, Xatûna Diranmis, ku yek bibe cinawir?

Xatûna Diranmis wê yekê wiha dişayesîne: di organên xwe de, ez hest bi bedenên bigupegup dikim ku bê ser û berate çûne, bizinên ku nema tên wekî biçêrin, derametên ku mehfa wan hatiye – nefel, fasolî, xamkêsan, garis û hêjîra dirrikî ya ku wekî alif tê bikaranîn. Mehfa gir û gazên min hatiye. Çermê min pê ve herişîye. Bûne keferrehman riwekên ku zemanekî ‘erd dinixamtin. Diranên min û kevir û kuçên min xel bûne. Tew kûrtirîn bîrên min jî jehrdadayî bûne. Ez di cî de hişk bûme. Barana siyanorê û zîbeqê ez kirime behr. Ji ber zirêçê xwîna min bûye gincî. Ew dibêjine rehên min ên vekirî, jêderkên straticîk. Bi pêş vê yekê ve, ew ava di şûşeyan de didine min. Lê ez ne li vê derê me ku qala êşa xwe bikim. Ez hatime vê derê ku kesên din ên wek min bi xwe bikime serbaz. Ji ber ku em yekîneyeke serbazî ne. Di gel vê zilmê gişî, em pê berdewam in astengan disêwirînin bo geşedanê. Di gel vê zilmê gişî, em çong vedidin li wêranexakê û rehenda tolhildana xwe dipîvin.

*

Dema ku tundûtûjîya civakî ya çaresernebûyî xwe dide zanîn, sawêr û

cinawir têne mexderê.(1) Ajel, şeweyên jîyanê û gelên ku hatine kuştinbarkirin, bêserûşûnkirin yan jî kok li wan hatiye qelandin rêyan peyda dikin ku xwe bidine zanîn û xelqê bi xwe bidine hesandin. Li bergehên bêmilkkirinê, mirin ne tiştêk e ku di dawîya jîyanê de biqewime, lê li şûna wê yekê, mirin bi kûrî û dûrî têkhelkêş e di nava jîyanê bi xwe de. Çawa em dikarin ji sawêran û cinawiran re cîyê vala vekin? Çawa em dikarin ser û sîmayê wan sanahî bikin?

Diyarê sawêrî xaseten ne mijara mirovan e. Rûxana mirovî û hêzên ekstaktîv î zorlêker ên ku êrişî gerestêrkê dikin sawêrên der-mirov tînine holê. Rehbirrbûna komelî ya şeweyên jîyanê yên li ser rûyê ‘erdê bi zêdeyîyeke gelheya sawêrên firehtexlîdî re tê. Ew di herêmên ekstraktîv û pişesazîyên bicîhiştî de ji nû ve têne mexderê; ew mîna zîwanên rijd î nayêne xwestin hêşin tên. Li nava bergehên xopan î warên cin û perîyan, şopên şeweyên jîyanê yên jinavçûyî belav dikin şewl û şiqava ronahîyeke sawêrî ya ku hevdengvedêr e li gel seqaya nexalî.

(1) Avery F. Gordon, *Mijarên Sawêrî: Raseletîn û Texeyyula Sosyolocîk* (Minneapolis: Weşana Zankoya Minnesotayê, 2006).

Çalakiyên li jêrê behskirî têne pêşniyarkirin bo komên yan jî takekesên ku li cîyên sawêrdar di nava civakên sawêrdar de dijîn û dixwazin sawêran û cinawiran vexwînine nava duristkirina xwe ya cihanekê.(2)

NASKIRINA SAWÊRAN & CINAWIRAN

. Li kûçeyên û bergehên cîyekî bo we giring bimeşin, li kê derê hûn vekolana xwe, xebata xwe yan jî jîyana xwe lê dikin. Metirsîyên gengaz ên amadebûna xwe ya li wê derê berçav bikin û bergirîyan bikin li hemberî xusareta ku çêdibe biqewime.

. Esehîyê bikin çi ka di çêbûna vî cîyî de li çi û li kê zilm hatiye kirin. Bi kesan re bipeyivin, ên ku bi çîrokên vî cîyî dizanin, biçine dîtina arxîvan, hindex xwendinan bikin. Nişeyan binivîsin.

. Amaje, hest, şebeng û tomarên berê yên tundûtûjîyê yên hê jî mayî û di dema niha de berdewam in pênase bikin. Çawa şeweyên bêmilkkirinê, mêtinê û tepeserkirinê li van cîyan karîgerî li jîyanê kirine? Lê bixebitin ku binasin tiştê ku nayê gotin, yan jî nema tê gotin, lê hê jî tê hestkirin. Bi hurgilîyên zêde heta ku ji we bê, van bişayesînin çi dide hestkirin û çawa hûn van amajeyên rabirdûyê dinasin. Bi nivîsîna nişeyan berdewam bibin.

. Sawêrên mirov û der-mirov ên li vî cîyî pênase bikin. Gelo ew dixwazin çawa bêne nasîn? Gelo sicila wan a dilîni çawa ye? Gelo ew dilzîz, heçketî, hesretkêş in, yan jî pîlana tohildana xwe dikêşin? Bi nivîsîna nişeyan berdewam bibin.

SER Û SÎMAYÊ WAN SANAHÎ BIKIN

. Vêca, bi lêkirina nişeyên xwe re, seanseke gazîkirina gîyanan li tevnê bixin. Gotarekê yan jî efsûnekê binivîsin ku hûn pê bixêrhatinê bidine sawêran û cinawiran. Obceyan kom bikin ku dikarin bala wan bikişînin. Lîsteke mêvanan çêkin û bixêrhatinê bidine ê ku were mexderê. Seqaya rast biafirînin (li dangan, bêhnên, proceksîyonan û ronahîyan bifikirin).

. Wan dîtbar bikin. Bi berhevkirina wêneyên cîyawaz ji jêderkên têvel, kolac û gelaleyan çêkin. Hizra tevînekê, bêhnê, rehendê, pîvangê, tîrîyê bikin.

. Bizavên kamîrayê yên cîyawaz biceribînin heçku hûn van sawêran bişopînin. Dengên cîyawaz tomar bikin û seqayeke sonîk biafirînin ku zarî dengên wan bike. Her wiha, daxwazên wan binivîsin û wan fireh bikin.

. Van binemayan di nava rahênaneke şebengê, mirwayê yan jî ragihana tîlepatîk de bigihînine hev.

(2) Her wiha binihêrin li beşa “Warên Kaxiz” a Janine Jembereyê ya di vî bergî de, 121-43.


JÊDERKÊN VESER

- Galeano, Eduardo. *Rehên Vekirî yên Emerîkaya Latîn: Pênc Sedsalên Talanbûna Parzemînekê*. Werger: Cedric Belfrage. London: Monthly Review Press, 1997.
- Tuck, Eve & C. Ree. “Ferhengeke Raselîtinê.” Di *Rênîşa Otoetnografîyê* de. Hatiye edîtkirin ji aliyê Stacy H. Jonesê, Tony E. Adams û Carolyn Ellisê ve. Walnut Creek: Left Coast Press, 2013. 639-56.
- Vergès, Françoise. “Wekî Raperînekê: Polîtîkayên Biroketîyê, Fêrbûneveya Başûr û Dorgeya Dr. Moreau.” *South Magazine* 9 (documenta 14#4). Onlayn li ser: documenta14.de/en/south/25_like_a_riot_the_politics_of_forgetfulness_relearning_the_south_and_the-island_of_dr_moreau.

CENERÏK

Xwîna Giran, xebata Naomi Rincón Gallardoyê. Vîdyoya HD. 18’46”, 2018. Li Vetagrandeya Zacatecas Meksîkoyê hat kêşan. Kesên Performe Kirî: Xatûna Diranmîs – Bárbara Lázara; Koma Vacînayên Diranokî – Karina Rivera, Azalia Morales û Rosalba Lira; Çûka Perlezgîn – Naomi Rincón Gallardo. Gotinekan û Deqekan: Naomi Rincón Gallardo. Awazdanana Mosîqayî: Federico Schmucler. Sînematoğrafî: Dalia Huerta. Dron: David del Hoyo. Dengê Yekser: Elda Ortiz y Servando López. Belgekirina wêneyî: Angélica Canales. Koreografî: Marta Sponzilli. Asîstanên berhembênanê: Fernando Salcedo û Eric Nava. Rûpoşekan: Jorge Luis Guerrero û Abelardo Piña. Cildirû: Emilia Robles. Malavayîyên taybet bo koma vekolanê FWF/PEEK “Bê/Milkkirin: Estetîka Pişt-Beşdar û Pedagogîya Xakê.” XIII FEMSA Biennial “Em Çu Caran Nebûne Hevçerx”. Zacatecas, 2019ê heqê berhembênanê *Xwîna Giran* da. Wêneyên filîmî û fotrafên di vî beşê de hemû: berhembênaneyê bexşa hunermend Naomi Rincón Gallardoyê ne.

Hilberandina organên ji bo alternatîvê
 Li 'erdnîgareke serhildêran
 Mesixandina civakên
 Vexwendî bo xudmuxtariyê



Luz, Clarão, Fulgor /
 RONAHI, PÊT, FULGOR



Sílvia das Fadas


Alentejo, Portugal

Wa ye, çu tişt nema aîdî heman peywenda heyne berê ye. Em encama ezmûneke mişextiyê ne û zimanê me bi xwe û azadiya me bi xwe heye. Di henga salên bê ser û bin de di xaniyekî vekirî û radayî de me ew yek sepand. Em çûne ser kurm û kirasê spēleyan hemûyan. Li wî welatî ez çav bi nebûna tixûbên û xaka nedîyar dikevim heçku.

— Maria Gabriela Llansol, *The Geography of Rebels Trilogy* (Sêyîneya ‘Erdnîgara Serhildêran)

Em ne rajêrên bi tewawî bişavtî yên pergala sermayedar a cîhanê ne, ne jî çu caran wisa bûne. Redkirina jîyîna heçku vebijarkeke dîtir nîne xaka têkoşanê diguherîne û dike cîyê xebata diwartir û naziktir bo jîyîna bi xudmuxtari. Çi bi destê negengaziya bişivînê û perûbûna bi destê nîzama serdest li we hatibe ferzkirin, çu di gel bêderfetîyan hemûyan ji aliyê we ve hatibe bijartin, vê jîyanê pûtepê-ne-kerîyeke bercestekirî divê, ya ku Herbert Marcuse gotiyê, “organên ji bo alternatîvê.”

— Avery F. Gordon, *The Hawthorn Archive* (Arxîva Daregîvîjê)




Alentejo navçeyek e ku navê xwe ji çemekî girtiye, ji çemekî û bi wê de ye, berê digotinê, *Entre-Tejo-e-Guadiana*, ‘erdên di navbera çemên Tagûsê û Guadianayê. Alentejo navçeyeye cîyopolîtîk a Başûrê Portûgalê ye, li milê bakur ji aliyê Çemê Tagûse ve, li milê rojava ji aliyê Oqyanosa Atlantîkê ve, li milê rojhilat ji aliyê ‘Erdê Spanyol ve, pê re jî li milê başûr ji aliyê Çemê Guadianayê û navçeya Algarveyê ve hatiye vetixûbkirin. Li van ‘erdan, bi bizivandina ezmûna kombendî ya komîneke ku li Vale de Santiagoyê – Comuna da Luz [Komîna Ronahîyê] – ji aliyê anarkîst António Gonçalves Correia ve di 1917-18an de hatiye damezirandin, bi komîneke bi cureyekî cîyawaz re – yeke hem di nihayê de, hem jî di henga berhemhênanê de – min dest bi filîmkêşanê kir û ez ketime nava xeyalan. Ez dibêjimê, Comuna Fulgor, Komîna Fulgorê. Û, ji bo ku tiştê min li dereke din gotî bixime ber kiryarê, “Fulgor birqonekîyek e ku çav li berê didelin, qutbûneke peywendîyan e di nava demê û mêjûyîtiyê re ku ihtimala hevrûbûnê çaverênekirî ji kevîyan de dihewîne.”¹

Rasthatina min a pêşîn li Komîna Ronahîyê di zivistana 2017an de qewimî, dema ku bi hunermend Sara Chang Yanê re ez çûme dîtina kaviîlên wê. Me li kafeyeke deverî ya li Fornalhas Velhasê vêsa xwe girt û der barê komînê de me pirs ji gundîyan kirin; wan ji me re qal kir ji tiştên ku pê dizanibûn û berê me dane cîyê komînê. Me sênc û çeper vekirin, dem bi lênihêrînê û lêguhdaîrkirinê bihurand û rûloyeke filîma 16 mm a reş û spî kişand. Di pey re wê havînê, bi hunermend û filîmçêker Lisa Truttmanê re ez çûmeve kavilan û bes min dît ku ‘erdê komînê ji aliyê heşt xwedîyên ‘erdan ve wê hingê hatibû dabeşkirin, ên ku çu eleqeya xwe bi komîna mêjûyî tînebû. Yekî ji van xwedîyan rê neda me ku em derbas bibin. Bi halekî guman xeyirî me ew

↑ Firehkirina çarçoveyê ji Sílvia das Fadasê, *Ronahî, Pêt, Fulgor* (2019) ya ku siya darekê ya li Komîna Ronahîyê ya li Vale de Santiagoyê nişan dide

¹ Sílvia das Fadas, ‘*Elamêtn Ji Bo Şewandin û Geşedana Nehayirarkîyî*; bergê di nava rêza “Die Frau mit 50 Füssen,” yê editör: Cristina Gómez Barrio & Wolfgang Mayer (Stuttgart: Akademie der Bildenden Künste, 2019), 33.



der bi cî hişt, lê pirr tê ve neçû bi dîtina ku me dît em li ser rêyên biçûk, zevîyên mezin û hevrûbûnên çaverênekirî ne.



Bi Koma Vekolanê ya Zîwanên Xweragir re di havîna 2018an de ez vegeyame Komîna Ronahîyê. Bi hev re em bi çendîn saetan ji Vale de Santiagoya nêziktirîn şaroçkeyê meşîyan berev cîyê komînê. Ku me dît kesî li ber me neda, em ketinê û li ser zemînên wê rûniştin ku bêhna xwe vedin û bipeyivin heta ku roj çû ava. Ji ber ku ez bi pêdagirî li 'elametan digerîyam, di havîna 2019an de, vê carê li gel hunermendê dangan û awazdaner Robert Blatt, ez dîsa bê destûr di nava sênc û çeperên komînê re ketimê. Gava ku wî dengên kavilan tomar kirin, min jî, yek jê rengîn, a dîtir reş û spî, du rûlo filîm kişand. Me ji hev û din û kesên li der û dora xwe re bi dengê bilind xwendin ew nameyên ji aliyê Gonçalves Correiayê ve hatî nivîsîn û ji aliyê rojnameya anarkîst *A Batalhayê* ve vê axirîyê ji nû ve hatî weşandin. Her cara ku ez diçime wê derê, ez mêjûya komînê vedigêrim, qenebe ya ku ez kêr jê agehdar im. Heke em bi têtetina bê destûr berdewam bibin, ew ê bibe pîrozkirina gîyanê hizrekê ye, gîyanê anarkîstê hezkirî, jina nenas û kesên ku di komînekê de bi hev re jîyan ku zehf zû ji hev ket.

Ji kavilên komînê de, min da ser rêya çeman, rêya daran, rêya keviran, rêya zindîyan û ez di nava bayo-navçeyê re meşîyam, wekî tê texmînkirin, awayê berbad ê deranîna puxtayê qûş li min qetand. Li gel heval û hogiran û gerokên nenas, em pê ketine komîneke demkî ava dikin di xanîyekî hevbeş de ku ne ye me ye, li gundekî ku me dît nebez û mêvanhez e. Ji wê hingê ve, filîmkêşan bêtir nêzikî jîyanê bû.


“Ez”a filîmçêkerê ji binî ve tê veguherandin û dibe “em”eke bergeşedan, dahatûgeş; û em ne pê dizanin ev filîm çi ye, ne jî reng e ev filîm çi bike. Ev mesxa pêşîn e; wekî din jî hene ku dê bîn.

Luz, Clarão, Fulgor/Ronahî, Pêt, Fulgor cureyek taqî ye: sepaneke mîyûtintan e, ên ku lê digerin da ku guheraneke metamorfîk peyda bikin. Vîyan, hem bi ezmûnî, hem jî bi

↑ Firehkirinên çarçoveyan ji *Ronahî, Pêt, Fulgor* (2017) yên ku Komîna Ronahîyê ya li ber nîveheyvê û qelşêke di dîwarên xirbeyê de nişan didin



↑ Firehkirinên çarçoveyan ji *Ronahî, Pêt, Fulgor* (2019): Rêya daran li Arraiolosê; Rêya çêm li Troviscaisê; Rêya keviran li Cromeleque dos Almendresê; Nîgara Kêvir li Mina de São Domingosê; Rêya maran li Pego Ferreiroiyê; Rêya deryayê; Rêça Masigir; û Rêya ne ti rê ya deranîna puxtayê ya li Zambujeira do Marê



pêkhênerî, hêzê jê re dabîn dike. Ew teşebbusek e li ser nehayirarkîyîkirina cîhanê ji nava navçeyekê de, sepaneke dokumentêr e ku bi şeweyekî asoyî pêk hatiye ji letan, heyînan, jîngehan. Hindek ji me ne xelqê vê navçeyê ne, lê dîsa jî em hest dikin ku em li êkolocîyên wê yên aloz û anîzaz hatine nîgarkirin. Pê vê tîma qadê ye ku Komîna Fulgorê bi laş û gewde dibe: di mercên xweberê û vekirdarkirî de, ji ber înfialê, di nava têkoşaneke li dijî qonaxên berdewam ên xizankirinê, deranîna puxtayê û mêtinê de. Li vê navçeyê em tundûtûjîya rehîkûr dibînin: sênc û çeperan, milkê arizî, projeyên kangerîyê, çemên jehrdadayîkirî, rêzên darên zeytûnan û behîvan ên ku xwelîyê, avê û hewayê digemirînin û asoyê hildidin – gorristan in li ber çavên me. Berev hêla deryayê, tavxaneyên ku ji alîyê kompaniyên bazirganîyê yên firehneteweyî ve tîn şuxulandin

↑ Firehkirinên çarçoveyan ji *Ronahî, Pêt, Fulgor* (2018 û 2019): Çemê Dabirîner û Flauta de Luz, her du jî li Pego Ferreiro; Berûyên Tepedoran li li Arraiolosê; û Keça Rûpoşdar Li Fúara Şadiyê li São Luísê

heta ku çav dibirre belav dibin, ên ku karkerên koçber û bêbelge, regezperestîyê, ‘erdê û peywendîyên daxurîyayî tînin. Li rex recîmeke bêmilkkirinê, têkoşaneke yekneseb ji bo jîyaneke jîyînbar rû dide: bedenên di qonaxa liberxwedanê û xwedahêrandineveyê de, ku doza kevîyan dikin, girêdanên bi axê ve çalak dikineve, berhingarîyê li deranîna puxtayê dikin, xwe biçûk dikin, koman û herêmên xudmuxtar ava dikin, tovên Xwecî û zanyarîya rexneyî direşînin, şî’ran werdigerînin, mêvanhez in û dimînin li gel arîşeyê, gava ku her wiha ne berdest in. Ku em ji Avery F. Gordon jêwergiranê bikin, “Azafî qonaxek e ku hûn pê wê geşeyê bi sepanekê didin wekî hûn nema di tûşa bendetîyê de ne.”² Bi rastî jî.

Em dişopînin, radiçînin û heta bi binî dikevîna nava firêtên cîhanduristker bi rêya “nihêrîna li ‘erdnîgarên livbazîya yekser, alîkarîya beranber û polîtîkaya prîfîgûratîv.”³ *Jornal Mapa, Flauta de Luz* û *A Ideia* – sê weşînekên ku halê hazir li komstêrka mekanî ya Alentejoyê têne weşandin – bi rexnegirî me agehdar dikin û sirûşê dibexşînine me, tovên serkêş û înternasyonalîst belav dikin ku, em pê bawer in, hişmendîya mirovan a ji bo livbazîyê û sepanên afirandinê yên xudmuxtarîyê û bêemrîyê bilind dikin. Armanca me ye ku em pêk ve bijîn li gel afirandîyan hemûyan dema ku em di pûtepê-ne-kerîya xwe de berdewam in. Hevkarîyên me bi sazûmana hevdirûvîyê pênase dibin: yek rastîhevhatin rêyê li ber a di pey re vedike û rêyê li kêf û şahîyê xweş dike; mêvanhezî maqûl û miqabil e. Di nava tirsêrgirtinê û pesendê de, filîm dide pey seyra xwe.

Em xwe amade dikin. Weku Fred Moten angaşte dike, “Em dixwazin pê berdewam bibin bibînin di henga berhemhênanê de em xwe digihînine çî. Ya cîyê giringîyê ne ew e ku şarezayî yan jî huner hatibine gîrokirin. Ew bi tenê vexwîni hev bûne, ji nasnavên xwe selixîne, parî hev bûne.”⁴ Berhema koroyê û di henga berhemhênanê de, filîm amrazek e ji bo kêf û şahîyê; bi rêberîya fulgorê, behitanê dinûrîne û jêk vedike, yan jî hêza veşarî ya ji bo geşepêdana di çarçoveyên nehayirarkîyî de.

Bar û doxên xudmuxtar ên berhemhênanê û belavkirinê têne rahênanandin û kar bi wan tê kirin. Bêyî deqên nivîskî yan jî tretmanan, bi awayekî binavbirî em filîmê dikişînin û pêdeçûnê li ser dikin, lê wekî xerîkî peywendîyên pûtepêdanê û xwedangiringîyê, di rewşeke boş a neagehdarîyê û mereqdarîyê de û çaverê bo ya nepêşbînbar, weku Bresson em fêr kirin.⁵ *Luz, Clarão, Fulgor/Ronahí, Pêt, Fulgor* bi dubareyên cîyawaz tê belavkirin, di û li derveyê holên sînemayê û mekanên galerî de; di qadan û zivîngan û avahîyên mişemir de; exlebe li şûnwarên cîyê xweşûbêşê û giştî. Di tarîyê de. Li derveyê mantiqa milkedar a premîyeran û berebazîyan. Vê sîne-morfosîsê hêza xwe ya veşarî ya afirandina jûreke hevdengvedanê, licneyeke tîrîşkane û nedawîn heye.


Em nema li bendê dimînin. Me dest pê kir em bi awayên cîyê geşedanê dijîn û ev mesxa duyem e. Hê jî, wekî din jî hene ku dê bèn.

2 Avery F. Gordon, *Arxîva Daregîvîjê: Nameyên Ji Kevîyên Utopîst* (New York: Weşanxaneya Zankoya Fordhamê, 2018), 49

3 Simon Springer, *Rehên Anarşîst ên ‘Erdnîgarê: Berev Azadbûna Mekanî* (Minneapolis: Weşana Zankoya Minnesotayê, 2016), 94.

4 Fred Moten, “Heydê, Wê Bigire!” *The New Inquiry* (19 Reşeme 2018); onlayn li ser: thenewinquiry.com/come_on_get_it.

5 Robert Bresson, *Nîşeyên Li Ser Sînemayografîyê* (New York: Urizen Books, 1977).



Amraz

MEŞ WEKÎ NAVGÎNEKE AMADEKARÎYÊ

Gelek caran gotine min divê ez nemeşim. Çima ku zehf dût e, yan jî xeternak e, yan jî ji ber ku, wekî jinekê, min ê xwe bida belayê. Bi tenê bi rêya guherana kartêker a cî, ji Lisbonê bo Los Angelesê, ez tê gihîştim ku meş şeweyekî gelemperî yê derbirranê ye, awayekî naskirin û xwestina cîyê xwe yê xweserî xwe yê di firehgerdûnê de. Henga ku ez li Alentejaya li Başûrê Portûgalê dixebitîm, lê ez ne xelqê wê derê bûm, min meş guncan dît wekî metodolocîyeke karîger û bedenî ya ku rê bide min ku ez peywendiyên germ daynim li gel xakê û ji wê û pê wê fêr bibim, dehndana gerûyî biperisînim, li jêr projeyên ekstraktîvist govaniyê li peqanên wê yên jîyanê û li dagîrbûna wê bikim. Min dest pê kir bi tena serê xwe meşiyam, tevî kamîrayekê û tomakereke dangan, û hangava “ez” bû “em”ek, di kombûneke binemayê, kesan, mexlûqan û sawêran de.

Bi cihêrengî be jî, meş li cureyên bergehên kîrr û kewşenan û bergehên bajaran hemûyan çêdibe wekî amrazeke bi forma bedenî bihê bikaranîn. Heke meş li beşeke cîhanê dibe ku sepaneke azadker bihê hesibandin, li cîyên dîtir reng e mişt be ji radeyeke bilind a xeterê û metirsîyê, ku jê re bêjimar bergirî divên. Meş çalakiyeke rojane ye ku, heke bi mebestî bihê bercestekirin, gengaz e bibe amrazeke polîtîk, livbazîya kombendî bixe merîyetê. Bi piştevaniya bedenên dîtir, yek dikare bi tena serê xwe yan jî li

gel hindekên din bimeşe. Yek dikare bi şeweyekî hevgerî û pêkvejiyanî li gel xakekê, kesekê/î, civakekê, gelekî, dozêkê, yan jî wekî şeweyekî forma bêemrîya medenî, bimeşe. Weku Juanita Sundberg pêşniyarê tîne, bihevremeşin “şeweyekî pîgariyê ye ku ava bûye li ser mûteqabilîyetê û beranberîyê, meşinê û guhdarîkirinê, axiftinê û kirinê. Di sepanên berhemana cîhanan de pevremeşin pabendî û peywendîya li gel civakên û takekesên Xwecî wekî kirdeyên, wekî hevalên xebatê yên zêhnî û polîtîk pêwîst dike. Awayê ku yek peywendiyê pê datîne dê şeweyên curecur bigire û dê ji bo her kesekî cîyawaz bibe.” (1)

Wekî sepaneke vekolanê, meş jêderka sirûşê ye bi raya şa’iran, xeyalperestan, yaxî û baxîyan û ektîvistên ku dimeşin û hey digerin, bi raya firyarên ku bi peyatî baz dane, bi raya derbideran û civakên di mihesereyê de mayî; bi raya Soryalîstan û Sîçûeyşînistan, ji ber sepanên xwe yên saykocografyayê û *dériveyan* (xweberdanan); bi raya koma “Stalker: Observatoir Nomade”ê, ku di qelşên bajêr de bi kombendî dimeşe; bi raya projeyên her wekî “Pevguhestina Meşê”, kombendeke meşê ya ku meşên pedagogîk û afirîner ên serbest berhertîne ku armanca wan ew e bi rêya Korsên Perwerdeyê yên Meşê û Vekolanê (WSTCS) civakeke meşvanên rexnegir ava bikin; yan jî, projeya vekolanê ya demdirêj a li ser metodolocîyên meşê yên nenormatîv

Amraz

a WalkingLabê, ku nêzikayîyê di matîryalîzmên nû yên feminîst, teorîyên regezê yên rexneyî û teorîyên kûyiriyê dide da ku serê xwe bi giringîya meşê biêşîne.

Werhasilî kalam, meş jêderka sirûşê ye bi rêpîvan û xwepêşandanan û raperînan hemûyan ên ku têne destpêkirin li ser destê kesên ku dicivin û bi hev re dimeşin. Meş wekî şeweyekî berxwedanê û peypêbirina der barê cîhanê de di têkoşanên jinan ên li tevayîya cîhanê de lap berceste ye, praksîsek e ku filîmçêker û zanyar Trinh T. Minh-hayê bi nav kiriye wekî “Meşin Li Gel Bêserûşûnan,” zimanekî amajeyan a afirîner a meşîna nava hebûnê ya ji aliyê Dayîkên Cezayîrî yên Bêserûşûnan û Dayîkên Plaza de Mayoyê ve hatî xuyakirin, ên ku wêriyan deng li desthilatê bikin, yan jî ji aliyê jinên Emerîkan î Efrîqayî ve, ên ku nexşeya Boykota Basan a Montgomeryyê danîn û sepandin, red kirin wekî li basan siwar

bibin ji bo ku li gel cudaxwaziya nijadî tê bikoşin.(2)

Meş zanyariyeke bercestekirî û şûngirtî ye. Meş hizir, qisedanên û hevrûbûnên spekulatîv dizeyîne. Meş ezmûneke sehekî ya peywendîyî ye. Heke tu bi xakê bizanibî, a ku tu tê de dimeşî, û wekî têkildarî wê hest bikî, zêdetir reng e ku tu li wê miqate bibî, bi wê ve hebî û wê biparêzî. Ew yek hêza veşarî ya meşa li cîhanê bêtir-mirovî ye. Meş navgîneke kartêker a amadekarîyê ye. Di dahatûyeke devîdevî hilweşanekê de, meş ê jîyanî be.

- (1) Juanita Sundberg, “Dîkolonîzekirina ‘Erdnîgarên Posthumanîst,’” *Cultural Geographies* 21, no. 1 (2014): 33-47; doi: 10.1177/1474474013486067
- (2) Trinh T. Minh-ha, *Evînkujî: Meş Li Gel Bêserûşûnan* (New York: Weşanxaneya Zankoya Fordhamê, 2016)



Çalakî

JI NÛ VE BIMEŞIN

Ew ên ku dimeşin û ew ên ku têne meşandin: biçine meşê. Bila gîyanê meşê rê li ber we bixe hûn berev her kê derê biçin, bila mereqa we çalak be, lê dêhn û bala xwe bidine siruştê bergehê, xeterên û peywendiyên hêzê yên ku dişuxulin. Tiştên ku ji bo meşê we pêdivî ne dê di nava peywendên civakî û keltorî re biguherin, lewma hizra xetên serekî yên li jêrê hatî bikin û yên xwe li lîstê zêde bikin:

- . Li ser xaleke destpêkê biryarê bidin, lê ne şert e hûn biryarê li ser cîyekî hedef ê dawîn yan jî nas bidin.
- . Heta ku ji we bê, kême tiştan bi xwe re beherin wekî, heke pêdivî bû, hûn bikaribin bi serbestî bimeşin û bi lez birevin.
- . Sehekan xurt bikin: meşa kûr dêhdana gerûyî û guhdarîkirina kûr pêwîst dike.
- . Bi şertê ku hûn bîsteh bin, rê bidine xwe ku hûn xêreve bibin û sheka dema kronolocîk ji dest bidin.
- . Bala xwe bidine bûjenê, her wekî xwelîyê, tovan, kêvir, daran, xîzê, kevirên sell, asfaltê.
- . Hesabê bedena xwe û laşdarîya xwe bikin.
- . Defterekê û qelemzirêçekê bi xwe re binin, nişeyan binivîsin, nîgaran bikêşin.




Bi her pêgaveke berepêş re, cîhan ber bi me ve tê.
 Bi her pêgaveke berepêş re, kulîlkek dibişkive li binê pêyên me.
 Bi her pêgaveke berepêş re, bi awayekî derî li ser piştê û kûr bûyî bi
 xwe de, kesek xelatên gerdûnê werdigire.
 Fêr dibe çawa ji nû ve bimeşe.

— Trinh T. Minh-Ha & Jean-Paul Bourdier, “L’autre marche / The Other Walk”
 (“L’autre marche/Meşa Dîtir”)

Çalakî

MEŞ JI BO XUDMUXTARÎYÊ

- . Bi mebesta ku hûn fêrî naskirin û pênasekirina riwekan bibin, ên ku li kurr û kewşenan çêdibin, biçine meşê.
- . Wê yekê li gel keseke/î di civatê de bikin, keseke/î ku der barê riwekan de zane ye, yan jî li kitêbeke baş a li ser babetê bigerin.
- . Di sênc û çîtan, tixûban û milkên arizî re, her kê der ji xeterê parastî be, bê destûr bikevine hundir.
- . Hindek riwekên ku têne xwarin berhev bikin, pê tiştên we kom kirî xurekekî kombendî amade bikin.
- . Di demsaleke cîyawaz a salê de wê yekê dîsa bikin.
- . Hesabê bedena xwe û laşdarîya xwe bikin.
- . Hindek gavên paştir ên gengaz: baxçeyekî daynin yan jî çembereke tovan biafirînin; bi rêya berhevkirin, çandin, dirûn û levakirina tovan fêrî naskirin û parastina tovên xwemalî bibin.






Çalakî

MEŞ JI BO ÇAKSAZÎYÊ

- Çi taxeke tovrindkirî, çemekî gemirandî, techîzateke sondaca niftê, şûnwarekî kangeriyê, çi jî qadeke kişawerziya yektexlîdî be, cîyên şûnwarên bêmilkkirinê yên nêzikî xwe destnîşan bikin.
- Kesên xwedanên zanyariyên cîyawaz ên der barê şûnwarê bijartî de vexwînin ku hûn bi hev re bimeşin.
- Li cîyên darîçav vêsa xwe bigirin û çavdêriyê bikin. Heke pêdivî bû, bê destûr tê kevinê, yan jî li dûriyeke ewle rawestin wekî hûn xwe û yên ditir nexine metirsîyê.
- Xeyal û gotûbêjê bikin bê ka çêdibe (bi takekesî û kombendî) çi bihê kirin ku êkosîstemên li vî cîyê bêne parastin.
- Rexmî zîyanê, li nîşaneyên berxwedanê, qewîniyê, tomarên mandelekirî û dijraber bigerin. Van tomaran belav bikin.
- Hindek gavên paştir ên gengaz: bi şeweyekî kombendî bixebitin; hem pakkirinê, hem jî sabotacê bihesibînin.

Bergehên siruştî yên global îro mişt in ji kavlê bi vî cureyî. Di gel ku hatiye ragihandin wekî mirine, dîsa jî ev cî dikarin jîndar bibin; ‘erdên pas î nirx bilind ên bi cî hiştî carinan berên jîyana firehtexlîdî û firehkeltoirî ya nû didin. Di rewşeke global a bêseqamîyê de, ji bilî ku ku di nava vî kavlê de em li jîyanê bigerin, me vebijark nînin. Pêgava me ya pêşîn ew e ku em mereqê bînineve. Bêyî ku em tûşî astengên asankirinên vegêrranên perisanê bîn, girêkên û rehjenên qetxepêlîyê wa ne ku em bi ser ve bibin.

— Anna Tsing, *The Mushroom at the End of the World* (Kufkarika Li Dawîya Cîhanê)



↖ Firehkirinên çarçoveyan ji Ronahî, Pêt, Fulgor (2018): Kavlên kargehên şîva trêne li Mina de São Domingosê: ava jehrî ya kaneke vekirî ya rûxarî li Mina de São Domingosê: û, balindeyekî mirî

Amraz

SÎNEMAYA SEYAR

Arezûya bo danîna sînemayeke seyar zîl da ji daxwaz û berpirsariya belavkirina filîma di mesxê de (û, axirî, dubareya wê ya dawîn a di dahatûyê de), ya bi sernavê *Luz, Clarão, Fulgor/Ronahí, Pêt, Fulgor* a tevî kesên û civakên li navçeya Alentejoyê yên ku ez rastî wan hatim û min filîma wan kişand. Her wiha ji ber şayîşa ku sînema ji navê diçe ji jîyana mirovan, nemaze mirovên ku, çi li taxên li perên bajaran, çi li deverên li nava welêt, çi ji li gundewaran, li wargehên jibîrbûyî dijîn.

Di nava Sînemaya Sêyem (û bizavên rizgariyê) de sepaneke hevbeş bû ku tevî makîneyeke pêşandana filîman bigerin ji bo ku sînemayê bînine ciyên ku sînema exlebe tê de nîne. Kombendên filîman û komên milîtan bi heman şeweyî, nemaze di 1960an-70yan de, ev navgîn bi kar anî da ku filîmên xwe belav bikin, destpêşxeriyê li hevpeyvînan bikin û tevkariyê li guherana tundraw bikin – komên her wekî Koma Filîman a Jinan a Londonê ya di 1970yan de, Ogawa Shinsuke û Ogawa Pro Collectiveê (Caponiya, 1967-86) û Grupo Zero (di henga qonaxa Şorişî ya Berdewam a Portûgalî de). Wek zîwanên ku zîl didin, sînemayeke mobayl xwedanşîyan e ku li her derekê aj bide: li bajaran, gorrepanan, baxçeyan,

qadan, yaneyan û komeleyan, kanan, zivingan, pangan, li binê pireyan, li qadên hevbeş yan jî avahiyên mişemir. Ne xweş be jî, çêdibe bihê gotûbêjkirin ku ezmûna sînemaya dicîtil a li malê (li ser dimendera kompîterekê yan jî televizyonekê) şeweyekî havîkirinê û bêmilkkirinê ye wekî berevajîyî ezmûna komînal û bi şeweyekî potansiyel polîtîk a sînemayeke hevbeş.

Hevpeyvîneke berfirehtir yan jî canecantir be jî, sînemayeke/pêşandaneke mobayl dikare bibe amrazeke ku destpêşxeriyê li dayalokeke kombendî bike, jî ber ku new'ekî kombendî yê pêşkêşkirinê û raguhestinê dabîn dike, rê dide mirovan ku boçûn û hizrên xwe beyan bikin li ser tiştê ku ditine û bînaneyan yan jî nehevberîya xwe derbibirrin. Bijartina filîman di keliyêke diyarkirî de dikare peywendîdar bibe li gel babeteke ciyê lezê ya ku yekser xwedana giringiyê ye bo civakê, her wekî avê, rapêçkirinê 'erdan, cudaxwaziyê û ta dawiyê. Em (Koma Vekolanê ya Zîwanên Xweragir) pê bawer in ku sînemayeke seyar dikare alîkariyê bike wekî bînerên sînemayê û banekiyên wan bînan vedahênan, texeyyuleke sînemayî ya mandegar peyda bike û fersendê bide kombûneke asoyî ya mirovan di cîhanêke hevbeş de, xwe heke cîhanên bi vî rengî demkî bin jî.

Çalakî

PÊŞANDANA KOVÎ


Sînemayeke mobayl dikare jixweber biqewime, şewê bide lihevkerinê yekser bi kesan û ciyan re. Hindek tiştên ku bînan amadekirin: Makîneyeke portatîv a pêşandana filîman yan jî makîneyeke pêşandanê ya dicîtil a bi nîşander; sêpêyêke makîneya pêşandanê yan jî tiştêkî tayê wê her wekî qûçêke kitêban a li ser kursiyekê; aparlorên ji bo bilindkirina deng, dimendereke portatîv; diwarekî yan jî çarşeveke spî; rûnişteke (kursî, balgî, paldankên mînder); filîmekan.


. Ji bo pêşandana kovî deverê peyda bikin. Hûn dikarin seyareyekê, kamyonetekê yan jî tiştêkî berdeambartir ê li ser tekeran ê bi duçerxeyekê yan jî motorsikletekê ve girê dayî bi kar bînin ku ekipmanê û kereşyan veguhêzin.

. Hevalbendan ji deverê peyda bikin. Filîmekê bijibêrin ku li gel wê civatê yan jî koma hevbeşarmanc bigunce. Pêşandanê bi rêya gotegotê û, heke dem rê bide, bi postereke mirêsdar ragihînin, posterê li qadên giştî hilawêzin. Filîmekê yan jî çendekan nîşan bidin. Destpêşxeriyê li hevpeyvînekê bikin. Gotûbêjê bikin û bila nehevberî li we rûnê. Heke rê tê re hebe, vexwarinan û xwarinê parî hev bikin.

. Pêşandanê li ciyekî din dîsa bikin. Bi rêk û pêkî veqerine heman ciyan.

Hindek mijarên dîtir ku hûn hay jê hebin: divê tercîhek bihê kirin; yan hûn ê sînemayeke seyar a sazûmanî daynin, ku jê re qedemeyên aloz divên her wekî dabînkirina destûrnameyekê ji rêveberîya deverî, peymanên li gel belavkeran û şopandina rêzikên birokratik, yan jî hûn ê sînemayeke derqanûnî ya bêbênzîn yan jî yeke ku hûn bi xwe bişuxulînin çêtir bigirin, filîm ê jixweberkî bêne nîşandan û hûn ê şîrîkatîyê bi kesên û ciyên wekî din re bikin.





Amraz

PÊŞBÎNÎ

Pêşbînîkirina jîyaneke dinyewî û cîyê geşedanê, di nihayê de û di henga berhemhênanê de, armanca vê amrazê ye: rê dide me ku em binasin çi ka jixwe çi li vir e û her tim ne xuya ye, lê çêdibe ku ji nişkê ve dade û dagîr bike û wisakarî jî biguherîne şeweyê awayê ku em di rastîyê digihîjin, çawa ku fulgorê ças û qudreta xwe ya kirinê heye. Bi fêrbûna civakî re pirr û gelek jixweberî û zimanên amajeyan ên ezmûngerayî hene û pêşbînî karê amadekarîyê ye ji bo ----- . Pêşbînî ew e ku Avery F. Gordon (di rêya Herbert Marcuse re) dibêjîyê, “hilberandina organên ji bo alternatîvê,” û ew e ku J. K. Gibson-Graham amajeyê pê dike wekî, “xeyalkirin û bizivandin.”(3) Ez hez dikim bibêjimê, qonaxa “lêgerîna bo ‘elametan.’”

‘Elamet mirwa yan jî nişaneyên razbar in ku tu li bergehê pênase dikî dema ku tu peywendîyeke germ li gel cîyekî diyar datîni yan jî li gel ên ku tu dikarî wekî zimanekî razbar saz bikî, berhembînî, biguncînî yan jî dahênî ku

keseke/î din jî dibe ku binase û bi wate bike. ‘Elamet dikarin li gel aboriyên û sepanên pêguhêr ên xudmuxtariyê bêne peywendîdarkirin. Bo nimûne, derbideran û koçeran nişane dihiştin ku di dewsa peyaman de bûn bo kesên din, her wekî: “tu dikarî ji vê avê vexwî”; “karmendê polês xedar e”; yan jî, “çêdibe tu li vir bihewirî.” Binemayeke razbariyê bi hindek ji van nişaneyan re heye, lê ew ne arizî yan jî şexsî ne. Ew sepaneke cîhanduristker, deqeke niviskî ya veşartî, mêjûyeke potansiyel a ji binî ve ye.

- (3) Avery F. Gordon, *Arxîva Daregivişê: Nameyên Ji Kevîyên Utopîst* (New York: Weşanxaneya Zankoya Fordhamê, 2018), 375; J.K. Gibson-Graham, “Xeyalkirin û Bizivandinê Polîtîkayê Ekonomîk e Feminîst e Postkapîtalîst,” *Women’s Studies Quarterly* 34, no. 1/2 (2006): 72-8.

Mirwa. Tirsên hovane yên mirovan
Ev dûrayî, verastkirineke stranên
ku belavî ser sermayeyê bûne, komek qanûn
ku zindîyan bikujin. Beşawendekan, ev dûrayî.
Kavil barîkad in. Stran hestî ne.

— Sean Bonney, *Our Death* (Mirina Me)

↑ Firehkirinên çarçoveyan ji Ronahî, Pêt, Fulgor (2018): ‘Elametekan I, Vale de Santiago; ‘Elametekan II, Arneiro; ‘Elametekan III, Panóias; ‘Elametekan IV, Arneiro; ‘Elametekan V, Ourique



Çalakî

NAME WEKÎ TÎRAN

Nameyek tîrek e, xelatek e, kapsûleke demê ye. Name qasidiyê, viyaneke xurt bo xwe gihandina li kesekê/î yan jî li tiştêkî hildigire. Ev çalakîya name-nivîsinê jî we divê hûn pêşbînîya wê cîhanê bikin ku yek dixwaze tê de be yan jî bibe beşeke wê û şeweyên ku yek dixwaze pê bijî, jî we divê hûn cîhanên bi vî rengî, bi birbirina pêşbînîyî, heta ku jî we bê bi şeweyekî geş bişayesînin. Bervêderên nameyan çêdibe kesên xeyalperest, kesên rastbîn û her kesekê/î di navberê de bin û her kesekê/î dîtir ku dikare wan werbigire. Ji bo amadekirinê, jî bîr nekin ku name dikarin bi navgînên ragihandinê yên cîyawaz bèn afirandin: nivîsin, nigarkêşan, tomarkirina deng, wêneyê bizavdar. Li gorî navgîna ku hûn bijibêrin, dibe ku pêdivîya we bi kaxizê û pênuşekê, tomakereke dangan, kamirayekê, têlefoneke mobayl, kompîterekê yan jî kerese-yên dîtir çêbe. Paşê, dest pê bike:

. Biryarê bide nameya te tîra bi çi cureyî ye û amraz/navgîna xwe ya ragihandinê ya çêtirgirtî amade bike.

. Bervêderê/î bijibêre.

. Nameya xwe binivîse. Pêşbînîyê bike. Ji xwe re xeyalan çêke.

. Nameya xwe bigihîne bervêdera/ê xwe.

. Piştî xwendina nameya te, jî bervêder/ê bixwaze bila cîhana te ya vîyayî bi dengêkî bilind jî te re bişayesîne.

. Name bi te çawa tê? Ji nêzik ve û jî dûr ve lê binihêre. Tê bihizire cîhana ku te şayesandiyê çend cîyawaztir e jî cîhana ku tu tê de dijîyî. Reng e çi bihê kirin ku ew valayî bihê dagirtin?

Çendek mijarên dîtir ku hûn hay jê hebin: ev çalakî dikare li hundirê jûrekê di nava çend saetan de bihê kirin. Çalakî dikare zêdetir bikude û dabeşî ser keliyên navhatî bibe: keliyên nivîsîna nameyê, yên şandina/belavkirina nameyê, yên xwendina/wergirtina nameyê, yên bersivandina nameyê bi rêne dîtir.

↑ Firehkirinên çarçoveyan ji Ronahî, Pêt, Fulgor (2019): Nameyê dengî ji Komîna Fulgorê li Troviscaisê: Fira sîsolekî sor li Portas do Rodãoyê

BERHEMÊN HUNERÎ & FILÎMEKAN

- Akerman, Chantal, derhêner. 1997. *Nûçeyên Ji Malê*. Carlotta Films.
- Aurand, Ute, derhêner. 2004. *Niveheyv Ji Bo Margaretê*. Ute Aurand Filmproduktion.
- Baudelaire, Eric, hunermend. 2014. *Nameyên Bo Max*. Poulet-Malassis. La Région Île-de-France; LUX Artist's Moving Image.
- Carasco, Raymonde, derhêner. 1979. *Tarahumaras 78*. Raymonde Carasco.
- Costa, Pedro, derhêner. 2016. *Xortaniya 'Ezamet*. Memento Films.
- Diop Mambéty, Djibril, derhêner. 1999. *La Petite Vendeuse de Soleil*. California Newsreel Productions.
- Fishinger, Oskar, derhêner. 1927. *Meş Ji Munîxê Ta Berlinê*.
- Mackenzi Kent, derhêner. 1961. *Yên Mişext*.
- Mateus, Marta, derhêner. *Farpões Baldios/Dirriyekan, Wêranexakekan*. C.R.I.M. Produções, Sociedade Óptica Técnica.
- Muñoz, Jeannette, derhêner. Ji 2005an ve. *Dexes*.
- Ogawa Productions, derhêner. 1986. *Katjimêra Rojê ya Kolayî Bi Kêrtên Bi Hezaran Salan – Çirokeke Gundê Maginoyê*. Ogawa Productions.
- Rey, Nicolas, derhêner. *Molussia. Bi Cîyawazî*. Kompaniya Berhemhênanê yan jî Belavkar.
- Rivette, Jacques, derhêner. 1974. *Céline et Julie Vont en Bateau (Céline û Julie Pê Belemê Digerin)*. Films du Losange.
- Rousseau, Jean-Claude, derhêner. 1983. *Jeune femme à sa fenêtre en lisant une lettre*. Rousseau Film Production.
- Vaz, Ana, hunermend. 2016. *Há Terra!*
- Zero, Grupo, derhêner. 1977. *A Lei da Terra*. Alberto Seixas Santos, Grupo Zero.


JÊDERKÊN VESER

- Bonney, Sean. *Mirina Me*. Oakland: Commune Editions, 2019.
- Boudry, Pauline & Renate Lorenz. *Bizava Berepaş*. Cenevre: Skira, 2019.
- Brenez, Nicole & Isabelle Marinone. *Cinemas libertaires: Au service des forces de transgression et de révolte*. Villeneuve d'Ascq: Presses Universitaires du Septentrion, 2015.
- Debuysere, Stoffel. *Şiklên Nehevbirîyê: Sînemaya Polîtîkayê/Polîtîkaya Sînemayê*. Gent: Mer. Paper Kunsthalle, 2016.
- Llansol, Maria Gabriela. *Sêtayîya 'Erdnîgara Serhildêran*. Dallas: Deep Vellum, 2018.
- Minh-Ha, Trinh T. & Jean-Paul Bourdier. "L'Autre marche/Meşa Dîtir." Di Trinh T. Minh-Ha, *D-Passage: Şeweyê Dicîtil* de. Durham: Weşanxaneyê Zankoya Dukeê, 2013. Doi: 10.1215/9780822377320-007.
- Smithson, Robert & Nancy Holt. (1979). *Nivîsarên Robert Smithson: Bendên Bi Îllustrasyon*. New York: Weşanxaneyê Zankoya New Yorkê, 1979.
- Tsing, Anna. *Kufkarîka Li Dawîya Cîhanê: Li Ser Gengazîya Jiyanê Di Nava Kavîlên Kapîtalîst De*. Princeton: Weşanxaneyê Zankoya Princetonê, 2015.


GENERİK

Luz, Clarão, Fulgor: Augúrios para um Enquadramento Não Hierárquico e Venturoso [Ronahî, Pêt, Fulgor - 'Elametên Ji Bo Şewandin û Geşedana Nehayîrarkîyî], xebata Sílvia das Fadasê. Filîma proceksiyona dumend a 16mm, devîdeyê 85 xulekan, rengin û r/s, deng û xwendina zindî, berdewam ji 2017an ve. Li Alentejoya Portûgalê hat kişandin. Kompozîsyonên dangan: Pâ (Beş I), João Farelo (Beş II). Pergalên dengî ji aliyê Nora Sweeneyê, Robert Blatt û Sílvia das Fadasê ve. Rûpoşekan: Joaquim Cerdeira. Ronahî, Pêt, Fulgor: 'Elametên Ji Bo Şewandin û Geşedana Nehayîrarkîyî bi piştevanîya darayî ya bûrsa doktorayê ya Fundação para a Ciência e a Tecnologia (FCT), Portûgalê, her wiha bi fona ji FWF PEEK: "Bê/Milkîrin: Estetîka Pişt-Beşdar û Pedagoçiyên Xakê" û Akademie Schloss Solitudeê hat berhemhênan. Firehkirinên çarçoveyan û wêneyên filîmî yên di vê beşê de hemû: bexşa weberhemhênanî ya hunermend Sílvia das Fadasê ne.

Hestkirina bi hêdîbûna dilkutkê
 Dem bo nînegîyê, nînegî bo demê
 Ketina nava avekê
 Bê hay ji her tiştî ji bilî sermedîyê



LI DOR Û BERÊ ÇEMEKÎ



Rojda Tuğrul

Çemên Dicle û Ferêt,
 Mezopotamyaya Jorîn


Zanyarî bihê rêşkirin jî, şopa pîvekan hemûyan dimîne; jê re xebat divê ji bo ku mirov girîftiyên sawêrî bike eşkere. Deriyê rabirdûyê girtî nîne (çu caran jî ne girtî bû), lê rêşbûn (a şopan hemûyan) ne babeta li ber gotûbêjê ye. Rabirdû ne niha ye. “Rabirdû” û “dahatû” di rêya nav-çalakîya berdewam a cîhanê re bi dubareyî têne vesazkirin û li hev têne pêçan. Çu peywendîya bi xilqetî misoger nîne di navbera rabirdûyê û dahatûyê de. Fênomen ne hêwirî ne li nînegîyê û demê; ber’eks, fênomen girîftiyên madî ne ku di rêya xwedangiringîkirina-nînegîyê-demê ya gerdûnê re li hev hatine pêçan û benên wan hatine bizdandin. “Ve-ger” a moçikeke daherizana tîrêjan jî amajeyê bi zivirînekê, rêşbûneke bîrê, nûjenkirineke rabirdûyeke niha nake. Bîr – moçika tewq û pêçên durrdî ya nav-çalakîya dubareyî – bi nava raçînka cîhanê de tê nivîsîn. Cîhan bîra şopan hemûyan “ji xwe re qorî dike”; yan jî ber’eks, cîhan bîra wê (madîkirina tewqandî û li hev pêçayî) ye.

— Karen Barad, “Nature’s Queer Performativity” (“Kiryarbarîya Kûyir a Siruştê”)

Min hewil dida ku ez ji Dicle ta bi Kendava Besrayê rêgehekê peyda bikim. Min avjenî dikir û rêya xwe her winda dikir. Ez pê qaneh bûbûm derbendeke nepenî heye, lewma ez berdewam kişiyame nava çivanek û xelîcên biçûk, li pey peydakirina rêyeke ji Mezopotamyayê ta bi Kendavê.

Di nava dorbendên şer de, ‘erdnîgarî dikare wekî hedefekê bihê dîtin ku bihê rûxandin yan jî wê bixine rewşeke ku kes neşê tê de bijî, ku di wê hengê de bi hevkatî di nava xwe de wekî çekekê, her wekî sazgerîneke hêzê bişuxule ku gefan li hevvelatîyên di siruştê de dîyar de bixwe û wan kontrol bike. Ji serê 1990î û vir ve, ango, ji hinga ku şerê li Başûrê Rojhilatê Tirkîyeyê li jêr birêvebirina herêmî ya cîyê zordestiyê berê xwe guherandiyê û ji gundewaran hatiye bajar, çu caran ji rêça bermayîya xwe vangêr nebûye. Ji ber ku şer bi şêweyekî fizikî kartêkê li jîngehê dike, mêtû dikare rola rêberê bigêrre ku em li guheran û kartêka li ser hawira siruştî hûr bibin.

Sala 2008an, hukimeta Tirk gelek “Projeyên Bendavên Asayîşê” ragihandin. Bendav dê li ser tixûbê Tirkîyeyê-Îraqê, her wiha di çend gelfiyên li herêma navendî ya Bakurê Kurdistanê de bêne avakirin.¹ Ev desttêwerdan duyem berfirehtirîn desttêwerdana li devera gundewar a Başûrê Rojhilatê Tirkîyeyê ye piştî salên 1990î, dema ku wekî beşeke helmeteke serkutkirina raperînê ya hukimete gund bi zoremilî hatin valakirin bi mebesta ku Partiya Karkerên Kurdistanê [ji vir û pê ve PKK] ji piştewaniya locistîkî bê par bihêlin. Vê yekê bi bicîhiştina sê hezar gundan û bi warşihitîbûna devîdevî sê milyon kesan encam da. Tê çaverêkirin ku avabûna van bendavan rêkên têtetînê yê şervanên PKKyê berband bike, rêyê li tevgerên wan bigire û teng bike û piştewaniya locistîkî ya ji gelê deverê qut bike.



¹ Zeynep S. Akinci & Pelin Tan, “Bendên Avê Wekî Bêmilkkirinê: Êkolocî, Asayîş, Kolonîzasyon,” di nava *Keş û Hewa: Avahîsazî û Xeyaliya Gerestêrkî* de, ed. J. Graham (New York: Kitêbên Columbiayê Li Ser Avahîsaziyê û Bajêr; Zurîx: Weşanên Lars Muller, 2016), 142–49.


Jêderka konseptê “Projeya Bendavên Asayîşê” “Projeya Başûrê Rojhilatê Anatolîyayê” [Güneydoğu Anadolu Projesi, ji vir û pê ve GAP] e. Danana GAPê vedigere bo salên 1930yî, lê jêderka projeya îro bi vî şeweyî vesaz kirî ji destpêşxerîyên taze yên di 1970yan tê ku bi xwe re daxwazeke xurttir anîn wekî ji Çemên Dicle û Ferêt, li ser çapaneke berfireh, ji avdanê û ji berhemhênana enerjîya haydrolik sûdê werbigirin. Weku zanyara ‘erdnîgarê Zeynep S. Akinci derpêş kiriye, Ji 1920an û vir ve, armanca rêbazên akincîkirinê yên sistematîk her ew bûye ku heyîna mêjûyî ya gelheya Kurd kokbîr bikin û bîra wan a keltorî ji navê beherin. Armanca van rêbazên akincîkirinê ew jî bû ku

gelheya Kurd berev rojhilatê Çemê Ferêt kêmbikin. Gelek Kurd mişextî rojavayê Ferêt kirin, pê re jî Tirk li rojhilatê Ferêt bi cî kirin da ku li rojhilat gelheya Tirkan zêde bikin. Pîlanê pêşniyar kir ku di heyameke deh salan de pênc sed hezar kes ji rojava bînin û li rojhilat akincî bikin.²



Devera GAPê bajarên ku li gewn û kûranên Ferêt û Dicle yên li Mezopotamyaya Jorîn ava ne bi xwe ve digire. Bi vî projeyê re, tê bawerkirin ku bîst û du bendavên nû û nozdeh sentralên elektrîkê dê çêbin.

Ji ber ku Dicle û Ferat di Sûrîyê û Îraqê re dikişîne başûr, encamên şaxşaxî yên GAPê tixûbên Tirkîyeyê dibezînin, bendavkirina wan li akamê de dê wan welatan ji binî ve bê par bihêle ku ew nikaribin bigihîjine avê. Girjî û dubendîyên li ser vî kontrola birha avê GAP bi derengîyê xist; bi domana demê re, projeyê nema karî ser bigire. Di gel vî hindê, têkoşana li gel PKKyê kire ser berjewendîyên dewleta Tirk û pêdivîya çareserkirina dubendîya li ser GAPê ya bi welatên dirawse re feramoş kir. Hukimetê gav ranan ku “Projeya Bendavên



Asayîşê” li nava deverên ku Kurd lê nişîn in wekî straticîyeke şerî bisepîne. Bi pêş vî yekê ve, PKKyê bi berdewamî gef xwar ku êrîşan behere ser bendavan, ku li dû vî jî bo her projeyekê jî baregeheke serbazî û birceke zêrevanîyê bû pêdivî. Ew niha wekî bendavên serbazî têne zanîn û bûne beşeke qada şer. Di 2012an de, ji ber lêkdadanan pêkanîna projeyê bo demekê hat rawestandî.

“Projeya Bendavên Asayîşê” li nava deverên ku Kurd lê nişîn in wekî straticîyeke şerî bisepîne. Bi pêş vî yekê ve, PKKyê bi berdewamî gef xwar ku êrîşan behere ser bendavan, ku li dû vî jî bo her projeyekê jî baregeheke serbazî û birceke zêrevanîyê bû pêdivî. Ew niha wekî bendavên serbazî têne zanîn û bûne beşeke qada şer. Di 2012an de, ji ber lêkdadanan pêkanîna projeyê hat rawestandî.

Ya ku, bi taybetî, min eleqedar dike ew e çî ka çawa desttêwerdanên polîtîk hem êkolojî hem jî civaka li herêmê pênase dikineve – û carinan wan dirûxînin jî. Hema hema çu herêm li Tirkîyeyê, li Îraqê yan jî li Sûrîyê nîne ku tûşî kartêkên vî yekê nehatibin. Ajel, balinde û curecure riwek di encamê de ji navê radibin. Şûnwarên mêjûyî tûşî zîyanê dibin û dirûxin, û dawîyê jî zanyarîya mêjûyî berze dibe. Noqandina bajarê kevnar ê Belqîsê yê li ‘Entabê û rûxana Heskîfê (şûnwarekî 12,000 salî li tejaneya Dîclê) ya ku li ber rojan e nemaze nimûneyên dilperitên in. Gelek gundên kevnar ji niha ve di binê avê de berze bûn piştî ku bendavan ew di binê avê de hêlan.

Di 2008an de, li qeraxa başûr a Çemê Dicle, li devera Amedê ‘erdkolaneke arkeolojîk a giring a gundekî bi rê ve çû. Ji warê gorrîstanê razbar bermayîyên hestîyên du mirovan derketin: jineke temenê xwe di navbera çil û pênc û pêncî û pênc salî de û zarokêkî temenê xwe di navbera şeş û heft salî de, her du jî di tîrbekê de veşartî bûn. Tê bawerkirin ku qerqode vedigerin bo bêtirî berîya 2500 salan. Ji bilî bermayîyên hestîyên

² Behsa polîtîkaya bişavtinê di gotara (r. 143): “Di 1924an de bi damezirana Şark Islahat Planîyê yan jî Pîlana Nûsazîyê ya Şerqê, bişavtinê yan jî Tirkandîna Kurdan zeminê qanûnî peyda kir. Rêbazên bişavtinê pê sê amrazên serekî hatin sepandin: akincîkirin, perwerde û rêbazên “Tirkîkirin” a herêmê bi şeweyekî keltorî” Ji bo tevayîya refiransê li nişeya 1ê binihêrin.

wan mirovan, di gorrê de bîst û yek kosîyên avî jî hebûn, hevdeh ji van kosîyên avî yên qaliknêrm ên Mezopotamyayê bûn. Ev kosî, yê ku wekî Kosîyê qaliknêrm ê Ferêt jî tê zanîn, celebekî endemîk ku li tanga perên Çemên Dicle û Ferêt û li seranserê Kendava Besrayê dijî. Vekolanê derpêş kir ku mirovan ew kosîyên avî – yên ku bermayîyên hestîyan dorpêç kiribûn –



şerjêkiribûn û paşê kiribûne qurban ji bo ku hêzên bêqidoş dûr bigirin û ruhên van her du termên bê can û cesed hildin û beherine cîhana cawîdan.³ Digel ku tê bawerkirin şûnwar şûnwarekî girik ê fireh-heyamî ye, ji ber projeya bendavê ya li ber rojan e, 'erdkolan dest pê bûn da ku kerseyên arkeolocîk bîn vekolandin ku dê di nava demeke kurt de jêrav bibin.

Kosîyê avî yê qaliknêrm ê Mezopotamyayê cureyek e ku ji ber projeyên bendavan ên li herêmê avjara wî li ber qelanê ye. Îro, kosîyên avî hê jî li ser pêyê Çemê Dicle peyda dibin, di gel vê hindê, ji ber kartêkên rûxîner ên bendavan li ser hawirên



wan ên siruştî, metirsîyeke rastîn heye ku wekî cureyekî ajelan ew ê bivê nevê rehbirr bibin. Bi şeweyekî berçav, ku ev berzeyî biqewime, ew ê xwe di berzeyîya zanyarîyê re bide der. Bi ajelên û riwekên curecur re, rabirdûyên mîtolocîk û antropolocîk dê bivê nevê di binê avê de bêne hiştin.

Govanîya li peywendîya nêzik a di navbera pêkhateyeke bayolocîk û şiklekî mîtolocîk de dibe sedema ku em ji nû ve di peywendîyîtiya fênomenên cîyawaz ên di vê 'erdnîgarê de hizra xwe bikin, bi gotineke mayîn, em bi hûrgilî berê xwe bidine peywendîya sîmbîyotîk a di navbera wan pêkhateyan de ku li darî çavan ji binî ve cihêreng in: hevpîgarîya çemekî û mêşekê yan jî pevgirêdana di navbera çîyayekî û jehekî deng ê mirovan de. Projeya min bi hûrgilî bala xwe da girîftîya hêmanên curecur ên di hawireke siruştî de, ya ku li dû şerekî çekdar ê demdirêj de di qonaxa jihevketinê de ye.

Rûxana 'erdnîgarî vebeyaneke xusareta keltorî û mêmîyî ye. Şûnbirînên fizîkî yên li ser bergeha siruştî jî hatine kolan li hundirê derûna kolektîv a civakê. 'Erdê rêşkirî û şihitandî amajeyeke têkoşana polîtîk a Kurdan e, her wiha amajeyeke koçberîyê û cîguhêstinê ye. Pê re jî mijara wan kesan heye, yên






³ Rémi, Berthon, Yılmaz Erdal, Mashkour S, Mashkour û Gülriş Kozbe, "Bi Kosîyên Avî Re Spartî Xakê: Rola Sîmbolîk a Kosîyê Avî yê qaliknêrm ê Ferêt (Rafetus Euphraticus) Li Mezopotamyayê," *Antiquity* 90, no. 349 (2016): 111–25; doi: 10.15184/aqy.2015.196.


Rojda Tuğrul, Bi Kosîyê Avî re Spartî Xakê; Bi Kosîyê Avî re Spartî Xakê (her du jî di rûpela çepê de) & Kosîyê Avî û Keftar; Kosîyê Avî û Zevîya Bimorî, (her du jî di rûpela rastê de; hemû jî ji sala 2019an)

ku di vê bergeha siruştî ya têkdayî de wek xilteyekê dimînin, – a rast, ew kes zorîne ne: ew ên ku di nava vê qewamê de dijîn û barê berdeyam ê govanîya li jîngeheke heta bi hetayê guherandî hildigirin.

Di vekolana xwe de, ez bi yekxistina mîdyayê taqîyê dikim. Armanca rênîşa min a nîgaran ew e ku wêneyên peywendîyîyên û demkîyîyên cîyawaz ên mekanî bigire. Henga ku xwîner bi dîtbarîyî çav didêre van peywendîyîyên cîyawaz, Kosîyê Avî yê qaliknêrm ê Mezopotamyayê yê sava – yê bi cî kirî li naverasta rûpelên kajovajî – bi kêlîyêke çelqînîya avê re, bo deh çirkeyan, bi qilopanî, dilive. Wêneyên bêliv ên vê anîmasyonê bi sedan rûpelan bi xwe ve digirin; wêne li pey wê awatê diçin ku dorbandên demê fireh bikin henga ku temenê cureyekî ajelan ê li ber nemanê têgehî dikin. Kitêb




↑ Rojda Tuğrul, Kosîyê Avî û Belem; Kosîyê Avî û Hayrogliff; Kosîyê Avî û Zevîya Bimorî; û Kosîyê Avî û Quling, hemû ji ji sala 2019an



hem binemayên noqbûyî hem jî yê têkelbûyî bi şeweyekî peywendîdarî projeyên bendavan ên Mezopotamyaya jorîn texeyyul dike. Qonaxeke dahûrandina dîtbarî ya zehf bihûrgilî ya Kosîyê Avî yê qaliknêrm wêneyê girîftîya polîtîk û civakî ya vî ‘erdê xweserî xwe digire, ‘erdê ku ji ber kartêkên şerekî berdeyam mêvanê nalîk û balîfkê ye.

Her wiha, wênekêşana kêlîyî qonaxeke dîtbarîkirina têgehî ya dîtir di vê vekolanê de dabîn dike. Di Gulana 2019an de, devera Heskîfê ji ber projeya bendavê ya Ilisuyê bi zoremilî hat valakirin. Bi tenê çend hefteyan berîya valakirina wê, ez li der û dorê gerîyam, min bi wênegireke kêlîyî wêne girtin û wêneyên şûnwêr (devîdevî 200 mêtro dayamêtro) kişandin. Di henga vê qonaxa meşê de, min wêneyên hindêk ji newalên kûr ên binê zemanan, birrek şikeftan, bermayîyên pira mêjûyî, kûçikekî kûçeyan û riwekên endemîk girtin. Wêne çendetexlîdîya cî dupat dikin, pê re jî herikana Dicle hema berîya ku çem *li ber çavan hat reşkirin*. Mebest ji vê dîtbarîkirinê ne bi tenê berîya bobelatê belgekirina cî bû, lê wisa jî, berevajî qonaxa noqandinê ya cî, tecrubekirina qonaxa qewimînê ya rewşê bû. Ew yek teşebbuseke bo beşdarbûna li rageşîya di navbera nebûnê û hebûnê, liberçavbûnê û betavebûnê de ye.

↑ Rojda Tuğrul, Kosîyê Avî û Kavil; Kosîyê Avî û Şervana Jin, her du ji ji sala 2019an





Nasnavên asayî têne mexderê û heqane têne hêvişandin, lê ew her tim dimînin wekî tevneke peywendîyî ya ku vedibe berev rabirdûyên, nihayên û dahatûyên ne-Oklîdî. Ya asayî danseke herrîyê ya firehpartnirî ye ku ji û bi texlîdên zindîyan ên alizî re dertê. Di her gihanekê de ew kosîyên avî ne; partnir di her tebeqeyêke tewqtewqî ya demê û mekanî de reftarên xwe yên damezirîner ji pêş de destnîşan nakin.

— Donna J. Haraway, *When Species Meet* (Dema Ku Texlîdên Zindîyan Nasîya Xwe Didine Hev)



Amraz

VEJANDINE - VE

Li herêmeke şer, desttêwerdanên sistematîk li ser bedenên veguheranên kartêker û şapatê tînine mexderê. Ji ber ku gelek qewamên giring bi hevkatî rû didin, gurrayîya wan desttêwerdanan dibe ku rê nede yekî ku bi yekcarî yan jî bi dest xwe re tê bigihîje bê ka çi diqewime. Tundûtûjîya li ser û li seranserê xakê li deverên Kurdistan aloziya mezin û giran a şer dereve dike. Ev roniyê dixê ser ku dubendiyê bi xwe kartêkên xwe yê firehtir û dûrtir û dereztir hene liser bedenên li darî çavan ji binî ve cihêreng ên di warekî pênasekirî de. Piştî desttêwerdaneke 'erdîn, her wekî avakirina bendavan, diqewime texlîdên zindîyan rehbirr bibin, ku diqewime bi dorê nalebar be li gel hindêk tomarên devkî, pê re jî, di nimûneyên celebîn de, bibe sedema berzebûna keltora mîtolocîk. Famkirina ji van peywendiyîtiyan perspektîveke firehgerdûnî divê ji bo ku mirov ji wêneyê mezintir serwest bibê.

Vejandine-ve desttêwerdanek e di mekanî û demê de, armanca wê ew e ku di peywenda jihevketina bergeha siruştî de qonaxan diyar bike. Bi rêya kar û xebata dabeşkirina ser tebeqeyan yan jî kozkirinê, vejandine-ve nêzikayîtedanek e ku di nava peywenda şer de li rewşa "tiştan" hûr dibe. Ev nêzikayîtedan encamê bi xwe re tîne ku mirov cî seqamgîr bike û di demê de rêwîtiyê bike; yan jî yekser berevajî wê yekê, mirov demê seqamgîr bike û di cî de rêwîtiyê bike. Azîneya vejandine-veyê derpêş dike ku mirov tevî fênomenên û hêzên dîtir rêça giriftiyên mekanî û demî bigerîne. We wiha kir û pê ve, bi nigarkirina guheranên li ser bedenên

wan û jîngehên wan, di nava kêliya bobelatekê de vejandine-ve roniyê dide ser pêsirtengîya yan jî rewşa "tiştan" jî.

Vejandine-ve ne qonaxê belgekirina demê yan jî cî ye; ew nêzikayîtedanek bibandor e ku demê dirêj dike û cî bi xwe dike firehcureyî. Ew demê dirêj dike, senidanekê pêk tîne û ji bo ezmûneke peypêbirina guhertî navbirriyekê û delîvekê bi deynî dide. Ev guhertin ji bo mirovan zehf giring e ji ber ku em kêman caran bi tîra xwe bêhnfireh in ku pey beherin bi tiştên ku çavên me dikarin bibînin; yan jî heke em bi tîra xwe bêhnfireh bin jî, carinan tişt ji şiyana me ya hestpêkirinê û bi wê de ne.

Vejandine-ve sepanekê dahûrandinê ye jî. Ew hêmayên tiştan dixetîne da ku peypêbirina mirovî ya der barê cî û demê de zêde bike. Ev têgehîkirin kiriyarek e ku dikare cîyê bedenê ji cîyê terxankirî biguhêze yan jî îstîqameta cî diguherîne. Di vê rewşê de kosiyekî avî ne bi tenê nişanekeke pêkhatiya bayolocîk e ku di çemê de dijî, lê şiklekî mîtolocîk e jî ku remza sermeditîyê û birê ye. Bi rêya nimanên dîtbar, vejandine-ve sehne û sekansên nû dixetîne û pêşniyarê tîne bo rêyên ku mirov bi şeweyekî cîyawaz hizra xwe di demê û mekanî de bike.

Vejandine-ve rêwingîyek e di navbera rabirdûyê û nihayê de, ya ku rê dide yekî ku pê rêwîtkirina berev paş û pêş rêça peywendiyîtiyên û demkîtiyên tiştan bigerîne. Wekî nimûneyeke berçav, kavilên ku pêşandana demê şênber dikin çêdibe ji layê mesxê ve dabeşî ser tebeqeyan bêne kirin. Ev qonaxa

Amraz

gerandina rêçên mesxan ne-lîniyirî û aloziya demê û cî tîne mexderê.

Nîgar, wêne, deq, her wiha tomarên devkî, tomarên vîdyoyî û odiyo – û her keresekekî ji kereseyan arxîvî – dikarin tevkarîyê li qonaxa vejandine-veyê bikin.

Di peywenda şer de, vejandine-ve qonaxek e ku ji hev vedibe ku rewşên yan jî hêmayên çêkirî û sazkirî jî berband dibe. Ji ber cureyên cîyawaz ên vetixûbkinên ku li herêmeke şer tene ferzkirin, her nîmaneke dîtbar bi daynamîka hêza xwe bi xwe tê, çî nigareke ketûber be, çî wêneyekî pîksîla xwe xerab be, çî jî kêşaneke vîdyoyî ya kêmqalîte be.(1) Kar û xebata vejandine-veyê - di vê rewşê de, nîman binbarîya kesa/ê hunermend e - cîgehekî peyda dike ku serederî bi van dîmenên karpêkirî û wêneyên sazkirî re bihê kirin. Lewma, vejandine-ve serincê dikêşe ser encamên civakî û polîtîk ên şerê li cîyekî êşkere û di demeke dîyar de.

Amrazên ku vedijînine-ve bi çalakîyên “Cîyê Ku Vedijîne-Ve” û “Dema Ku Veidijîne-Ve” tîne şewandin. Armanca vejandine-veya cî û vejandine-veya demê ew e ku qonaxeke bixetîne wekî takekesan bi xaka wan ve girê bideve. Lewma, çalakî tene sêwirandin ku hem bi takekesî, hem jî di nava komê de bîne tecrubekirin. Tê çaverêkirin ku beşdar bi şeweyekî yekser yan jî neyekser peywendîyê li gel vê xaka dîyar daynin. Amraz deng li mirovên bêmilkkirî dike, mirovên xwedanên ezmûna bêmilkkirinê û mirovên ku bîrhatîyên bav û kalên bêmilkkirî bi wan re hene.

(1) Hito Steyerl, “Berevanî Ji Dîmena Xerab,” *e-flux journal* 10 (2009); onlayn li ser: e-flux.com/journal/10/61362/in-defense-of-the-poor-image.

“Mêjû” hem kirdareke çîrokbêjîyê ye, hem jî ew rêza jêmayîyên ji rabirdûyê ku em vediguherînine çîrokan. Bi kevneşopî, mêjûzan berê xwe bi tenê didine jêmayîyên mirovî, her wekî arxîvan û rojnivîskan, lê çu sedem nîne ku em bala xwe belavî ser şiverê û şopên dermîrovan nekin, ji ber ku ev tevkarîyê li bergehên me yê siruştî yê hevbeş dîkin. Şiverê û şopên bi vî rengî di qewama çaverênekirî û qeyranê de, yê ku pêkhatyên dema “mêjûyî” ne, deng li girîftîyên texlîdên zindîyan ên çeperast dîkin. Ji bo ku beşdarî girîftîya bi vî rengî bibe, ne pêwîst e yek mêjûyê bi tenê bi yek şeweyî binivîse. Zîndewerên dîtir “çîrokan bibêjin jî, nebêjin jî,” ew tevkarîyê li şiverêyên û şopên sertêkdeçûyî dîkin, ên ku em wekî mêjû fam dîkin. Mêjû, nexwe, çî mirovî çî jî ne mirovî, tomara gelek rêgeh û seyregêhên duristkirina cîhanekê ye.

— Anna Tsing, *The Mushroom at the End of the World* (Kufkarîka Li Dawîya Cîhanê)

CÎYÊ VEJANDINE - VEYÊ

Ji vê çalakîyê re divê ku beşdar gotûbêjê bikin li ser şûnwarekî ku nimûneyeke bobelatekê dinimîne: çemek, newalek, kûçeyek, gundek yan jî çiyayek û ta dawîyê. Ji bo qonaxa dîtbarîkirinê ya tiştan pêdivîya beşdaran dê bi kerese-yên cîyawaz hebe (qelemên hibrî, qelemên zirêçî, defter, caw, kamîra, kompîterên tablêt, tomarkerên dangan û ta dawîyê). Dê giring be ku beşdar hay ji demsalan û mercên li derve hebin û, girêdayî dema ku ew dest bi karê xwe bikin, dibe ku pêdivîya beşdaran bi kincên guncan hebe. Berîya ku dest bi çalakîyê bikin, beşdar dikarin çav bi jêderkên veser bixin ku li jêrê hatine lîstekirin (binihêrin li r. 95).

GIHIŞTIN

- . Biçîne şûnwêr (heke gengaz be, bi peyatî yan jî bi duçerxeyê).
- . Piçek dem terxan bikin ku hûn çav bidêrine bergeha siruştî.
- . Bala xwe li hestên xwe bicivînin û paşê ji bo meşa xwe xaleke destpêkê peyda bikin.

MEŞ

- . Bi armanca ku hûn girêdanekê bi xakê ve biperisînin, dest pê bikin bimeşin.
- . Xwe ji nişaneyên muhtemel re vekin, ên ku çêdibe hûn ji vî şûnwarî bi wan bihesin. Hay jê hebin çêdibe xak çî bibêje we û çawa hûn bikaribin jê serwest bibin.
- . Bala xwe bidine kavlên û bermayîyên li ser wî şûnwarî. Pürteke balindeyan, xaniyekî mişemir, pirtikek hestî, gorristanek, kavilek, kevlekî maran yan jî kiloxekî pêz, hwd. Van bermayîyan raçav bikin.
- . Di sêwirandina tiştên li derveyê qada bînayîya xwe de dudilîyê nekin (ev rêwingîyek e ji heyîtîyê berev neyîtîyê).

NÎGARKIRIN & WÊNEKÊŞAN

Ji vê xûlê re çu behre yan jî nêzîkayîtêdaneke estetîk a diyarkirî navê. Armanca berhemana demê ye da ku di hawira wê ya siruştî de hûn di peywendîyên cîyawaz ên diyardeyekê bihizirineve. Di dema nîgarkirina babetê de heke hûn tûşî vetixûbîkirinekê hatin, li kişandina wêneyê wê bifikirin.

- . Moletê bidine xwe da ku hûn çav bidêrine tiştên ku di henga meşa xwe de li vî şûnwarî hûn rastî wan tên.
- . Dest bi nîgarkirina van tiştan bikin (hûn dikarin li ser wan tiştan binivîsin jî, ên ku di henga vê xûla nîgarkirinê de hûn çav didêrinê).
- . Her çî nebît babetekê nîgar bikin ku bi qinyata peywendîdarî ya heyî ye (heke hûn jî nîgarkirina babetên neyî bê zar hest bikin, di dewse de hêmayan yan jî derbirranên devkî bi kar bînin).
- . Rêka meşa xwe û peywendîya wê ya li gel van tiştên hûn li wan rast hatî bihesibînin.
- . Meşa xwe û guherana binemayan peywendîdarî mekanî pesend bikin.

GUHDARÎKIRIN & BIZARÎKIRIN

- . Li jîngehê guhdariyê bikin û dengên ku hûn dibihîzin dahûrînin.
- . Bi zarî wan dangan bikin ku dihêlin hûn di nava vê xakê de bestlêrabûyî hest bikin. Heke hûn bi têra xwe han dayî hest bikin, hewil bidin ku hûn bi yek ji binemayan re bipeyivin.
- . Dangan tomar bikin, heke hûn bikaribin.

VEGER

- . Piştî çalakîyên xwe yên meşê, nîgarkirinê & wênekêşanê û guhdarîkirinê & bîzarîkirinê, bizivirine xala xwe ya destpêkê.,
- . Hêmayên, tomarên dangan û peyvên we zeft kirî li hev bicivînin.
- . Giriftiyên û çîrokên di nava van tiştan de bixwînin.
- . Sirûşên, gumanxeyirînen û peroşên xwe bi komê re parî hev bikin.

DEMA VEJANDINE - VEYÊ

Ev çalakî lê dixebite ku peywendîyeke ontolocîk berhembîne li gel çalakiya berê (“Cîyê Vejandine-Veyê”). Armanca sereke famkirina dema yên dîtir e, sozariya li gel wê yan jî tecrubekirina wê ye. Ji beşdarên tê xwestin ku ji rahênana “Cîyê Vejandine-veyê” yek ji binemayên der-mirovî bijibêrin û hildin û bala xwe li wê bicivînin. Ew tiştê e ku rabirdûyê û bihurîna demê tîne bîra me. Ji bo vê, ji beşdarên tê çaverêkirin ku ji bo xwe nêvengê dabîn bikin ku rêwîngîya vê binemayê binimîn di demê, nîgarkirinê, wêneyê bizavdar, wêneyê çapkîrî, hwd de. Amrazên xwe amade bikin!

RABIRDÛ

- . Çerxa temenê wî tiştî gotûbêj bikin. Çawa ew tê cîhanê? Rêçên guherana vî tiştî, mesxa wî ya di henga jîyana wî de bigerînin. Mirina wî li ber çav bigirin. Qonaxêke mirinê ya bi çî şeweyî (siruştî/ sedema dereke) di temenê wî de diqewime?
- . Rêçên wî yên rêkên perisanî yên di êkolociyê de bigerînin da ku hûn xetên dorhêlî yên temenê wî pêk bînin. Qonaxa veguherîner a vî tiştî bisêwirînin û gotûbêj bikin, nemaze ya di çend dehsalên dawîn de.
- . Li nimanên wî yên mîtolocîk û metaforên wî yên keltorî yên dîtir bigerin.

NIHA

- . Cîyê vî tiştî yê di îroya wî ya jîngehî de venasin.
- . Gelo di sazgerîna xwe de ew çî rolê digêrre û texlîdên zindîyan ên bi çî cureyî peywendîdarî wî ne yan jî ji ber wî li ber nemanê ne?
- . Gelo çu sîmbola yan jî metafora mîtolocîk heye, ya ku îro bi zimanê we qala wî tiştî dike?

DAHATÛ

- . Paragrafêke binivîsin û pênase bikin çawa hûn jîyana vî tiştî ya di dahatûyê de disêwirînin. Gelo di dahatûyê de dibe çî wî biqewime?
- . Nêzikayîya xwe ya li nêvengê helsengînin û rave bikin çawa hûn dixwazin vê qonaxa demê dîtbar bikin/binimîn (bi şeweyekî devkî, bi deqnivîsînê, nîgarkirinê, wênekêşanê, animasyon yan jî vîdyoyê, hwd.).
- . Qonaxa veguherîner a vî tiştî ya di çend dehsalên dawîn de bisêwirînin/gotûbêj bikin.

JÊDERKÊN VESER

- Barad, Karen. “Kiryarbarîya Kûyir a Siruştê.” *Kvinder, Køn og forskning*, no. 1-2 (2012), 25-53. Doi: 10.7146/kkf.v0i1-2.28067.
- Haraway, Donna J. *Dema Ku Texlîdên Zindîyan Nasîya Xwe Didine Hev*. Minneapolis: Weşanxaneya Zankoya Minnesotayê, 2008.
- Tsing, Anna. *Kufkarîka Li Dawîya Cîhanê: Li Ser Gengazîya Jîyanê Di Nava Kavlên Kapîtalîst De*. Princeton: Weşanxaneya Zankoya Princetonê, 2015.

BERHEMÊN HUNERÎ

- Avahîsaziya “Edlî. 2019. *Kuştina Tahir Elçi*. Vîdyoya HD, 26’18”. Onlayn li ser: forensic-architecture.org/investigation/the-killing-of-tahir-elci.
- Idris Khan, hunermend, 2012. *Parlemenekan, London*. Çapa celatîn a zîv.
- Rabih Mroué, hunermend, 2012. Cotederb. Înstîleyşin, 72 çarçoveyên vîdyoyî.

CENERÎK

Kosîyê Avî yê Mezopotamyayê, xebata Rojda Tuğrulê. Animasyon/nîgarekan hibr li ser kaxizê (234 laper), 148 x 210 mm, 2019., Agehdarbûna Ji Paşwextiyê, xebata Rojda Tuğrulê. Wêneyên bêliv ên kêliyî (40 parçe), 85.6 x 53.98 mm, 2019. Berhemhênayî li Heskîfê, Tirkîyeyê. Her du rêzexebat jî bi piştevaniya darayî ya FWF PEEK: “Bê/Milkîrin: Estetîka Pişt-Beşdar û Pedagogîyên Xakê” hatin berhembênan. Wêneyên di vê beşê de hemû: berhembênaneyê bexşa hunermend Rojda Tuğrulê ne.

DESPÎNA



İpek Hamzaoğlu

Sinop, Tırkiye

Di xewnên min de ew ciwan bû
 Çavî her heman çavên reş î xedir lê bûyî
 Wê bi destê min girt ku em birevine
 Wî girê ku li serê em li benda rojê man

Ji hinga min cara dawîn ew dîtî, demeke zehf dirêj derbas bûye. Ji rojên pêşîn ên xiringêleyê û vir ve, ew zêde nehate xuyanê di xewnên min de, bi tenê wekî şiklekî ku temaşe dikir li min û li tiştên ku li dora min diqewimin. Lê duh ew dîsa hate xewnên min. Wê gote min ku ez biçime bendixaneyê. Wê got ku berîya gelek salan zilamekî ku di wir de hatibû ragirtin der barê wê de çîrokek nivîstîye, ew kiriye şiklê çîrokê, ew kiriye nemir. Di rêya vê nemirîyê re bû ku wê karî xwe bigihîne min. Ew jineke bejnîbilind, bedew û porê xwe dirêj î qehweyî-sor bû. We gote min navê min û wê yek e, Despîna ye. Wê bi destê min girt, ez anîme bendixaneyê, jûr nîşanî min dan ku wextekê ji bo şikenceyê hatine bikaranîn. Ev ew der e ku pêwîst bû me xwe tê de veşarta... her çi nebît bo demekê.



Sînop bajarê li serê bakur ê Tirkîyeyê, li nîveka perava Deryaya Reş e. Li navenda bajêr şêst hezar kes akincî ne. Havînê dema ku xelq ji bajarên dîtir vedigerin û têne serdana malbatên xwe, jimar bi pênc carî zêde dibe. Sînop li gorî îdiayan bextewartirîn bajarê Tirkîyeyê ye, her çi nebît li gorî Enstîtuya Statîstîka Neteweyî, di salên 2014an, 2016an, 2017an, 2018an û 2020an de. Bajar, bê guman, wekî cîyekî wisa bextewar tê nasandin, di gel vê hindê xelqê Sînopê gote min ku xeber û haya ti kesî çu nîne ji rapirsîyê. Sînopê bergeheke xwe ya siruştî ya bedew heye – tev kesk û şîn e – ku kêşeyêke gilêşê ya giran gefan lê dixwe. Yek jî jêderkên wê yên aborîyî yên serekî hê jî li ser masîgirîyê ye.

↑ Wêneyê vidyoyî, *Despîna*, xebata İpek Hamzaoglu, 2021

→ Mûzexaneya Bendixaneya Keleha Sînopê; wêneyê ji aliyê İpek Hamzaoglu ve, 2019

Ji 1950yan û vir ve ye hukimet dixwaze sentraleke nûkleyir li vir ava bike. Di 2013an de, ji bo avakirina wê di navbera hukimetên Tirk û Capon de rêkeftinek hat îmzekirin. Di gel vê hindê, navê Sînop bajarek e ku qewî agehdar e ji êkolocîyê û ji xakê, li kê derê jinên û mêrên ji her temenî li dijî projeyên sentralên hidroelektrîk, termal û nûkleyir ên hem arizî hem jî bi destî dewletê li ber xwe didin. Sînop bajarekî dêrîn e û di tevayîya dîroka xwe de gelek mît û efsaneyên xwe hene; xelqê wê bi van gerdîşan şanazîyê dike û wan bi kêfxweşî belav dike. Di heman katê de jî, Sînop bajarekî xwedana mêtûyêke tundûtûj e li hemberî Yewnanan û Ermenîyan ku çîrokên wan gelek caran bi darê zorê tèn bédengkirin û jibîrkirin.

Peywendîdarî yeka ku bajêr navê xwe ji kê girtiye, çîrokên curecur kêl bi kêl neqîşîne li tomarên mîtolocîk. Yek ji berbelavtirîn efsaneyan derpêş dike ku bajar ji aliyê Amazonan ve hatiye damezirandin û navê xwe ji keybanûyêke şervan a bi navê Sînopeyê girtiye. Li gorî mîtolocîya Yewnanan, Asoposa Xwedawenda Çeman keçeke xwe heye ku perîyêke avê ye, navê xwe Sînope ye. Ji bo ku bajêr biparêzin, di sedsala heftem B. Î. de Yewnanan kelehek ava kir; gelek şaristanîyên cîyawaz, her wekî Persan, Keyaniya Pontûsê, Romayîyan, Bîzansê, Selçûqîyan û Mîrektîya Candar, li pey hev Sînop kirin mêtîngeh û bendera wê wekî baregeheke serbazî bi kar anîn, keleh fireh û temîr kirin. Di henga recîma Osmanî de, di 1887an de, bû ku hindek beşên kelehê veguherandine bendixaneyekê ji bo nivîskar, ramanwer û sîyasetmedarên mişext – “tawanên wan ên



ramanê” yên qaşo dikir ku divîya ew bibirana û goşegîr bikirana ji bajarên mezintir ên her wekî Stembolê û Enqereyê.

Bêtirî deh salan bihurî, peywendîya min a li gel Sînopê guherî: ji serdana li dapîra min û binemala min ta bi awayekî bi rêk û pêk serdana li bayenîyila hunerê ya xweserî deverê ya bi navê Sinopaleyê wekî xebatkareke hunerê û paşê wekî hunermendekê/vekolînerê ji bo vê projeyê. Yek ji qadên pêşangehê yên di salên pêşîn ên bayenîyilê de beşa xweserî ciwanan a bendixaneyê Sînopê bû ku di 1939an de lê hatiye zêdekirin; ew beş piştî 1999an wekî mûzexaneyê bendixaneyê bi kar hatiye. Tiştê pêşîn ku li Tirkîyeyê mirov vî bajarî pê re peywendîdar dikin bendixaneyê wî ya navxerab e ku dihat gotin wekî tê de mercên jîyanê wisa berbad bûne ku ji ber kamkêşiyê di wir de vexistina pîçkeyekê jî zehmet bûye. Nav û dengê xerab ê mercên çetin ên bendixaneyê ne bi tenê bi rêya birrek çîrokan hatiye belavkirin, lê wisa jî bi berbelavî û bi lez di rêya berhema Sabahattin Ali re – şa’ir û nivîskarekî navdar ê ku ji ber bîr û baweriyên xwe yên sîyasî di 1933yan de ji Stembolê hat mişextkirin û di wir de hat ragirtin – belav bû, di pey re bendixaneyê dirifa xwe li şî’ra wî ya bi nav û deng “Maphushane Türküsü”yê [Kilama Bendixaneyê] xist. Di 1970yan de, ev berhem li stranekê jî hat adebtekirin; straneke bi sernavê “Aldırma Gönül” [Dilo, Xeman Mexwe], ev stran (ku Kerem Güney awaza wê daniye) di fona paş de bû dengê dehsaleke ku şer û pêkdadanên qurs di navbera komên sîyasî yên curecure de qewimîn û dawiyê di 1980yî de bi derbeyeke serbazî bi encam bû. Ji derçûna xwe ya pêşîn û vir ve, ev stran ji aliyê hunermendên cîyawaz ve hatiye gotin, gelek ji kîjanan jî ber adebtasyonên xwe tûşî tawanbarkirinên polîtîk bûne.



Havîna 2017an, wekî hunermendekê ez hatim vexwendin bo Sînopê ku ji bo bayenîyilê xebatekê berhembînim. Henga ku ez lê dixebitîm bi şewaza zincîreyên sivik filîmên sehneyên biçûk ên melodramayê bikêşim, nûçeyên wê pêlê, wekî ji bo



avakirina sentrala nûkleyir dar dihatin birrîn, li min raselîtin. Min nûçeyên berdest hemû dixwendin, lê zanyariyên zêdetir tinebûn ji bilî rêkeftina ku çend sal berê hatibû îmzekirin, a ku dê bi destî konsorsiyûmeke peyana hevbeş a arizî ya Pîşesaziya Giran a Mitsubishiyê ya Caponyayê û Averaya Fransayê û wî gundî bihata cîbicîkirin ku divîya sentral lê bihata avakirin. Ji layê mêjûyî ve, ji 1950yan û vir ve hukimeta Tirk pêdagirîya xwe derbirrîbû wekî sentraleke nûkleyir ava bike. Di peywenda rageşîya polîtîk de, ya ku zêde dibû di navbera D.Y.yê û YKSSyê de, têgeha teknolocîya nûkleyir, hem wekî enerjîyekê hem jî wekî jêderkeke berevanîya serbazî, li Tirkîyeyê belavetir û bi awayekî seyr bernastir bû. Sînop, ji ber statûya Tirkîyeyê wekî endameke NATOyê, di henga Şerê Sar de wekî baregeheke Emerîkan bi kar hat û artêşa Emerîkan hewand. Li raserê nîvdorgeya Sînopê, hewirî li kêleka du pergalen radarê yên mezin ên ku danîbûne ser gir ên ku dê paşê bibûna sîmboleke bajêr (lê hê ve axiriyê ji wir hatin daxistin), artêşa Emerîkan di seranserê Deryaya Reş re berev nava YKSSyê sîxurî dikir. Henga ku wê havîna ez li wir mam, min ji xelqê pirs û pirsyar kirin ku zanyariyên bêtir werbigirin. Her kesî bihîstibû ku sentral ê li gundê Abaliyê bihata avakirin, lê çu zanyariyên zela ji aliyê dewletê ve nedihatî dabînkirin. Hal û mede wiha, min ji jinapeke xwe xwest ku bi seyareyê min bigerîne ku ez cîyê misoger ê sentralê peyda bikim. Li pey pirtikên zanyariyan, me nexşeyên satelaytî yên esmanî venihêrîn ku em li wî erdê darên ji nav birî yê bêtirî 650.000 daran bigerin, ku divîya bibûya erdê ku sentral ê li ser bihata danîn, da ku me serê xwe li ser derawayê qada avakirinê biêşanda. Di pey re me ajot û em ji navenda bajêr derketin û ji nîvdorgeyê bi dûr ketin. Me çolbirî da nava daristaneke ku bi makîneyên mezin li erdê hatibû rastkirin, em winda bûn li ser rêyên ku hê

Raselitîn spêleyan radike û tîne mexderê û ezmûna bûyîna di dema lîniyirî de diguherîne, wî awayî diguherîne ku em di rewşa asayî de rabirdûyê, nihayê û dahatûyê pê ji hev vediqetînin û li pey hev rêz dikin. Dema kêşeya ku ew dinimînin û jê re dibine nişêt nema di rayê hiltê yan jî tê çewisandin yan jî astengkirin, ev spêle yan jî sawêr xuya dibin.

— Avery F. Gordon, “Some Thoughts on Haunting and Futurity” (“Hindek Hizrên Li Ser Raselitîne û Dahatûyê”)

teze hatibûn vekirin. Me li nava û di dora daran re ajot heta ku me xwe gihande dereke rût û xikexalî. Heçku bobelateke siruştî berîya gavekê li wê derê qewimîbû: dar nemabûn, çu seqayeke jîyanê nemabû, bi tenê şaxoreke hûtane ya li ser erdê ku stara çu tiştî bû, ji bilî hesteke ku mirov diqutifand.

Tê pîlankirin ku li ser pêyê perava Deryaya Reş bêtirî 400 sentralan (sentralên haydroelektîk, sentralên termal û sentraleke nûkleyir) bêne avakirin û di rewşa heyî de tene avakirin. Jimara sentralên haydroelektrîk ên bi tenê di deh salên dawîn de ava kirî 203 ye, 143yên din jî dê bêne avakirin. Lê berxwedan jî çêbû. Li Gerzeyê, ya ku li Sînopê şaroçkeyeke biçûk e, berxwedana li dijî layenên têkildarî pîlansazî û avakirina sentraleke termal di 2010an de dest pê kir û bû yek ji têkoşanên serkeftî yên ku di 2016an de bi rawestandina avakirinê bi encam bûn. Ne ku bi tenê mirovan şîya xak û ava xwe li hemberî hêzên bêmilkker ên sazgehên kompaniyê û dewletê biparêzin, lê her wiha ew bi wê erkê jî rabûn ku bûn nimûneyeke xurt ji bo protestoyên Geziyê yên di 2013an de û ji bo têkoşanên dîtir ên li herêmê û li welêt.





Projeya min Despîna ji peywendîya girîft a civaka deverî ya li gel bendîxaneyê zeyinî, ji kartêka wê ya civakî wekî xaleke werçerxê ya mêjûyî bêyî ku berê xwe bide hovîtiya ku ew dinimîne, her wiha vebizava bi jîngehî bîrewer a li dijî avakirina sentralê ya qewî ne diyar mayî, wê jî sirûş bexşande wê. Ew filîmek e ku texmînan tîne çî ka çî dê bimîne piştî wêranbûna jîngehê wekî encameke kiriyara mirovî, her wekî wêranbûna

Vebijarkên dîrokî yên ku çêdibû heyî bibûna û demkîtiya resen a sîberkirina dahatûyên berze û baştir a ku bi bînefiskî dikişê nava tiştêkî ku bihê kirin radiselitine me, carinan wekî nostalcîyê, carinan wekî poşmanîyê, carinan wekî cureyekî neçarîyê. Dema ku ew tiştêkê ku bihê kirin dibe cîyê neçarîyê, tu dibêjî qey berîya wê hingê pêdivî pê çêbûye yan jî hatiye xwestin, dibe ku her tim, bê guman ji mêj ve. Dema ku ew tiştêkê ku bihê kirin dibe cîyê neçarîyê, em hest dikin heçku em hew dikarin li bendê bimînin ku tişt biguherin, nihaya çavsor biguhere, lê ne cîyê gumanê ye ku mirov li bendê dimîne, carinan bi bêhnfirehî, carinan ne.


— Avery F. Gordon, *The Hawthorn Archive* (Arxîva Daregîvîjê)

Ne cîyê pirsê ye ku kingê sawêrek radiselite, ew raselitîn rastîn e. Sawêrî vîyanêke, dozîneke yan jî rayeke xwe ya qasidîyê heye. Lewma jî vîyanên wî gotî bikevine ber qisedanê û divê em bi wî re bipeyivin.

— Avery F. Gordon, *Ghostly Matters* (Mijarên Sawêrî)



ku jîngehparêz ji pêş de dibînin Sentrala Nûkleyir a li Sînopê dê pêk bîne. Filîm binemayên post-apokalîptîk bi kar tîne û keçeke ciwan a bi navê Despîna lehenga wê ya çîrokê ye, ya ku şer dike li gel qiyameta zombîyan a ku ruh pê de tê dema ku birînen bedenî yên bergeheke siruştî ya pêpeskirî – jidestçûna firehtexlîdîya bayolocîk, gemarîya hewayê û avê, lewitana cenetîk û axê, lêmiştta bermayîyan, bêdaristankirin, jidestçûna tevna riwekan, jidestçûna zanyarî/sepanên/keltorên gerdîşî û îstimlaqkirina erdan – dadixuricine jêrehişa kolektîv a civakê. Keçik rêberîyê peyda dike di bîrhatî-xewnan de, yên ku bi rêya sûretên/qereqterên curecur radigihîjine wê û, ji Gerzeyê ta bi Geziyê, di nava têkoşanên cîyawaz re zanyarîyê vediguhêzin, ne ku bi tenê li nava jêmayîyên xakeke dêrisandî, kavlên wê û sawêrên wê, lê wisa jî li nava bîr û melankolîya di civakê de û, lewma jî, di nihayê de veşartî, ji bo wê bi xwe û ji bo civaka wê arasteyê dabîn dikin. Em didine pey rêwingîya lehenga çîrokê ya li ser rêka teng a bîra civakî hindî keçik hewil dide ku peyda bike û fam bike ji parçeyên wekî çî li bergeha siruştî û mirovan qewimîye û bi şopandina pirtikên zanyarîyên ji rabirdûyê mayî pey bi wateya nihayê behere.



Dîmen pirek e di navbera hesta hişyarkirî û zanyarîya hişber de; peyv qablo ne ku pirê li ser pêyan dihêlin. Dîmen ji peyvan yeksertir û rasterêtir in û bêtir nêzîkî derehişîyê ne. Zimanê wênayan di ser hizirîna bi peyvan re ye; hişê metaforîk di ser hişberîya analîtîkî re ye.

— Gloria Anzaldúa, *Borderlands / La Frontera* (Deverên Tixûb/La Frontera)

Amraz

KARTÊN HEVBEŞÎYÊ JI BO JÎYÎNA LI NAVA KAVILAN

'Kartên Hevbeşîyê Ji Bo Jîyîna Li Nava Kavilan' amraz in ku rê li ber çirokgotîne xweş bikin. Ev amrazên ji komek kartên bidîmen û komek kartên bipeyv pêk hatî wan kesên ku ew hildane destên xwe vedixwînin ku vegêrranên, şayesên û çirokên cîyawaz biafirînin. Koma vekolanê ya Zîwanên Xweragir a vekolîneran/hunermendan peyv bijartin û dîmenên têkildarî bergehên siruştî, sawêran, projeyên ekstraktîvîst, cîhanên ji bav û kalan mayî, ajelan, kesên, sazûmanan û obceyan bi şeweyekî peywendîdarî xebata war-navendî nîgar kirin. Koma peyvên hat wergerandin bo zimanên endamên komê, ango, zimanên Amharî, Almanî, Kurdî, Portûgalî, Spanyolî, Tirkî û Îngilîzî. Dera vala ya di kartê de dê bi zimanê kesa/ê bikarhêner bi xwe bihê dagirtin.

Peyv û dîmen firehwateyî ne, çu wateyê neguhêr bi wan ve nîne. Dîmen dikarin firehtexlîdîyê peywendîyên vegêrranî dagirisînin. Dîmenek, bi awayekî pêk hatî li gel peyvekê, dikare

wateyê yan ji hesteke sêyem biafirîne ku dîmen û peyvê bi xwe bi xwe ve negirtîbin. "Kartên Hevbeşîyê Ji Bo Jîyîna Li Nava Kavilan" vexwendinek e ji bo vedîtin û firehkirina babetên çirokan ên çaverênekirî. "Kartên Hevbeşîyê Ji Bo Jîyîna Li Nava Kavilan" divê di destan de bin, divê bêne veguhestin, divê kes wan bidîne hev du ji bo ku kardaneweyan veçirînin. Exlebe Kartên OHyê sirûşê dibexşînine wan ku ji aliyê hunermendê Kenedeyî Ely Raman ve hatine afirandin. Kartên OHyê yên ku wî sêwirandin 88 kartên dîmenan bi xwe ve digirin, 88 kartên peyvên bi ser ve kirî ne. Çu rêzîkên neguhêr nînin der barê awayê lîstinê de. Bikaranîna wan texeyyul û derbirrana kesa/ê bikarhêner bi xwe ve digire. Kart ne guncan in li gel lîstîkên ku hayirarkîyî yan jî cîyê qayîşkêşanê ne. Tê de ti kes bi ser nakeve û di bin nakeve, bes mirov peywendîdar dibin li gel kiryara vegêrrana û guhdarîkirina li çirokan.



Çalakî


ÇÎROKÊN ÇIRÛSKÊ

Koma çalakîyan tê pêşniyarkirin ku wekî rêzeke rahênanan bi karîwerîyê kombendî bi rê ve biçê ku çêdibe di peywenda kargehekê de bihê kirin. Beriya van çalakîyan, komeke kesên ku bêmilkkirinê kar di wan kiriye û dixwazî li hev bicivin pêwîst e bihê pêkanîn. Ji bo van çalakîyan, pêdiviya we dê bi "Kartên Hevbeşîyê Ji Bo Jîyîna Li Nava Kavilan" hebe, her wisa jî "Kartên Qereqteran" û "Kartên Rewşan". Tika ye kartên ku hevpêç in li gel vê kitêbê bibînin û wan jê hilînin û amade bikin. Armanca van çalakîyan ew e ku em lîstîkvanan han bidin wekî ew wateya xwe bi xwe şirove bikin û di vedîtinên gengaz î cîyawaz ên der barê dîmenên û peyvên kaşerêzkirî de derxin, wan bixîne tevgerê û li ser dîmenderê nişan bidin. Ew ê zerengîyan fireh bike ku mirov li şûnwarên bêmilkkirinê bi rêya vehandina cîhanên vîyayî yên dîtir guhdarîyê lê bike û lê vegevine.

DÎMENÊN HEVBEŞKER

Ev çalakî tê sazîkirin ku bi rêya hevbeşîya serbest peywendîyîtiya bedenê û kartên dîmenan û peyvên bîne şûnwarên bêmilkkirinê. Ev çalakî tê sazîkirin ku 20 xulekan bidome.

- . Bigihîjîne yeke/î di komê de. Her kesek karteke dîmenan û karteke peyvên digire.
- . Li şûnwarekî bêmilkkirinê piçekî bimeşin û bo du xulekan bihizirin li ser tundûtûjîya têkildarî vî şûnwarî. Heke şûnwarê peywendîdar li dereke din be, hewil bidin ku hûn wî xeyal bikin. Bila haya we hebe jî tiştên ku hûn dibihîzin û bêhna wan tê we.
- . Bêyî ku hûn vetixûbîkirinê şûnan ji bîr bikin, li dor û berê şûnwêr ji xwe re bigerin û bila her kesek bo pênc xulekan der barê kartên xwe de bipeyive.
- . Dûmayîyê, kartên xwe, çirokên xwe û hevbeşîyên xwe li hev bicivînin; wan lêk bidin û bikine peywendîdar da ku hûn vegêrranên nû dagirisînin.



Duh bi şev min xewna xwe ya her carê dît. Yeqîn gotî ez çaverêya wê bûma. Dema ku ez xwe diçerçirrînim – dema ku ez serê xwe bi girêdana xwe ya şexsî diêşînim û hewil didim ku xwe lê daynim wekî ti tişteki nebihîstî û nebînayî naqewime – ew xewn tê ber serê min. Dema ku ez hewil didim bibime keça bavê xwe, ew tê ber serê min. Îro rojbûna me ye – a min a panzdehem û a bavê min a pêncî û pêncem. Sibehê, ez ê hewil bidim ku wî – wî û civatê û Xwedê – dilxweş bikim. Wisa jî duh bi şev, min xewna tişteki dibîrhêner dît, go, ew tev derewek e. Ez dibêjim qey pêwîst e ez der barê xewnê de binivîsim, ji ber ku ev derewa taybet min zehf ‘aciz dike.

— Octavia E. Butler, *Parable of the Sower* (Meteloka Yê Tovçîn)

Çalakî

LIHEVCIVANDINA XEWNÊN TAKEKESÎ

Armanca çalakîyê ew e ku hêza veşarî ya veguherîner a xewndîtina kombendî ya rabirdûyên û dahatûyên dîstopîst û utopîst li hev bicivîne. Armanca ew e ku di komeka du yan jî duwazdeh kesî de bê lîstin.

-
- . Ji layê şunwarê/n bêmilkkirinê ve cîyê xwe destnîşan bikin.
-
- . Bihizirin di tirseke ku we heye û eleqeyê wê bi vê derê heye.
-
- . Tevî vê tirsê di bîra xwe de karteke dîmenan û karteke peyvan bikişînin.
-
- . Pasaca destpêkê ji kitêba Octavia E. Butlerê *Meteloka Yê Tovçînê* bixwînin.(1)
-
- . Bi şeweyekî peywendîdarî wê tirsê û karta xwe, xewna lehenga ji çîroka Butlerê xeyal bikin.
-
- . Çemberekê çêkin û hizrên xwe û hevbeşiyên xwe bi kesên mayî yê komê re parî hev bikin.
-

(1) Octavia Butler, *Parable of the Sower* (New York: Grand Central Publishing, 2000)

Çalakî

RAHÊNANA NIVÎSÎNA SERBEST

Ji çalakîyê re şarezayîyên nivîsînê illeh navên, lê çalakî beşdarên vedixwîne ku xerîkî nivîsîna serbestkêş bibin, çalakîyek e ku xetên ragîhanê vedike di navbera zêhna hişber, derehiş û sehekî de. Giring e ku hûn bi qelemeke hibrî li kaxizê binivîsin; di gel vê hindê, heke hûn kompîteran çêtir bigirin, hûn bi kêfa xwe ne kompîterê bi kar bînin. Xwe bi rêzimanê mijûl nekin, lê hewil bidin ku hûn hevokên xwe biqedînin.

Giring e ku hûn ranewestin, bi nivîsînê berdewam bibin û bila qelema we ya hibrî timî bilive. Armanca vê çalakîyê ew e ku li gel Kartên Hevbeşîyê Ji Bo Jîyîna Li Nava Kavilan hûn rê li ber rahênana nivîsîna serbest xweş bikin ku hûn xeyal bikin dahatûyên cîhanên cîyawaz ên ku têne ba hev û hûn utopîyayên civakî bi şeweyekî ron û vebirr derbibirrin.

. Ji layê şûnwarekî/ên diyar ê/ên bêmilkkirinê ve cîyê xwe destnîşan bikin.

. Bihizirin di hêvîyeke xweser a ku we heye û eleqeyeke wê bi vî şûnwarî heye.

. Wê yekê di bîra xwe de bigirin, karteke dimenan û karteke peyvan bikişînin.

. Pasaca destpêkê ji *Werza Pêncem* a N. K. Jemisinê bixwînin.(2)

. Demjimêrekê bo 15 xulekan bar bikin û dest bi nivîsîna serbest bikin, pê re jî bîrhatîyeke ji cîhana kevn a *Werza Pêncemê* xeyal bikin.

. Her kesekî çi nivîsibe, bi dengêkî bilind bixwînin û bi komê re parî hev bikin.

(2) N.K. Jemisin, *The Fifth Season: Every Age Must Come to an End* (London: Orbit, 2015).

Ev e tiştê ku divê hûn bînine bîra xwe: kutabûna çîrokekê destpêbûna yeke dîtir e. Ev yek berê qewimîye, axirî. Mirov dimirin. Nîzamên kevn dibihurin û diçin. Civakên nû peyda dibin. Dema ku em bibêjin “dawî li cîhanê hat,” exlebe ew derewek e, ji ber ku halê gerestêrkê xayet xweş e.

Lê dinya bi vî awayî diqede.



Dinya bi vî awayî diqede.

Dinya bi vî awayî diqede.

Bo cara dawîn.

— N.K. Jemisin, *The Fifth Season* (Werza Pêncem)





Çalakî

XEYALKIRINA CÎHANÊN DÎTIR

“Kartên Rewşan” û “Kartên Qereqteran”(3) ji bo beşdarên wekî desteyên kartan têne sêwirandin da ku li gel qereqterên zindî û nezindî yên cîyawaz rê li ber texeyyulên der barê cîhanên dîtir ên sînyoyên utopîst û dîstopîst de xweş bikin. Mebesta vê çalakîyê ew e ku bi dayelektîka dîstopîyayê û utopîyayê sînyoyên honaka zanistî bisêwirîne da ku em bi ser hêza xwe ya veşarî ya texeyyulê û afirandina dij-vegêrranên jîyana kolektîv û zindîmayîne ve bibin û wê bîsepînî. Ew ê çîrokên biafirîne ku dê cîyawaztir bin ji çîrokên ku, li nîk zîyana gihiştî bergehên siruştî yên êkolocîk, li dora babeta zîyana gihiştî bedenên û derûnên mirovan in.

. Têkildarî şûnwarê(n) bêmilkkirinê, bihizirin di çîrokeke zindîmayîne yan ji berxwedanê ya ku hûn pê dizanin. Çêdibe çîrokek be ku hatibe serê we, we bihîstibe yan jî ji zargotina bav û kalan gihiştibe we.

. Karteke rewşan û yeke qereqteran bijibêrin.

. Demjimêrekê li ser 15 xulekan bar bikin û dest bi nivîsîna serbest bikin, çîroka xwe di bîra xwe de bigirin û li gorî karta rewşan a we bijartî rojê qereqterê bişayesînin.

. Bi deqa xwe de biçin û ji nivîsara xwe sê peyvan bi awayekî sehekî bijibêrin.

. Demjimêrekê li ser pênc xulekan bar bikin û dest bi nivîsîna şî'rekê bikin ku tê de hûn van peyvan bi kar bînin.

. Bi xwendina bi dengê bilind çîroka xwe û şî'ra xwe bi kesên mayî yên komê re parî hev bikin.

(3) “Kartên Rewşan” û “Kartên Qereqteran” ji aliyê İpek Hamzaoğluyê û Malu Blumeê ve hatin çêkirin ji bo kargeha wan a bi navê *Çîrokgotina Ji Bo Qiyametê* ya ku wan di henga Bayenîyîla Sînopê ya Navneteweyî, Sinopale 7ê de wekî beşa projeya vekolanê ya FWFyê ya bi navê “Bê/Milkkirin: Sepanên Hunerê yên Pişt-Beşdar û Pedagogîya Xakê” li dar xist.

XEYB

Dema ku em xeyban dikin, em zanyariyên pirr giring belav dikin. Xeyb şeweyekî hevpeyivîne û zimên e ku takekesan û civatan digihîne hev. Xeyb dikare cametebdîl bike kesên layen ên ku çirokan vedigêrrin, pê re jî berdewamiyê didine tiştê ku civat bawer dike ku beşa qewî giring a çirokê ye. Di nava rahênana xwe re xeyb bi kolektîvî û bi berdewamî rewîşt a hevbeş a civakê pênase dike(ve), bo nimûne, guhdar dikarin biselminin wekî di nava vegêrranê û beşdariyê re çirokek di nezera civaka guhdar de çawa ye. Xeyb navgînek e bo dagirtina valayîyan û carinan hetta bo peydakirina xelegên kê mên lî cîyên ku zanyariya giring bi berdewamî tê hilandin û veşartin bi destî rayedarên, her wekî dewletan, ku ji xwe re qorî dikin zanyariya li ser biryarên giring ên ku ew der barê jiyan û xaka xelqê de digirin. Xeyb amrazek e jî ku bi rêya bihevgerîdana civakî û cîbicîkirina bêemriyê mirov li ber desthilatê bide çoyê xwe, dihêle ku kes bi lehengên çirokê nehese. Xeyb anonîm e; çu caran bi kesekê/î ve dest pê nake, lê ji aliyê gelekane ve tê vegêrraneve; jêderka wê ne hew bi tenê derek e, lê ew li her derê ye. Xeyb bi bêaramkerî belav dibe li dor û berê jêderka desthilatê û ji bê/milkkirîyan re çekê û mertalekî dabîn dike. Xeyb awayekî qewî giring e ne bi tenê belavkirina zanyariyê ye, lê awayê pesendkirina rastiya cêrgeyên cîyawaz ên zanyariyê ye jî, yên ku wekî maqûl têne qebilandin hindî ew vegêrranên sahibrewac î ferzkirî diderizînin.

Weku Silvia Federici tîbînî dike, peyva “xeyb”, beriya ku asê bimîne di wateya cinsiyetkar de ku îro li wê tê barkirin, li Îngilistanê di Serdema Navîn de ji bo ravekirina hevalîniya jinan hatiye bikaranîn.(4). Federici derpêş dike ku damezirandina civakeke sermayedar “peydakirina mecazeke

rûmetşikên, nişaneyeke pêştir a asta ku hêza jinan û peywendiyên civakî li ser hatin tepeserkirin”(5) hewce kir. Di sedsala 16em de bûye ku wateya peyva xeybê hatiye berevajîkirin, wate pêşî piğarî bûye ku amajeyê bi hevalîniya jinan dike, paşê bûye peyveke ku çelçelê û fisq û fesadiyê pênase bike. Îro, xebat û kesayetiya jinan hatine kêmnirxkirin û henekên xwe pê dikin heçku jinên ku xeyban dikin tiştêkî xwe yê baştir tîne ku bikin. Di gel vê hindê, xeyb toreke zikmakî û cinsiyetê ya giring a zanyariyê ye. Û, weku Hannah Black wê li qelemê dide, “torên xeybê rêkan hemûyan diceribînin ku bihêlin her yek ji wan pê bizanibe ‘etbar bi kê nabe, li kê derê gotî tu miqate bî, siûda kê lê xistiye û ya kê lê nexistiye.”(6). Xeyb amrazek e ku hêza xwe ya veşarî heye ku wekî dij-vegêrranê bişuxule li hemberî tomarên mējûyî yên berhemên daynamîkên desthilatê yên zilmkar. Wê hêza xwe ya veşarî heye ku qelşan di tomarên mējûyî yên sahibrewac de veke, berpirsariyên wan bide ber pirsan û zemîne wan bihejîne. Ew wek vayrûsekê belav dibe; sade û tîrwate ye, di bîra mirov de dimîne û vegir e. Xeyb çu caran ne awayekî hişk e belavkirina zanyariyê ye; hema hema her tim kiryarî ye. Bikaranîna wê ya zimanî bi averêkerî tovên sêwiranên alternatîvekê direşîne hindî ku ew bi çirokên ji aliyê bê/milkkirîyan ve nehatî vegêrran valayîya ya nîzamî dadigire.

(4) Silvia Federici, *Caliban and the Witch: Women, the Body and Primitive Accumulation* (Brooklyn: Autonomedia, 2004), 100.

(5) Ibid., 186.


(6) Hannah Black, “Witch-hunt,” *TANK Magazine* 8, no. 11 (2017); online at: tankmagazine.com/issue-70/features/hannah-black.


MIN XEYBEK BIHÎST

Gelek ziman û civakên cihêreng şeweyekî xwe yê guhertî yê xweserî xwe heye ku ew xeybekê pê didine destpêkirin. Di zimanê Tirkî de, demeke borî heye ku bi tenê dema ku kesek ne di civatê de be, çî çîrvanok, çî mamik, çî jî gotegot, di çirokan de bi kar tê ku bi pirranî ji bo xeybê tene vegêrran. Ev çalakî tê sazîkirin ku bibe kariwerîyeke kombendî. Mebesta vê çalakîyê nişandana binemaya kiryarbar a xeybê ye û vedîtin e bê ka çawa ew dikare bibe amrazeke xurt da ku di peywenda mîdyaya dewletê ya sazîkirî de çirokan belav bike. Ji bo vê çalakîyê, qesta kartên rewşan bikin ku hevpeş in li gel kitêba çalakîyan û wan jê hilînin û amade bikin.

Li jêrê nimûne hene ji zimanên û peywendên cîyawaz wekî çawa mirov dikare wan tevî rahênanê bike.

- Sana birşey söyleyeceğim ama kimseye söylemeyeceğime yemin et... (Ji Tirkî: Ez ê tiştêkî bibêjime te, lê tu sondê bixwî ku ji kesekê re mebjî)
- Oh senti questa... (Ji İtali: Pîi gotî tu vê bibihîzî)
- Valla ben söyleyenlerin yalancısıyım. (Ji Tirkî: Ê bi Xwedê, derew yan rast, li ser bextê gotîyan be...)
- Ça reste entre nous. (Ji Fransizî: Bila ev di orta min û te de bimîne.)
- Tu me promet tu garde ça pour toi. (Ji Fransizî: Sozê bidî wekî giliyê megerîni.)
- J'ai un dossier de ouf sur X. (Ji Fransizî: Gotegoteke sosret der heqê X de heye.)
- Ej, słuchaj... własnie slyszalam, że... (Ji Lehkî: Ay guhdariyê bike... min teze bihîst, wekî...)
- Laf aramızda (Ji Tirkî: Di orta min û te de)
- Benden duymuş olma (Ji Tirkî: Te qe ji mi' nebihîst, lê)
- *ХОДЯТ СЛУХИ, ЧТО...* (Ji Rûsî: Gotegot digerin, wekî...)
- Te tengo un chisme (Ji Spanyolî: Xeybeke min heye...)
- Doszly mnie słuchy, że... (Ji Lehkî: Gotin gihiştine min, wekî...)
- Ay bu kulaklar neler duydu, neler işitti. (Ji Tirkî: Ay min ne pîkê, van guhan çî bihîstin û çî nebihîstin...)





Çalakî

- . Bi beşdarane hemûyan re li nava çemberekê rûnên.
- . Wekî kom “Kartên Rewşan” bikişînin ku şêwe dide cîhana çîrokê.
- . Wekî kom “Kartên Qereqteran” bikişînin ku dê bibe desthilatdara vê cîhanê.
- . Tê bihizirin bê ka ev kart cîhaneke bi çi rengî tînine mexderê: kî dê bibûya berpirsyar, kîjan jîyan ê giringtir bûna, kîjan xebat ê giranbuhatir bûna?
- . Dest bi vegêrrana çîrokekê bikin ku pirrtirîn ji du heta bi sê hevokan pêk bê, bila xwe bispêre wê sînyoyê wekî “Min gotegotek bihist ku...” Lê bixebitin ku hûn di nav re kin dengên wan ên ku hûn dixwazin giring bin.
- . Li pey hev hevokekê li çîrokê zêde bikin.
- . Dema ku hûn li çîrokê zêde dikin, lê bixebitin ku hûn nimûneyên pêşniyarkirî yê ji peywendên cîyawaz bi kar bînin.



↑ Wêneyê vîdyoyî, *Despîna*, xebata İpek Hamzaoğluyê, 2021

BERHEMÊN HUNERÎ

- Adanalı, Yaşar, Ayça Aldatmaz, Burak Arkan, Elif İnce, Esra Gürakar, Zeyno Üstün, Özlem Zıngıl, and anonymous participants, artists. Since 2013. *Networks of Dispossession* (Graph Commons).
- Al-Maria, Sophia, artist. 2018. *Wayuu Creation Myth*. Single-channel video. Online at: vimeo.com/282312230.
- Al-Maria, Sophia & Victoria Sin, artists. 2019. *BCE*. Single-channel video. See: dazeddigital.com/art-photography/gallery/26163/7/sophia-al-maria-and-victoria-sin-bce.
- Blume, Malu, artist. 2020. *The Book of S of I*. Video, 28', color, English.
- Henriksson, Minna, artist. 2017. *Solidarity*. Linocuts.
- Karakaş, Gizem, artist. 2016. *The Ground Has Ears*. Performance.
- Lahire, Sandra, director. 1987. *Uranium Hex*. 16mm film, 11', color, Magnetic, 4:3. LUX. See: lux.org.uk/work/uranium-hex.
- Marker, Chris. 1962. *La Jetée*. 35mm film, 28', French/German. Argos Film.
- Treister, Suzanne, artist. 2009–11. *HEXEN 2.0: HISTORICAL DIAGRAMS: From Diogenes of Sinope to Anarcho-Primitivism and the Unabomber via Science-Fiction*. Diagram.
- Tsai, Charwei & Tsering Tashi Gyalhang, artists. 2012. *Lanyu: Three Stories*. Three-channel video installation.
- Utikal, Sofi, artist. 2016. *Reversal Tarot*. Performance.
- Weerasethakul, Apichatpong, director. 2009. *A Letter to Uncle Boonmee*. Shortfilm, 18', Thai. Animate Projects.

JÊDERKÊN VESER

- Anzaldúa, Gloria. *Borderlands / La Frontera: The New Mestiza*. San Francisco: Aunt Lute Books, 1987.
- Gordon, Avery F. *Ghostly Matters: Haunting and the Sociological Imagination*. Minneapolis: University of Minnesota Press, 1997.
 - *The Hawthorn Archive: Letters from the Utopian Margins*. New York: Fordham University Press, 2018.
 - “Some Thoughts on Haunting and Futurity.” *borderlands* 10, no. 2 (2011): 1–21. Online at: averygordon.net/files/Gordon_HauntingFuturity.pdf.
- Scott, James C. *Domination and the Arts of Resistance: Hidden Transcripts*. New Haven: Yale University Press, 1990.

CENERİK

Despina, xebata İpek Hamzaoğlu. Vîdyoya HD, 2021. Li Sînop, Turkeyê hat kêşan. Kesên Performe Kirî: Ezgi Eczacıbaşı û Sinem Hekim. Alîkar û kameraya din: Malu Blume. Mûzîk: Alican Çamcı. Deng: Cemil Hamzaoğlu. Spasiyek taybetî Erkan Aklıman, Malu Blume, T. Melih Görgün, İbrahim Hekim, Sinem Hekim, Mert Karaçıkay, Gülbahar Karaduman, Laura Nitsch, Selin Saraçoğlu, Büke Onur, û Osman Onur. Malavayiyên taybet bo Sînopalê (Bienala Sînopalê ya Navneteweyî) û koma vekolanê FWF/PEEK “Bê/Milkirin: Estetîka Pişt-Beşdar û Pedagogîya Xakê.” Wêneyên filimî û fotrafên di vê beşê de hemû: berhemhênaneyeya bexşa hunermend İpek Hamzaoğluyê

WARÊN KAXIZ




têla dirrehî
 rêzên li ser kaxizê
 ku sawêrên serhişk
 deng li wan bilind kirine

Janine Jembere

Berlîn, Almanya



... hebûna min ne di ber fêkirina we de ye
 da ku ji cî derîne gewrîya dayîka min bi şexş fîtan ji binî de
 û qerebû bike kovana wê bi bûrsan û polîtîkayên sererastkirî.
 polîtîkayên ku toz girtine hê berîya ku wekî gelale hatine
 belavkirin.
 ev welat me dispêre xakê berîya ku em ji dayîk bibin.
 bi ‘elamên mirina me deng li me dike berîya ku deng li me bike
 bi navên me.

— Koleka Putuma, “EVERY / THREE HOURS” (“HER/SÊ SAETAN”)




Cîyê xebata min arxîva kolonyal a Almanan e. Ez ketime pey rêçên
 kaxiz-navendî yên liberrabûna li hemberî serwerîya mêtîngehkar a
 Almanan ên ku di navbera 1880yî û 1914an de ji alîyê Efrîqayîyan
 ve hatine nivîsîn. Ez li nameyan, daxwaznameyan, gotarên
 rojnameyan digirim. Wek gelek kesên din, ez dixwazim li dijî
 honaka Ewrûpayê ya kirdeyê kolonyal bixebitim, ê ku bi tenê xwe
 li ber azarê digirt; bê deng, bê nav bêyî nûnerayeti û ziman.

Ji ber gelek egeran, xebata min û, di akamê de, vegêrrana
 li vir pêşkêş kirî letletî dimînin. Deq nikare, û naxwaze, dest ji rewşa
 xwe ya wekî bernivîsekê berde. Ew destpêkek e; ne dawîyek e.



Peywendîdarî cîhana mêtîngêkar, vesazkirina wê, pergala wê ya erdnîgarî û tundûtûjîya ku serwerîyê li destûra wê dike, Fanon pêşî qala serbazgehan û polêsxaneyan dike. Ew bê guman wisa dike, ji ber ku kolonîzasyon, berîya her tiştî, gêjgerînkeke hêzan e ku li ser kar in. Ev hêz serê pêşîn tomar kirî ne li nava dereke ku ew lê dixebitin nexşeyê daynin, biçînin û saz bikin. Fanon bê guman dest pê dike weku dike jî, ji ber ku kirasê hesin e ji bo kolonîzekirîyan, kolonî berê pêşîn derek e ku ezmûneke tundûtûjîyê û geremolê tê de diqewime, derek e ku tundûtûjî li nava dem û dezgehan û sazûmanan tê berhemhênan.

— Achille Mbembe, *On the Postcolony* (Li Ser Postkolonîyê)



Bundesarchiva li Berlîn-Lichterfeldeê, liqêke arxîva federal a Alman ew der e ku belgeyên ez pê eleqedar dihevine. Cîyê wê li dibistaneke herbîyeyê ya Prûsyayê ya berê ye, ya ku piştî Şerê Cîhanê yê Yekem veguherandine û kirine dibistaneke dewletê û paşê, ji 1933yan û pê ve serbazên SS (komeke bijarte ya paramilîter a Nazî) tê de mane, yê ku li qada avahîyên wê înfaz cî bi cî dikirin.




Weku Mbembe bi rêya Fanon tîne bîra me, tundûtûjîya kolonyal li nava dem û dezgehan û sazûmanan tê berhemhênan¹. Ji layê Berlîna metropol ve yek dikare lê zêde bike ku ev tundûtûjî pirrî caran tê ketûberkirin. Dora avahîyên Bundesarchivê bi hewzeke avjenîyê û çîmanekî kesk î gumreh hatiye girtin. Qesirbendî û seqa hovane û berhemdêr in di heman katê de. Çîman pirr fireh e, dar pitpitî lê belav bûne. Bergeh hema hema aramîbexş e û heke ne ji avahîyan bûya, ev der ê bibûya dereke bêdeng û tena bo hatinê û bêhnvedanê. Ez bi matmayîna xwe nikarim wekî ji çî re ev der ji bo arxîvê bijartine û ji çî re avahî hê jî li wir li rêza pêşîn in. Berê ez gelek caran hatime dîtina vê derê, lê hê jî bedena min red dike ku bihedire.

Ji bo ku bi hûrgilî li ser dosyeyan bixebitim, li stûdyoya xwe yan jî li nivîsgeha li Peymangeha Hunerên Ciwan a Vîyanayê, rûniştî li ber mêzekê, min dîşifre û xwendin kirin û gelek wext bihurand. Mêzên nivîsînê û kursiyên li Berlînê û Vîyanayê ew der in ku laşê min pirrî caran lê bi cî bûye. Tiştêk bi vê rewşê re heye ku kirekirê ji guhê min dibe, dema ku dilivim, heçku lebt û liv bi min nakeve.

Belgeyên ku ez pê dixebitim ji derên cîyawaz tîne û ji derên cîyawaz dipeyivin – ew li mêtîngêhên Almanan ên berê yê li ser parzemîna Efrîqayê hatine nivîsîn. Netewedewletên ku îro teqabûlî van deran dikin Kamerûn, Togo, Namîbiya, Tanzaniya, Burundî û Riwanda ne. Derên ku ez qet neçûmê. Heta ku ji min tê, ez hewil didim ku xwe bihêvişînim ji xeyalkirina van deran, ji ber ku pirrî tundûtûjîya di dosyeyan de ez lê rast tîm peywendîyêke xwe heye li gel texeyyul û rawêjên dereke din, destûrdayîtiyêke bo fenteziyên kolonyal û giringînedaneke bo ezmûnên qewimî. Ev tundûtûjî di dilqê zanistê, bûrsê û geşedana aborîyî de tê. Weku Aimé Césaire û gelekên dîtir amajeyê pê dikin, ew dawîya dawîn hincetek e ji bo talana bi her cureyî. Lewma ez hewil didim ku zêhna xwe bicivînim li dera ku ez lê me û bêtirî her derê dinasim: Berlîn, paytexta Almanan, cîyê konfiransa Berlînê û gelek tawanên dîtir û her wiha bo dirêjtirî demê der û dîyarê min.

Belgeyên ku ez li pey im vegêrranên der barê xakê û serdestiyê de ne; ew bi pêş de tînin rabûnên li ber tiştê ku Césaire dibêjiyê, şuxulana birêkûpêk a kar. Di nava razberkirinê de ku ew dosyeyek, nameyek yan jî gotarek e, xak û cî qewî heyî ne. Nivîskî wek her tim her çî nebî du cî heyî ne tê xuyanê: cîyê ku nivîskar jê û pê dinivîse, bi gotineke mayîn, cîyêkî li ser parzemîna Efrîqayê ya li jêr gefa mêtîngêkar a Almanayê û cîyê ku name gotî bigihîjîyê – cîyêkî dîtir, sazûmanek, kesek, bi hezaran kîlomêtroyan berev Bakur.

¹ Achille Mbembe, *Necropolitics* (Durham: Duke University Press, 2019).






Belgeyên ku ez li pey im vegêrranên der barê xakê û serdestiyê de ne; ew bi pêş de tînin rabûnên li ber tiştê ku Césaire dibêjiyê, şuxulana birêkûpêk a kar. Di nava razberkirinê de ku ew dosyeyek, nameyek yan jî gotarek e, xak û cî qewî heyî ne. Nivîskî wek her tim her çî nebît du cî heyî ne tê xuyanê: cîyê ku nivîskar jê û pê dinivîse, bi gotineke mayîn, cîyekî li ser parzemîna Efrîqayê ya li jêr gefa mêtîngehkar a Almanayê û cîyê ku name gotî bigihîjiyê – cîyekî dîtir, sazûmanek, kesek, bi hezaran kîlomêtroyan berev Bakur.

Xapînek e wekî çêdibe tundûtûjî bihê vetixûbkirin. Bêtir ji sibobeke ewleyîyê be ji bo ku li navenda hêza mêtîngehkar jîyanê bi hendaze û bi rêk û pêk bigire, mêtîngehên Almanan bûn herêma ceribandîna ji bo bisehnekirinên çapanmezin ên xofên û tundûtûjîya ku hê bi şûn de nehatiye Ewrûpayê. Lê li navenda hêza mêtîngehkar jî, her kesek nakeve wî halî ku bi heman awayî

Ez bi zelalî dibînim a ku mêtingehkarîyê rûxand... û ne Deterding ne Royal Dutch ne jî Standard Oil dê çu çaran dilmînîyê bide min... Ez li dora xwe dinihêrim û her li kê derê mêtingehkar û yên mêtingehkirî rû bi rû bin, ez zorê, hovîtiyê, xedarîyê, sadîzmê, berberîyê dibînim, pê re jî, di parodîya perwerdeyê de, berhembênana bi lez û bez a çend hezar erkdarên rajêr, “gedeyan”, sen’etkaran, karmendên nivîsgehan û tercumanan ên ku pêwîst in ji bo şuxulana birêkûpêk a kar (...).

Dora min e hevtayîyekê derbibirrim: kolonîzasyon = “tiştandin.” Ez bahoze dibihîzim. Ew ji min re qala geşedanê, qala “destkeftîyan”, nexweşîyên pakkirî û standardên geşepêdayî yên jîyanê dikin. Ez qal dikim ji civakên ji puxtaya xwe vala kirî, keltorên pêpes kirî, sazûmanên binkol kirî, xakên desteser kirî, dîn û ayînên mehf kirî, afirandinên hunerî yên ‘ezamet ên rûxandî û derfetên bêhevta ji binî ve tine kirî. Ew zanyariyan, amar û statîstîkan, mesafeyên rêyan, kanalan û xetên hesin ên trênan digujgujînine ser min. Ez qala bi hezaran mirovan dikim ku kirine qurbana Congo Oceanê. Ez qala wan kesan dikim ku, gava ku ez vê dinivîsim, ew bendera Abidcanê bi destan dikolin. Ez qala bi milyonan mirovan dikim ku ji xwedayên xwe, ji xaka xwe, ji banekîyên xwe, ji jîyana xwe-ji jîyanê, ji dansê, ji zanayîyê hatine raqetandin. (...) Ew min hijmetkar dihêlin bi tonaca pembû yan jî kakaoya ku hatiye hinardekirin, bi tibabê erdê ku darên zeytûnan û mêwên tirî tê de hatine danîn. Ez qala aborîyên siruştî dikim ku hatine kajovajîkirin, aborîyên ahengdar û jîndewar ên rikibî li gelheya xwecî – ez qala derametên xwardemenî yên xopan bûyî, bedxwarina hemîşeyî li sepanê, geşedana kişawerziyî ya bi tenê arasteyî berjewendîya welatên împeryalîst dikim; ez qala talana berheman, talana kereseşyên xam dikim.

— Aimé Césaire, *Discourse on Colonialism* (Gotar Li Ser Mêtingehkarîyê)



Wezîrê Karên Derve yê Alman ji bo mêtîngehan rastî li xwe danî ku di seferên li dijî binecîyan de ji 1903yan ta bi 1913an 105.000 binecî hatine kuştin. Ev reqem jimarên binecîyan bi xwe ve nagire, yê ku ji ber kartêka TROPENKOLLERA² ku Alman hemû îzrabê jê dikişînin bi destê karmendan û bazirganan hatine kuştin.

— xwînerok, Gold Coast Leader, BArch R 1001/4308

Welatên nû qadeke pîrr fireh pêşkêşî takekes dikin, çalakîyên tundûtûj ên ku, li welatên împeryalist, dê rastî pêşdarazîne dîyar, rastî peypêbirineke bihendaze û birêkûpêk a jîyanê bîn, û yê ku, li mêtîngehan, azadîya xwe ya mezintir heye ku geşeyê bidin û, ji ber vê yekê, 'esehîya hêjayîya xwe bikin. Bi vî awayî ta asteke dîyar mêtîngeh dikarin bi erka sîbobeke ewleyîyê ya ji bo civaka hevçerx rabin. Tew ev yekane nirxê wan bûya, dê ne îşê xweş bûya.

— Jêwergirana Carl Siger di Aimé Césaire, Gotar Li Ser Mêtîngehkarîyê

bihê kuştin. Xeta dojhê kurterê ne kendalekî erdnîgarî ye, lê pêştirî her tiştî kendalekî têgehî ye û, yek dikare îdia bike, axirî dema xwe berdaye zanista nijadperest û tîrnexurîya sermayedar.³ Ez hema hema li her derê pêrgî hêza xetê tîm her wekî belavkirina tundûtûjîyê, mafan, metirsîyê, kel û pelan, kedê, dewlemendîyê, mirinê, kursîyên li ber mêzekê yan jî li kelehên navîn ên kitêbxaneyan ên ku di domana vê xweçerçîranê de bi ser rûxarê dikevin.


Ji ber ku belge hemû ji sed salekê kevntir in, ez mereqa demê jî dikim. Îro, ku di 2019an de ye, ez li arxîvekê me, li ber mêzeke nivîsînê rûniştîme û çav bi dosyeyan dixim. Dema ku ev name hatin nivîsîn, ev der ji alîyê serbazên Prûsyayê ve hat bikaranîn; hindê ji wan tê heye ku bo mêtîngehan hatin şandin; paşê yekîneya paramilîter a li jêr fermana Adolf Hitler û Partîya Nazî rahênan kirin li nava û li dora dîwarên ku îro ro mazûbanîyê li min û li arxîvê dikin. Û wê hingê dem pê de pê de dibîşive, cî pê de pê de dişihite û ez dîsa bi vê peywendîyê dihesim: ev hemû ne bi text-bext e. Tundûtûjî li nava dem û dezgehên û sazûmanan tê berhembênan, şerê Macî-Macî û raperîna gettoya Warşowayê dest hilanîn li ber heman hizran, qurretiya kujende û tundûtûjîya dilxelên ku malê Almanayê ne. Avahî hê jî saxlem e wekî mazûbanîyê li arxîvê bike, hema 'eynî ku dem û dezgeh û sazûman hê jî li ser pêyan in, tundûtûjî neqedîyaye. Ev arxîv der barê îro de ye.

Arxîv gorrîstaneke e seba ku li vir li nava dîwaran, li binê zêmîn û di esrexê de jîyan veşartî ne. Lê jîyan, gîyan û delîv jî veşartî ne di dosyeyên arxîvê de, di dexlik û dolaban de ku rêçên mirinê digerin û cendekan dijimêrin. Heke ez bi micidî berê xwe bidime vê, xebata min a pê dosyeyên di arxîvê de dibe xebata payîna li ber serê mirîyan. Ev xebata payîna li ber serê mirîyan ne dawîyek e, lê destpêkek e.⁴

² *Tropenkoller* rewşeke bijîşkîyê ya qaşo ye. Ev rewş cara pêşîn di navîna 1890î de di peywendîya sosretên dadgehên ên li dora tundûtûjîya rapîr a li mêtîngehên Almanan de hatiye raportkirin. Hatiye gotin ku Tropenkollerê exlebe kar di mîrên Alman ên li seqayên tropîkal kirîye û ev yek hatiye bikaranîn ku bibe hincet bo jîdestdayîna bixwekarîne, tundûtûjîya cînsî yan jî ya der ji heddê xwe ya dîtir.

³ Boaventura de Sousa Santos, *Epistemologies of the South: Justice against Epistemicide* (Londra ve New York: Routledge, 2017).

⁴ Christina Sharpe, *In the Wake: On Blackness and Being* (Durham: Duke University Press, 2016).



Di paradayma sawêrî de, dem ne berevajîbar e, ne jî neberevajîbar e. Bi tenê kawdaneke ezmûnê heye. Bar û dox û qewam pêç bi pêç bi ser hev de vedibin. Heke çîrokan û qewaman destpêkeke xwe hebe, ne şert e wan dawîyeke hevgirtî hebe. Ew bi misogerî dikarin bêne vebirrîn. Lê çîrokek yan jî qewamek dibe ku di çîrokeke yan jî qewameke dîtir de her berdewam bibe bêyî ku şert be di navbera her duyan de hevnesebîyek hebe. Pêkdadan û têkoşan dibe ku li cîyên ew lê sekinî ji nû ve bêne destpêkin. Lê ew dikarin berejorî jêderkê jî bikişin, yan jî dîsa bêne destpêkin, bêyî pêdivîyeke hestkirî ji bo berdewamîyê, çî qasî sîya çîrok û qewamên kevn her tim li paş nihayê xwe telandibe jî. A rast, heman qewamê dikare du destpêkên xwe yên cihê hebin. Di nava qonaxê re, jîyana babetê dikare ji gihanekên zîyanê derbasî gihanekên dewlemendbûnê bibe. Her tişt li gorî rêsayeke netewawîyê dişuxule. Wekî encam, çu berdewamîya rêzkerî nîne di navbera nihayê, rabirdûyê û dahatûyê de. Û çu silsilet nîne – bi tenê vepejilaneke rêzeyên demî yên ku ji aliyê firehtexlîdîyeke tayên tenik ve bi fiêlî tene jêkvekirin û bi hev ve tene girêdan.

– Achille Mbembe, *Critique of Black Reason* (Rexneya Hişê Reş)



Amraz

BANGAWAZÎ BO SAWÊRAN DI ARXÎVAN DE

Şeweyekî bilîbûna bi belgeyên ku di arxîva kolonyal a Almanan de ez li pey im hevpeyvîn e li gel sawêran ku li wê derê vemane(1). Sawêr mirov û mexlûqên hestker ên dîtir in û her wisa bûn, bi şeweyekî şênbertir, ew ên ji me “yên ku hatine kuştinbarkirin, sawêran zemanekî ji zemanan û dahatûyê – ew ên hatine tinekirin, lê her wiha ew ên ku di her nifşî de têne heyîkirin”.(2) Sawêr di heman katê de li me radiselitin û rê li ber me dixin; ew dikin ku em bînine bîra xwe û rê didine me ku em xeyalê bikin. Zanyarên wek Avery Gordon, Achille Mbembe, Judith Butlerê, Athena Athanasiouyê, Eve Tuckê, C. Ree û yê dîtir em fêr kirin ku bi awayekî peywendîdarî bêmilkkirinê em sawêran bihesibînin – bêmilkkirina ku li vir tê famkirin wekî kesên ku kirine kêmi mirovî, li derî dîrokê hatine nivîsîn, ji mafên xwe bê par hatine hiştin, hatine kuştin.(3)


Di arxîvê de, sawêr bi dest xwe re hilgirên xofê, pê re ji hilgirên hêviyê ne. Redkirina sawêrî wekî bê ser û şûn bibe (bimire), doza wî ya bo tebayîyeke bi qasidîya ku nekuştinbar e û nikare bihê kuştin, demnameya dîrokê dixê tengasiyê. Redkirina mirinê bêmilkkirin e û tolvekirin e ji wan ên ku xwestine yekî heta bi hetayê binaxkirî bihêlin. Şopandina rîtmên bêzarker ên sawêran çêdibe alî me bike ku em jêrebirhên arxîvê, girêdanên wê yê seyr û dema jêkvebûyî zelaltir bibînin.

Hevpeyvîn gelekî bêtirî bi tenê axiftinê û guhdarîkirinê yan jî dan û standina ramanan e. Hevpeyvînek rê dide, wekî em jêwergiranê ji ektivist Grace Lee Boggsê bînin, “ku mirov dest pê bike hizrên nû û zimanên nû biafirîne.”(4) Hevpeyvîn navdêreke kiryarê ye. Ew amajeyê bi kirinê û nekirinê dike. Di hevpeyvîneke li gel sawêran de pêdivî ye yek rû bi rûyî kêşeyên rewîştî bibe ku peyda dibin ji

redkirina wekî bihêlin ku axa kesekê/î yan jî tişteki gul û nûr be. Gelo çawa mirov pîrsa razîbûnê ji sawêrekî bipirse?

Gelo çawa di arxîvê de mirov li gel sawêran dest bi hevpeyvînekê bike? Wateya destpêkirina hevpeyvîneke li gel sawêran pejirandina wê rastîyê ye ku yek tûşî raselitînê bûye. Wateya wê ew e jî, weku Sharon Patricia Holland me fêr dike, mirov cotebinemayîyên jîyanê û mirinê li nava hev bixe û bi micidî berê xwe bide wê yekê gişî ku miriyên qaşo der barê ximên jîyanên me de eşkere dikin – da ku miriyan vejînin.(5)

- (1) Lbnr: Amraz û Çalakî Di Xwîna Giran r. 33-51.
- (2) Eve Tuck & C. Ree, “A Glossary Of Haunting,” in *Handbook of Autoethnography*, eds. Stacey Holman Jones, Tony E. Adams, and Carolyn Ellis (Walnut Creek: Left Coast Press, 2013), 639-58.
- (3) Judith Butler & Athena Athanasiou, *Dispossession: The Performative in the Political* (Cambridge: Polity, 2013), 1-10; Avery F. Gordon, *Ghostly Matters: Haunting and the Sociological Imagination* (Minneapolis: University of Minnesota Press, 2011); Achille Mbembe, *Critique of Black Reason*, trans. Laurent Dubois (Durham: Duke University Press, 2017); and, Tuck & Ree, “A Glossary of Haunting.”
- (4) “On Revolution: A Conversation Between Grace Lee Boggs and Angela Davis,” (2 March 2012); online at: radioproject.org/2012/02/grace-lee-boggs-berkeley.
- (5) Sharon Patricia Holland, *Raising the Dead: Readings of Death and (Black) Subjectivity* (Durham: Duke University Press, 2000).





Çalakî

HEVPEYIVÎN LI GEL SAWÊRAN

Hûn dikarin vê çalakîyê bi tena serê xwe yan jî wekî komekê bikin.

-
- . Biryarê bidin li ser babeteke ku bi taybetî we eleqedar dike û xîtabî we dike, çi qasî ji we bê, ew qasî zêde pênase bikin sawêran ku li nik we tev in.
-
- . Nexşeyeke sawêran binivîsin/biafirînin, ên ku pêdivî ye hûn bi wan re bipeyivîn û zelal bikin çima. Amade bin ji bo sawêran dibe ku xwe di ber re bikin. Gelo hûn li wan guhdariyê dikin yan hûn hewil didin ku wan huş bikin û bi dût bixin? Çima?
-
- . Dema zêde biafirînin û cîgehekî bijibêrin ji bo ku hevpeyivîn lê bi rê ve biçin (hevpeyivîn dikarin çendîn caran bi rê ve biçin, lê bi têra xwe demê di navberê de bihêlin da ku hûn bihêlin her kesek bêhna xwe vede yan jî bi şûn de bê, heke pêwîst bibe).
-
- . Xwe amadeyî beriya lê piştî hevpeyivîna jî bikin (vexwarin, xurek, xweweşandina giyanî hwd.)
-
- . Hevpeyivîna bikin û, bi hevahengî li gel pênasekirina Boggsê ya der barê hevpeyivînekê de, bi dil û can bervekirî bin ku hûn bihêlin hûn bi xwe û hizrên we bêne guherandin.
-
- . Rîtûwelekê durist bikin ku hûn dawiyê nîşan bidin û ji bo sawêran dîyar bikin ku ew biçine dera ku pêwîst e ew biçinê û ji bo xwe dîyar bikin ku hûn bêyî wan wê derê bi cî bihêlin.
-



AFIRANDINA ARXÎV - EKÊ/AN

Arxiv û koleksiyon (a muzexaneyê) li ser navê zanista Ewrûpayê ya spî amajeyê bi bêmilkkirinê û dizîya peywendê, giyanan û obceyan û bi tundûtûjîya sîmbolîk a lêkvekirinê û bê-bipeywendkirina mêtîngehkar dikin. Ferz e ku berhingarî bihê kirin li arxîva ku wekî komeke amûran nîzamê, lêkvekirinê, têdebûnan û liderbûnan cî bi cî dike. Piştî ku demekê ez pê dosyeyên di arxivê de xebitîm û min dît çawa di van belgeyên bi awayekî fermî tomar kirî yê bédawî yê zordestîyê de ew pîrepîreyî bûne, min xwest wan ji wê derê derxim, wan kopî bikim/bizeliqînim û zêde bikim, bi posteran ve bikim, bikim ku ew bi berfirehî belav bibin. Lê ev bi kêrî kî tê?


Di kombûneke li gel koma me ya vekolanê de Dr. Tuck telle û tepikên “belavkirin”ê, pirsên etik ên ku tîni li gel derxistina wan nivîsaran ji peywendê bi bîra min dixê. Ev yek diqewime dema ku ez dîsa hizra xwe dikim li ser mebesta nivîskaran (ên ku ez nikarim ji wan bipirsim) û bervêderên ku di hişên wan de bûn. Ez li belgeyan hûr dibim û li nîşaneyan digirim, yê der barê bikarhatina niyazkirî ya di dahatûyê de ya van belgeyan de. Gelo ew dixwazin çî bi wan bihê kirin? Ez vê biryarê belge bi belge didim, li gel zanyarên û hunermendên ji derên name jê hatî ji bo şeweyên cîyawaz ên karîwerîyan wan ji xwe re wekî xaleke destpêkê hildidim. Gelo bi awayekî ji awayan name li gel wê derê diguncin? Ez berhevokan çêdikim û di peywenda axiftina bi Almanî de wan li hunermend, ektîvist û zanyarên Reşîk belav dikim. Ez dixwazim li dora mantiqa bêmilkkirinê bi hûrgilî bixebitîm û li vegêrranên li derî yê li ser “dîroka gerdûnî” bigirim.

Rû bi rûyî arxivên li ser bingeha hizrên mêtîngehkar ên berhevkerin û liderhiştin, lêkvekirin û bêhukimkirina “yên dîtir”, çawa “yên dîtir” hêzên xwe û giyanê xwe tevî hêzên û giyanê sawêrên hevrê dikin ku di arxivê de dikevîne binçengan? Çawa di rabirdûya dahatû de ew vegêrranan pêk tînin? Gelo peywendiyêke bi çî cureyî li gel obceyên û belgeyên keltorî gengaz e, dema ku ew ji aliyê sazûmanên wek arxivên û muzexaneyên Ewrûpayê ve hatibine hilanîn û zeftkirin? Ji bo min û yê dîtirên serpişk ên mayîni ên ku li navenda hêza mêtîngehkar dijîn ev karê li ser arxivên ku rêçên yê dîtir bi xwe ve girtine û hilanîne, ne der barê dereke din ye, yan jî, heke yek bi nexweşiya rizgarkerîya spî ketibe, ne ku çewtîyê rast bike. Na. Ew di rastîyê de navgînek e ku em di wateya livirbûn û nihaya xwe bigihîjin. Bi baştirîn ihtimalê ew sedemek e ku em çav bi hev bikevin û biaxêvin û bi gaveke pêştir bi dûr bikevin ji Ewrûpanavendîtîyên xwe hemûyan ên ku dena xwe didine me. Arxiv-ek/an rêyeke bînavendkirin û belavkirina wê hêzê ne ku bandora arxivê ye. Çawa em wan biafirînin wekî em pê dizanin ku, weku Sarr û Savoy wê li qelemê didin, “rûxan û koleksiyon du aliyên heman diravî ne”?(6) Bi hûrbijarî. Ne bi armanca tewawkirinê, lê bi armanca serîpêşandinê, ne bi armanca tomarkirina dîrokê, lê bi armanca berhingariya li vegêrranan, ne ku em hellsengandinên giştî bidin, lê em rûhevûnan sanahî bikin.

(6) Felwine Sarr & Bénédicte Savoy, *The Restitution of African Cultural Heritage: Toward a New Relational Ethics* (2018); erişim adresi: restitutionreport2018.com.

Dayîna pey vê mantiqa dirûn û hilanînê xût mandelekirina rêsaye keltorê bi xwe ye ku – li Ewrûpayê û li dereke din – di domana sedsalan de bi rêya veguhêz, veberhemhênan, adeptasyon, vekolan û mesxa zanyarîyê, bi rêya şeweyên û obceyên rast li nîveka civakê tê heyîkirin û tê veheyîkirin. (...) Rûxan û koleksiyon du aliyên heman diravî ne.

– Felwine Sarr & Bénédicte Savoy, *The Restitution of African Cultural Heritage* (Lixwevegera Kelepora Keltorî ya Efrîqayê)



Çalakî

LIDARXISTINA KARGEHEKE LI SER ARXÎV-EKÊ/AN

SERDESTPÊK

- . Plana nexşe/plan û bernameyê.
- . Serdestpêka hêsankara/ê û beşdarên kargehê bi raveyêke kurt a der barê tiştê ku serinca wan dikêşe der barê berhevkirinê/axîvkirinê de.

PEVGUHESTIN

- . Pevguhestin der barê ezmûnên peywendîdarî berhevkirinê/axîvkirinê de (her wiha bo nimûne diwarên Instagramê dikarin bibine axîvên dîtbar) û der barê ezmûnên peywendîdarî koleksiyonên/axîvên heyî de

NEXŞEDANÎN

- . Berjewendiyên hevbeş û ne gelemperî di nav wan de dîtbarî û axîvên virtual, pratîkên hunerî, mijar, û hwd.
- . Sertaserê rojê veşerî ser nexşe/planê û pêwendîyan zêde bikin.
- . Babet, têma, fikir û referansên (ne)hevpar bişopînin û bikin belgenamê.

Çalakî

ŞÊWR

- . Berawirdî axîvkirinê, axîv-ek-kirin çi ye?
- . Ev cihêti peywendîdarî babetê ye, nemaze dema ku behs tê ser etîkê u estetika
- . Li nimûneyên axîvkirin mêze kirin (li amade kirin pêşkeftin ji hêla hêsankar).

ŞAYESANDINA OBCEYEKÊ

Ev rahênan ji Eve Tuckê hatiye wergirtin. Beşdar obceyêke di nava xwe de didine hev û din; gava ku obce di dêst de ye û lê dinihêre, her kesek wesfekî beyan dike ku ew bikaribin qala obceyê bikin wekî ne zêde diyarêker be, ne jî wê kêmbike (ji çu hevbeşiyê û çu darazê re destûr nîne).

RAHÊNANEKE NIVÎSÎNA SERBEST

Heke çu sînardarkirin nebûya, gelo axîv-ek-a we dê bişibîya çi? Ew bi kêrî çi tê? Ew kîjan kereseyan digire yan jî berdide? Çawa, çima û ji bo kê? Gelo ew kerese ye/dicîtil e? Gelo belavkirin û şêwr çawa tê birêxistin? Armanca wê çi ye?

Çalaki

GOTÛBÊJ

Raçavkirina mînanan û xwedan arxivên (îdeal):

- Ew çi ne, çawa û ji bo kê ne?
- Ew çawa têkiliya navberê dîkin materyal, afirîner û bikarhêner? Ya ku di nav de deng vedide pratîk an daxwazên we?
- Duristkirina arxivê ne tenê derbarê naverok/fokûsê û cûdahiya di navbera tiştên peywendîdar (di koleksiyonê de) û nepeywendîdar (derveyî koleksiyonê) de ye, herwiha biryarên derbarê sazûman û estetîkê de jî pêwîst dibîne. Xalên din yê gotûbêjê: Hûn dê arxîva xwe çawa pêşkêş bikin, belav bikin û rêk bixin? Hûn boçûn- yê ku reng e tundûtûjîyê di hundurîn- û tecrûbeyên çawa (ve) berhem tînin? Mirov çawa di nav kategorîzasyon, xweyanîkirin û kronopolîtîkê de digere? Li şûna ku naverok/materyalan bînin çalkirin, mirov çawa dikare qadan (qadên demkî) biafirîne?

ŞÊWR

- Şewra kurt li ser biserûberkirinê/bireferanskirinê, nemaze ji layê etîka lêkvekirinê ve.
- Şewra kurt li ser rûtînan, berhevkirina bêyî armancekê, vegekirina li kerseyî, hizirîna bi û bi rêya koleksiyonên vekirî.

XÛLA KUTAYÎYÊ Û FÎDBEKÊ

- Firsên/ramanên/hizrên ku derketine mexderê, tiştê ku bandorek hêlayî
- Xweamadekirina bo careke din: axiftina der barê hedefên û daxwazên ji bo kombûneke din a gengaz

BERHEMÊN HUNERÎ

Pêşniyazî ji bo çalakiyê “Hevpeyvîn li gel Sawêran”:

- Kazeem-Kamiński, Belinda, artist. 2017. *Unearthing: In Conversation*. HD video, 13”.
- Heinowsky, Walter and Gerhard Scheumann, directors. 1966. *Der Lachende Mann: Bekenntnisse eines Mörders* [The Laughing Man: Confessions of a Murderer]. Film, 66’, East Germany.
- Mabouna, Moise Merlin & Brigitta Kuster, artists. 2006. *2006–1892 = 114 Years* (DV video, 7’ loop).
- Savvy Contemporary, Berlin. Colonial Neighbours (participatory archive & research project). Online at: savvy-contemporary.com/en/pillars/colonial-neighbours.
- We Are Born Free. Empowerment Radio. Ongoing radio program. Online at: wer.oplatz.net.

Pêşniyazî ji bo çalakiyê “Afirandina Arxiv-Ekê/an”:

- Kazeem-Kamiński, Belinda, artist. 2019. *The Letter*. Video.
- Each One Teach One (eoto) e.V.; initiative in Berlin. Online at: eoto-archiv.de.
- Hoffmann, Anette, Matei Bellu, and Regina Sarreiter, artists. 2012. *Unerhörter Bericht über die deutschen Verbrechen in den kolonisierten Gebieten und über das fortwährende Wirken der Gewalt bis in die Gegenwart*. Installation.
- Jafa, Arthur, artist. 2018. *Matrix 272*. Video installation.
- The Black Archives; initiative in Amsterdam. Online at: theblackarchives.nl.
- Gates, Theaster. *Black Archive*. Exhibition. Kunsthau Bregenz, 23 April – 26 June 2017.
- Vitjua Ndjiharine, artist. 2018. *Ikonowall/ Mirrored Reality*. Digital print and mirror film.

JÊDERKÊN VESER

- Campt, Tina M. *Listening to Images*. Durham: Duke University Press, 2017.
- Césaire, Aimé. *Discourse on Colonialism* [1955]. New York: Monthly Review Press, 2000.
- Mbembe, Achille. *On the Postcolony*. Berkeley: University of California Press, 2001. — *Critique of Black Reason*. Durham: Duke University Press, 2017.

CENERÎK

Paperlands, xebata Janine Jembere, 2020. Wêneyên û fotrafên di vê beşê de hemû: berhêhênanevêya bexşa hunermend Janine Jembere û Bundesarchiv Berlin. Malavayiyên taybet bo koma vekolanê FWF/PEEK “Bê/Milkirin: Estetîka Pişt-Beşdar û Pedagogiya Xakê.”

QEWÎNÎYA CIRBOQÊ BIKÎS



Dema ku deranîna puxteyê radibe ser zîn
 Di dilqê marekî de were
 Bila gurregurra te esmên bipelişîne ji xwe re
 Bila hûr û pizûrê dinyayê bilerize pê re

Naomi Rincón Gallardo

Oaxaca, Meksîko

Berevajîyî pabendîyeke lihevneker a bi rabirdûyê ve, tiştê ji bav û kalan mayî ji jêderka bîrhatîyeke zindî dizê ku ahengê dabîn dike li gel şîyana ku dahatûyeke cîyawaz texeyyul bike – texlîdekî “dahatûyî”yeke ku tesewwurê dike û tê dikoşê ji bo, mercên ku dê rê bidine wan da ku wekî cîhaneke bi serê xwe bi pêdagirî li ber xwe bidin.

— Arturo Escobar, *Thinking-Feeling with the Earth* (Hizirîn-hestkirin Bi Axê)

Her cara ku ez vedigerime Oaxacayê, ez vedigerime ba wê. Ew min diweşîne û pak dike. Ew devê xwe bi mezkalê tijî dike, wê danaqurtîne. Di dewsê de, ew wê dipilqijînîne, dipeşkinîne ser laşê min ê niv tazî. Ew dibêje, mezkal enerjîyên li der û doran dilivîne. Ez hest bi tezetîya li ser çermê xwe dikim û hilm û gulma wê min gêj dike. Paşê ew hildide bi baqekî filfilan, beybûnên zer û rihanana çermê min difirikîne. Ew wî baqî didewsîne ser cênîkên min û qefsînga min. Dîsa, pê mezkalê ew min dişo. Çavên min girtî ne. Ew hêkekê di tevayîya laşê min re derbas dike. Ew hêkê dişikêne, wê dixwe nava îstekaneke avê û wê dixwîne. Piştî weşandinê û pakkirinê ew min dike bêhnvedanê. Paşê em dikevîne temaşeya roja ku diçe ava û li berbanika wê dîsa dikevîne mijûlayîyan.



Oaxaca parêzgehek e ku li başûrê Meksîkoyê ava ye. Di gel mantiqên mêtîngehkarîya navxweyî ya neteweyî, ji cure bi cure gelên Xwecî re meyser bû ku bi sedan salan bi rê û dirbên niv-xudmuxtar ên qanûnên Xwecî bidin û bistînin û bijîn. Şarevanî bi pirranî bi şêweyê *usos y costumbres* tên birêvebirin, wate, şêweyekî qanûnên dab û nerîti yên ku tevkarî lê kirin wekî rêzik û sepanên Xwecî ta astekê serbixwe ji dewletê bên domandin.¹ Polîtîkayên neolîbîrîl ên di 1990an de guheranek bi qanûnê re çêkirin ku *ejidos* kirine ber lepên xwemalîkirinê, pê re jî sazî û dezgehên kişawerzîyî yên ku ji aliyê dewletê ve dihatine şuxulandin ji hev belav kirin. Bêahengîya li zêdebûnê ya ku ji naskirina mafê çarenûsî yê gelên Xwecî dizê, ku pê re jî bi rêya karnameyê bere bere zêdetir ekstraktîvîst milkîyeta xakên wan dewir dikin, li herêma Meksîkoyê, nemaze li Oaxacayê, rê li ber birrek pêkdadanên civakî-jîngehî vekir.

Êdî ev bûye bêtirî deh salan, çî ji bo ku di projeyên nesazûmanî yên peywend-navendî yên perwerdeya hunerê de bixebitim, çî jî ji bo ku serdana hevalên delal bikim, min çendîn caran serdana Oaxacayê kiriye. Vê carê, vekolana hunerî ya li ser çîrokgotina di peywendên bêmilkkirinê de bû ya ku ez bi şûn de birime wê derê. Havîna 2018an, min ektîvîsteke Zapotek

¹ Qewîniya Cirboqê Bikîs, Naomi Rincón Gallardo, xebata Claudia López Terroso, 2019

¹ Isabel Altamirano-Jiménez, "Indigenous Movements," Wiley Online Library (2017); doi: 10.1002/9781118430873.est0675.

nas kir ku berevaniyê ji xakê dike. Ji bo ku ez nasnameya wê veşêrim, ez ê ji navê wê re bibêjim, Xatûn Leven. Ji ber hevkarîyên xwe yê li gel rêkxiraweyên li dijî ekstraktîvîzmê û li gel komên feminîst î dîkolonyal, Xatûn Leven gelek caran ji şaroçkeya xwe diçe Bajarê Oaxacayê. Cara pêşîn ku me rû bi rû hev dît, li ber derîyê mûzexaneyekê me hev û din dît. Di destên wê de nexşeyên projeyên kangerîyê yê li herêma hebûn, ên ku ji aliyê projeyê nexşesazîyê ya rexneyî ya li Oaxacayê ve hatibû çapkirin. Wê hilda nexşe nîşanî min dan ku projeyên kangerîyê yê li seranserê herêma Oaxacayê nitirandibûn.

Dema ku em her du dibêjin, “xak”, du gerdûnên cîyawaz ji hev vedibin. Xatûn Leven xakê bi şêweyekî peywendîdarî jîyana civatê ya di nava rêzikeke zal a rewşa beranber de dişayesîne: jîyan li dora werçerxên xakê û baranê tê birêkxistin û cejn van çemberan dîyar dikin û digêrrin. Bi tundî dij bi vê yekê, bajarê Meksîkoyê, xaka ku ez li ser mezin bûm, li ser jinavbirina şaristanîya Meksîkayê ya bi destî mêtîngehkerên Spanyol hat damezirandin, qonaxeke ku pergala kişawerziyî ya bi şêweyekî zanayane pîlankirî ya giravên serav fetisand ji bo ku serdestiyê li ser jîyanên gelheya binecî bi serkeftî encam bidin. Deryaçeya binaxkirî bûye cinawireke asfaltkirî, navendîkirî û mexdera nifûsgiran a ku bêedebanetirîn cîyawaziyên civakî-aborîyî bi nerênîyê hov a çu peywendîyî li gel siruştê li hev kom dike. Tundûtûjîya mêtîngehkarîyê li her derê dikulle. Di gel vê hindê, li komebajarekî wek Meksîkoyê jî, rêçên şêweyên girêdana kombendîyê û civatê yê ku peywendiyên kartêker û heyîna bedenî di pêş kar û sûdê û takekesîyê re digirin hê jî zindî ne.

Gelên Xwecî, yê ku ji ber destê hovîyên bêtirî pênç sed salan sax filitîne, hê jî xwedanên zerengîyê kûr û dûr in wekî bi awirê demdirêj pê bûnewerîyê hêdî bijîn ku xwe dispêre şêweyên rewşa beranber, di kîjanê de girêdanên rêkxistina civakî tev alizî ne li werçerxên siruştê. Li Emerîkaya Latîn, vebijarka ji bo peypêbirineke firehgerdûnî ya der barê jîyanê û cîhanên peywendiyî de bûye şerê man û nemanê di vê qirnê de, ku taybetîya wê ya vavêrker pêleke nûkirî ya sermayedarîya nijadî ya neo-konservatîv û hetero-baviksalarî ye, pê re jî qonaxên tundûtûjîyê paramilîterîzasyonê, rêzek derbeyên serbazî, firehbûna erdnîgarên tirsê û şêweyên îvancelîzma neolîbiril tîne. Zanyarîyên ku jêderka wan keltorên Mezoemerîkan e hêza veşarî hildigirin ku pak û nû bikin civakeke birînxedar a li nava çerxa zîyade jandar a şêweyên kapqetandî yê şerê nefermî yê ku Meksîko di tevayîya van deh salên dawîn de lê tûş bûye. Ji ber wê yekê, di parastina jîyaneke cîyê rûmetê û şadîyê de berxwedanên Xwecî bûn cînumayeke rewîştî û kar û xebateke geş û gurr a kombendî.

Demên em bi hev re dibezîyan ku em xwe li cîyekî bigirin ji ber bahozên havînê yê şilî-şepelî yê ku ‘ecêba

giran ji nişkê ve radibûn û paşê betave dibûn, di çend pêrgîhevhatinan de tiştê Xatûn Leven û ez nêzikî hev kirin. Carinan li ber germa çil û tiştê derece, em di xwêdanê de bûyî behr, me hev didît, em bê mefer li barekê digerîyan da ku bîraya cemidî vexwin. Min bes hevpeyvîna me ya dawîn tomar kir. Xatûn Levenê qayîlîya xwe da dema ku min rezadîlîya wê xwest wekî projeyê duristkirina cîhanekê rewayî wê bikim.

Dema ku kompanîyê kangerîyê ya Kenedayî li şaroçkeya wê kanek vekir bêyî ku bi civakê bişêwire, Xatûn Leven tevî berevaniya xakê bû. Bi hevtawanîya rayedarên dewletê, kanê xak û ava civakê rapêç kir, wekî din jî, jîngeh gemarî kir. Civakê kombendek pêk anî da ku herêma, pêşî ji bêmilkkirina dengên xwe, paşê ji bêmilkkirina herêma, biparêze. Bi hevtawanîya rayedarên deverî yê gendel, kompanîyê straticîyên xwe yê dabeş-bike-û-bi-rê-ve-behereyê cîgir kirin: komên şokê yê çekdar da ku berxwedanê tîk bişikênin, bertîl, destgîrkin û her wekî din. Tundûtûjî zêde û dijwar bû. Şevekê, gava ku bi seyareya xwe vedigerîyan şaroçkeya xwe, Xatûn Leven û hevalên xwe yê xebatê ketin kemînê. Di êrîşê de yek ji wan mir. Gulle li çîp û sermila Xatûn Levenê ketin. Tevî îsal, qonaxa pakbûnê bêtirî şeş salan kişand. Di yek ji dembihêrkên me de, wê gote min wekî dema ku hinek ji zewalê bifilitîyana û berxêr bibûna, xelqê li herêma bo wan kesan digot, *tlacuachitos* (cirboqên bikîs î biçûk). Çîrokên afirînê yê Mezoemerîkan statûya nemirîyê dibexşînine cirboqên bikîs, ji ber ku wan zerengî heye ku xwe li mirîyê daynin û bivejin.

Qewîniya Cirboqê Bikîs vegêrrana çîrokên fenteztîk ên mîten Mezoemerîkan ên bêjîkirî ye ku tê de çar qereqter – Girek, Cirboqekî Bikîs, Xatûn Leven û Agaveyê Çendeçîkî – di demkîtîyan de rastî hev tîne ku ev demkîtî çîrokên afirîna cîhanê û têkoşanên hevçerx ên li dijî bêmilkkirinê yê li herêma



Di zorîneya mîtolocîya Mezoemerîkan de, cîhan wekî cîyekî pîroz xuya dibe. Cîhan xwedawendekê bijûndar e. Ew cîyek e jî ku xeter û nepakî dikarin bêne serê mirovên ku li ser dijîn. Cîhan cîyekî xilîsk û zehf xeternak e. Ew di nava dumendîya klasîk a pak û nepak de tê sêwirandin. Wekî bûnewereke rasersiruştî, nisbet bi kir û kiryarên we, ew dikare zîyanê yan jî sûdê bigihîne. Marcosê cîgirfermandeyê şî'rî yê EZLNyê wê yekê bi vî awayî derdibirre: *Y estos indígenas vienen a decir que la tierra es la madre, es la depositaria de la cultura, que ahí vive la historia y que ahí viven los muretos* (Û ev gelên xwecî tînen bibêjin ku ev cîhan dayîk e, ew malzaroka ferhengî ye, di wê de dîrok dijî û di wê de mirî dijîn). (...) Bi peyvên Comandanta Estherê, cîhan jîyan e, siruşt e û em beşek ji wê ne. Ev derbirrana asan amajeyê bi pêkvegirêdayîbûna tevayîya bûnewerên di Kozmoza Mezoemerîkan de dike. Nabe ku bûnewer ji yek û din bînen cudakirin. Ev rêsayê serekî bi şêweyekî hevger di nava pergalekê bijîşkîyê yê xwecî de û her wiha di nava jêderkên seretayî yê mêjûyî yê pêşîn de hatiye peydakirin. Ev rêsa şêweyekî pirr taybet ê kombendîya mirovî pêk tîne, hema hema bêyî çu takekesbûnê. Cîhan ne li derên hanê ye, ne ku ava ye li derveyê, û dûrî, mirovan. Ew di nava wan de ye û hetta “di” wan “dipere”. Çênabe ku “ez” ji derdora xwe bihê goşegîrkin. Têperanbarîya cîhana “madî” ya yekpare nîzameke bûnewerîyê pênase dike ku taybetîya wê ya vavêrker bihurana berdewam a di navbera ya madî û ya manewî, hundir û derve de ye.

— Sylvia Marcos, *The Borders Within* (Tixûbên Li Hundir)

Oaxacayê ser di yek de dibin. Di gel qonaxên tundûtûj ên ekstraktîvîzmê, Gir, Cirboqê Bikîs, Xatûn Leven û Agave têne ba hev da ku ji kêfan bixeriqin û cejnê misoger bikin û pîroz bikin serfirazîyên peşkî yê li herêmeke ku kangerî qedexe ye.

Di kozmolocîyên Mezoemerîkan de, gir cîyên pîroz in, ji ber ku ew warên jêderkên avê ne, robar û şikeftên binerdî pêk ve girê didin ku rêtêberîya bo dîyarê mirinê dabîn dibin. Cirboqê bikîs wekî yezdanekî tê zanîn ku êgir, titûnê û alkoholê didize da ku wan pêşkêşî mirovan bike. Agave peywendîdarî Mayahuela xwedawenda gelê Nahua ye, tê nimandin wekî jîneke ku ji agaveyekê de tê mexderê. Mayahuel yezdaneke adanîyê ye û çar sed çîçikên wê hene. Di kelepura Mîxtekan de, Xatûn Neh Leven xatûnek e ku marên bi porê wê ve honayî li sêrî ne. Kêr bi wê re hene wekî pelên agaveyan qut bike.

Di Qewîniya Cirboqê Bikîs de, Gir çîrokbêjek e ku govanîyê dike û çîrokên van demkîtiyên sertêkdeçûyî dibêje. Babeta çîrokê ya mîti bi sehneyeke mîlmîlî ya şevî ya mêrdezimeyî vedibe ku dîmenên bergeheke siruştî ya guherî bi nava hev de qut dike li gel dîmena girê li ber gurregurrên stroboskopîk.

Yo soñé con los nagueales
Porque ando eriza de ancestros
Ante los planes siniestros
De las zonas especiales:
Conflictos territoriales,
Extracción rapiñadora
¡Yo te invoco protectora,
Ven en forma de culebra,
Que tu trueno el cielo quiebra
Con su fuerza vengadora!

Min di xewna xwe de *nagueales* ditin
ji ber ku ez bi hesreta bav û kalan im
Çi qasî jî li dar be pîlana bêqidoş
A herêmên taybet ên aborîyî:
Pêkdadanên herêmî,
Puxtederanîna tîrnexur
Ez gazî te dikim, ax Nîgehdarê,
Di dilqê marekî de were,
Bila gurregurra te esmên bipelişîne ji xwe re,
Bi hêza xwe ya tolhildêr!



Cirboqê Bikîs li agaveyê digere da ku bi alîkarîya Xatûn Levenê *pulqueyê* (puxteya agaveyê ya bialkohol) bi dest bixe. Li ser rêya wê, Cirboqê Bikîs tiştan hemûyan didize, yên ku ew, dundeyê wê li pey, li ser rêya xwe peyda dike. Xatûn Leven radihêle perenda xwe da ku pelên agaveyan qut bike.



¿Cuál será aquel animal
Que en figurilla de barro
En el pecho lleva flores
Y en la trompa un torzal?

¿Qué criatura trepadora
Roba el fuego con su cola
Traza el curso de los ríos
Y aparece con la aurora?

Ponle un jarro de aguamiel
Pa que venga y se emborrache
En los tiempos de despojo
Que no haga falta el tepache
Aticen todos los fuegos
¡Y que regrese el tlacuache!

Kî ye ew ajela ku,
Wekî dilqekî axesork,
Kulîlkan bi qefsînga xwe de
û werîsekî bi bêvîla xwe de dike?

Kîjan mexlûq e ku radipelike
û pê terrîya xwe êgir didize,
rêça şiverêyên robaran digerîne
û bi hilhatina rojê re xwe nîşan dide?

Cêrek *aguamiel* (lîkora hingivî, n.w.)
Dayne ku bike wekî ew bê û serxweş bibe.
Di demên bêmilkkirinê de
bila *tepache* (vexurkeke Meksîkîyan, n.w.) kêm nebe.
Agîran gişan geş bike.
Da ku cirboqê bikîs bêve!

¿Cuál es la especie nativa
Dos úteros y vaginas
Cuya cola curativa
Cavidades desopila?

¿Cuál será el mítico ser
Que con sus crías al lomo
Se hace el muerto, aguanta golpes
Para después renacer?

¡Ponle un jarro de aguamiel!
Pa que venga y se emborrache
En los tiempos de despojo
Que no haga falta el tepache
Aticen todos los fuegos
¡Y que regrese el tlacuache!

¿Quién es ladrona mañosa
Con manitas de persona
Que deguella las gallinas
Por su sangre deliciosa?

¿Cuál es aquel marsupial
Dueño frío de la noche
Que en su panza de costal
Guarda tabaco y mezcal?

Kî ye ew texlîdê zindîyan ê binecî yê ku du malzarok
û vacînayên xwe hene,
terrîya şifabexş a kîjanê
berqefan vedike?

Ew candara efsaneyî ya
ku zarokên xwe li ser piştê xwe digerîne,
xwe li mirinê datîne, dide zîtikan da ku paşê ji nû
ve ruh pê de bê.

Cêrek *aguamiel* dayne ku bike
wekî ew bê û serxweş bibe.
Di demên bêmilkkirinê de
bila *tepache* kêm nebe.
Agîran gişan geş bike
da ku cirboqê bikîs bêve!

Kî ye ew dizê fisgenî yê
ku destên xwe yên mirovan hene
û ji bo xwîna wan a tehmîxweş
mirîşkan şerjê dike?

Kî ye ew ajelê bikîs,
xwedîyê xwînsar ê şevê yê
ku di zîkê xwe yê tûrikmanî de
titûnê û *mezkalê* hiltîne?



Agaveya Çendeçîkî tê xuyanê wekî dilqê dilrevîn ê ku dilgeşîyê,
dansê û rêtêberîya bo cîhaneke sermestîyê dibexşîne kesên din.
Agave bi rapirî ber û fêqî girtine, madeyên bîyanî tevî wê kirine
û zor danê ku bibe berhema kişawerzîya yektexlîdî.

Déjame ablandar tu cuerpo
 Yo te ayudaré a llorar
 Niño otra vez te volverás
 Ya no serás individuo
 Sacando eructos y pedos
 Irradiarás puro cariño
 Te acordarás de tus muertos
 Te despojarás de tí mismo
 Fermentos sacramentales
 Hígado luminiscente
 Te diluirás dulcemente
 Abriéndote a un caos profundo
 De intoxicantes rituales
 Cachondo mareo rotundo
 Fuerzas sobrenaturales
 Te harán viajar a otro mundo
 Mi tierra esta amenazada
 Forzada al monocultivo
 Por el empresario altivo
 Cuyo credo es el capital
 Mi sangre sobre-explotada
 Antes era medicinal
 Hoy hiper-fertilizada...
 ¡Han gentrificado el mezcal!

Bihêle ez laşê te nerm bikim.
 Ez ê alî te bikim ku tu bigirîyî.
 Tu yê dîsa bibî zarok.
 Tu yê nema bibî takekes.
 Tirran bikî û qirpik bêne te.
 Tu yê şewl û şîqava 'eşq û arezûya xwerû bidî.
 Tu yê mirîbûna xwe bînî bîra xwe.
 Tu yê xwe ji milkê can û cesedê xwe bikî.
 Haveynên pîroz.
 Kezeba ku diçirûse.
 Tu yê bi xweşikî ron bibî.
 Xwe vekî bo kaoseke kûr a ritûwelên ku serî xweş
 dîkin.
 Sergêjîya biçingeçing a hilorî.
 Hêzên rasersîruştî.
 Dê te raguhêzine cîhaneke dîtir.
 Gefan li xaka min dixwin.
 Zorê didîne ji bo ku bibe warê kişawerzîya yektexlîdî.
 Karsazê ku şûr simbêla wî nabirre zorê dide wê, ew ê
 ku atqata xwe sermaye ye.
 Xwîna min a ku lap hatiye mêtin
 berê darû û derman bû.
 Îro wê bi rapirî ber û fêqî girtine.
 Mezkal hat tovrindkirin!



Gir tîne dereve dike, qala kemînekê dike ku lê xebitî ji ber
 çalakbûna wê ya di parastina xakê de Xatûn Levenê bikuje.

Wan da pey wê û xwe gihande wê, wan li ser xaçerêyê
 ew kire kemîne. Wan hewil da wekî kuçikê wê vemirînin.
 Wan hewil da wekî li wê bireşînin û wê bikine parî û piçik.
 Ji wan hebû ku wan kir jî. Wê xwe bi mirîtî avêt, wek
 cirboqê bikîs. Bi çûyîna ku ew ji wir çûn, wê parî û piçikên
 xwe yên çerm, yên por, yên dil, yên her tiştî, solên xwe
 yên werzîşê, pantorê xwe yê kot, çîpa xwe, her tişt dane
 hev. Wê hilda her tişt dîsa danîve cîyê berê û 'ediland. Bi
 hatina ku ruh bi wê de hat, wê xurttir hest bi xwe kir.

Cirboqê Bikîs Xatûn Levenê fêr dike çawa xwe vejîne. Xatûn
 Leven qeysikan dide binçengên xwe û pê berdewam dibe di
 Şikeftê de direqise.



Naciste bajo ciclos de lluvias constantes
 Temporadas de siembras y cosechas regulares
 Creciste bajo un manto de saberes ancestrales
 Un mundo ordenado por las fiestas patronales
 Aprendiste a usar la yunta y pastear al ganado
 Sembrando calabaza, maiz, frijol, garbanzo
 Te formaste rodeada de estructuras agrarias
 De ejidos y de tierras comunitarias
 Enmedio de asambleas, decisiones colectivas
 Organización apartidaria para gestionar la vida
 Tus padres te inculcaron el amor por la tierra
 ¡Por eso la defiendes en tiempos de guerra!

Tiempos de guerra llamada despojo
 Catástrofe ecológica en disfraz de desarrollo
 Empresas extractivas contratando sicarios
 Destrucción a sangre y fuego de mundos milenarios

Tu li ber werçerxên berdeyam ên baranê ji dayîk bûyî.
 Werzên tovreşandîn û paleyîya birêkûpêk.
 Tu di binê qapûtê ji bav û kalan mayî de hatî gihandin.
 Cîhaneke ji alîyê cejnên qencên Xwedê ve saz kirî.
 Tu fêr bûyî nîr bi kar bînî û dewêr xwedî bikî.
 Çandîna kundirê mîranî, garis, fasolîyan, nokan.
 Dem û dezgehên kişawerzîyî, ejidos û tebeqeya gel bi te wer hatibûn.
 Li nava meclisan û biryarên kombendî,
 rêkxiraweyên bêyî partîyên polîtîk,
 da ku jîyanê bi rê ve beherin.
 Dê û bavê te tu fêr kirî ku tu hez ji xakê bikî.
 Ji ber wê yekê ye, di demên şer de tu berevaniyê ji wê dikî!

Demên şer ên bi navê bêmilkkirin.
 Bobelata êkolocîk a ketî dilqê geşedanê.
 Pişesazîyên ekstraktîv qesasan bi kirê digirin.
 Edemkirina xwîna û agirê cihanên hezarsalî.



Los chismes se esparcieron creando confusión
 Visitas aisladas, fases de exploración
 Contubernios corruptos con las autoridades
 Concesiones sin consulta a las comunidades

Te uniste a la brigada para tomar la mina
 Llevaron tinaco, cobijas, cocina
 Como los compañeros se iban a trabajar
 Cerca de cien mujeres fueron a ocupar

Gilî û gotin belav dibin, xelqê dixapînin.
 Serdanên xef, xûlên kifşê.
 Tertîbên gendel bi rayedaran re.
 Serpişkîyên ku dibexşînin bêyî ku bi civakan bişêwirin.

Tu tevî alayîyê bûyî da ku kanê dagîr bikî.
 Tu tevî alayîyê bûyî da ku kanê dagîr bikî.
 Te tankeke avê, betanî û medbexeke seyar anîn.
 Ji ber karên hevrêyên we yên mêr, devîdevî sed jinan kan dagîr kir.

La policía estatal llegó a desalojarlos
 Helicópteros y perros, elementos armados
 Carros antimotines, detenciones arbitrarias
 Despliegue coercitivo para intimidar la banda
 Tiempos de guerra llamada despojo
 Fuerzas paramilitares forzando el desalojo
 Cinturones estratégicos, zonas especiales
 Depredación masiva de bienes naturales

Frente a las amenazas y represión abrumadora
 Se juntaron para formar la coordinadora
 Gestiones para el pueblo
 Brigadeos de información
 Animar con festejos el espíritu de organización
 Pusiste ahí tu tiempo, energía y pensamiento
 Tu presencia y voz encendieron el firmamento
 Joven mujer indígena defensora de la vida
 Constelación de fuerzas tejiendo alternativas
 Una noche de regreso en un cruce de caminos
 Rafaguearon su nave un grupo de asesinos
 Uno de tus compas cayó en el atentado
 El coche en el que iban terminó destrozado

En estos tiempos de guerra llamada despojo
 Tu sigues de pie resistiendo con arrojo
 La herida de tu pierna memoria del agravio
 Sigue irradiando rabia y deseo libertario

Polêsên parêzgehê hatin ku we ji wir derxîn.
 ‘Elîkoptêr, kûçîk, karwanên çekdar.
 Seyareyên tepeserkirina serhildanan, destgîrkirinên kêfî
 Zext û fişara ku bi rê xistin da ku tirsê li mirovan bifirînin.
 Demên şerekî bi navê bêmilkkirin.
 Hêzên paramilîter ên ku mirov bi darê zorê derdikirin.
 Xetên straticîk, herêmên taybet.
 Rûxana mezin û giran a dewlemendîya siruştî.

Di gel gefan û zordestîya şepirzeker
 Hûn li hev civîyan da ku kombendê pêk bînin
 Birêvebirina jêderkan ji bo xelqê,
 alayîyên saloxgêrîyê,
 Xweşkirina beşera ruhê kombendî bi partîyan
 Te dem, şîyan û hîzra xwe tev kirê
 Amadebûna te û dengê te ronahî da sêla esmanî
 Jina xwecî ya ciwan a ku berevanî ji xakê dikir.
 Komên hêzan alternatîv saz dikirin.
 Şeveke dema ku hûn vedigerîyane malê.
 Komek qesasên kirêkirî seyareya we kire kemînê.
 Di êrîşê de hevaleke te ya xebatê mir.
 Seyare têk de hat rûxandin

Di demên şer ên bi navê bêmilkkirin de.
 Tu hê jî li ser pêyan î, bi dilêrî li ber xwe didî.
 Birîna çîpa te – yadgareke tajangê ye
 ku şewl û şîqava xezebê û vîyana azadîxwaz dide



Amraz

MÎTÊN BÊJÎKIRÎ JI BAŞÛRÊ GLOBAL

Cîhanbîniyên Mezoemerîkan demê wekî girovkên sertêkdeçûyî, her-guhêrbar û werçerxî şirove dikin. Di şî'r û rewanbêjîya Mezoemerîkan de, her risteyek bi guheranên sivik tê dubarekirin, ku rê li ber dubareya hizrekê yan jî hestekê bi awayên cîyawaz xweş dike. Zêdeyîya nepêdivî û dubareya metaforan rê didine ramanekê ku bibe çalak, tewawker li şûna ku bibe nelê, dihêlin ku bibe hevkat, herkoyî û di mutasyona mandegar de be. (1) Di cîhanbîniyên Mezoemerîkan de, her takebûnewerek tê vejandin; ew jî heyînekê dimesixe û diçe ser yeke dîtir. Jiyan "çermên" cîyawaz werdigire û di nava kozmozê de bûnwer di pêkvegirêdanên herkoyî de ne.

Mît û çîrokên afirînê yên li Başûrê Global govanîyên dewlemend û girift ên sazûna dêrîn a ramanan û sîmbolîzman in. Qereqterên der-mirov pê qasidiya tam û tamam cîhanên dêrîn î firehgerdûnî dikine wargehên ku tê de muxeyyelên hilhatî yên pêkvehebûnê pabendîya beranber a bûnwer û qewamên cîyawaz ên di kozmoza makro û mikro de dişayesînin. Di gel epîstekujîya mêtîngehkar, ev cîhanbîni bi şeweyên devkîtiyê, ritûweliyê, sepanên pakkirin û şifayê, mosîqayê, reqsan, remzên dîtbar, pîrozbayîyan û rêyên çîrokandinê di nava civakên Xwecî de zindî tînin hiştin.

Di gel vê yekê, çawa ku mît her wiha dikarin tevkarîyê li pihêtkirina qonaxên heramoyîkirinê û serdestîyê bikin, qonaxêke bêjîkirina wan rê dide ku mirov naverokên çewisîner û nirxên gerdişî dawêşîne û xwe ji wan xelas bike ku reng e pêşîyê bigirin li ihtimalên durîstkirina cîhanekê ji bo hindêk bedenên, cinsiyetên civakî û cinsîtiyên nenormatîv. Mîtên bêjîkirî tînin sêwirandin wekî amrazên ku bi kêrî mebestên dîkolonyal û kûyir tînin ku dikarin berevanîyê ji mafê bo aidnebûnê bikin.

Ji çiyayên başûrê rojhilatê Meksîkoyê de, Zapatîsta polîtîkaya firehgerdûnî ya berxwedanê ava dikin ku hevsengîya cinsiyeta civakî, peypêbirinên laşdar ên peywendîdarî siruştê û pergaleke dadwerîyê ya alternatîv bi xwe ve digire. Wekî straticîyeke polîtîk-şî'rî, Zapatîsta amajeyê bi mîtên gelê Maya yên afirînê dikin ji bo ku nûjenkirineke werçerxan bisêwirînin, ku mişt in ji ardûya pêdivîya ku ji heqê demên tarî derên. Di çîrokên xwe yên nivîskî de, Subcomandante Marcos (îro Galeano) bi mexlûqên heyîna bav û kalan re dipeyive ji bo ku birgên direxşan bide ser berxwedanên polîtîk. Marcos tîne bi Duritoyekê, kêzîkeke titûnê re neolîbirilîzmê û straticîya wê ya serdestîyê ji bo Emerîkaya Latîn gotûbêj dike.

Rabirdûya Xwecîyan a ku hê bi destê mêtîngehkarîya navxweyî nehatiye fetisandin xwe tellandiye di nava dilên gelên kolonîzekirî yên li Başûrê Global de. Lêgerîna bo wê û tevdana agirê wê berev dahatûyê xîretek e ku ji aliyê gelên mestîz (col) ve bihê kêşan ji bo ku daxwazê bo modernîtiyêke alternatîv bikin û wê ava bikin ku jê re cîhandurîstkirinên dîkolonyal divên. Bikaranîna mîtên Xwecîyan li vir wekî amrazêke ji bo cîhandurîstkirinê wekî serhildanên kartêker ên li dijî vê qirna vejîna faşîzmê ya li tevayîya cîhanê tê sêwirandin.

(1) Sylvia Marcos, "The Borders Within: The Indigenous Women's Movement and Feminism in Mexico," haz. Marguerite Waller ve Sylvia Marcos, *Dialogue and Difference: Feminisms Challenge Globalization* içinde (Londra: Palgrave Mcmillan, 2005), 81-112.

Çalakî

PEYWENDÎYÎTÎ Û MÎTÊN BÊJÎKIRÎ

Armanç ji vê çalakîyê ew e ku vegêrranên cî-navendî pêk bine ku peywendîyên pihêt datînin û dilîzin li gel mîtan wekî amrazên çirokgotinê da ku li şeweyên hevçerx ên bêmilkkirinê û berxwedanê hûr bibin bêyî ku vegêrranên xusaretê berhembînineve.

Li Mezoemerîkayê cirboqên bikîs bi pênebawerbûna xwe bi nav û deng in. Ew diz û tiringoyên çaxa şevê ne. Lê cirboqên bikîs ew in jî ku şadiyê û êgir bo mirovan dabîn dikin: agirê ku pêdivî ye xurek pê bihê çêkirin, beden pê bihê germkirin û pîrozbayî pê bèn şenkirin. Cirboqên bikîs pê terriyên xwe êgir didîzin û di tûrên zikê xwe de titûnê û alkoholê bi xwe re digerînin.

Di mîtên Mezoemerîkan de, cirboqên bikîs jî ber zerengîya xwe ya ku dikarin xwe li mirîtiyê daynin û bivejin tèn hesabandin ku nemir in. Li hin gundên li Oaxacayê, jî ber zerengîya xwe ya ku dikarin xwe li ber dijwariyan bigirin û jî xusaretê berexêr bibin, bo mirovên zexm û kirdan û qewî digotin, “tlacuachitos” (cirboqên bikîs î biçûk). Cirboqên bikîs, piştî ku hûrxaşî hev dibin, dikarin parî û piçikên xwe bi hev ve daynin. Ruh bi wan de têve û baz didin.

Gelo cirboqên bikîs çi fêr dikin der barê zindîmayîne, cehd û xîretê û qewîniyê de? Çawa ev zerengî dikarin di têkoşana li dijî bêmilkkirinê de bi kêr bèn?

Kesên bervêder. Xwendekarên hunerê, hunermendên disîplînen curecur (performans, mosîqa, hunerên dîtbar, vîdyo û filîm, şî'r û hwd.), xebatkarên warê keltorî yên li Başûrê Global, ektîvîst û kesên tevî destpêşxeriyên jî bo parastina xakê û/yan jî destpêşxeriyên li dijî şeweyên curecur ên bêmilkkirinê bûyî.

Amadekarîyekan. Rahênan dikarin di nava peywenda kargehekê de (yan bi şeweyekî gurayîpêdayî yan jî belav kirî li demê li gorî amadebûna kesên û mekanî) bèn kirin. Hindek jî wan dikarin bi erka amrazan rabin, ên jî bo bidestveanîna vegêrranan bi tena serê xwe. Bijareyeke xwendinê bo zîmanê deverî wergerandî divê jî pêş de jî aliyê kesa/ê sanahîker ve bihê amadekirin. Her wiha, tê pêşniyarkirin ku hûn deqên ku ji projeyên ekstraktîvîst î deverî dipeyivin tev bikinê (“Xwendinê Pêşniyarkirî” ên li jêrê).

Jûreke baş ronî kirî. Mêzekan, kaxiza mezin, qelemên nişankirinê, band. Makîneya pêşandanê (ne mecbûrî ye, heke peywend rê bidê). Aparlorekan (ne mecbûrî ne, heke peywend rê bidê). Laptop û rêtêberîya internetê (ne mecbûrî ne, heke peywend rê bidê) û adeptor. Av, xwarinên sivik, fêqîyekan, qehwe, çay yan jî vexurkên deverî yên germ ên dîtir.

Kî ne em? Em Başûrê Global in, ew zincîreya mezin a afirînan û afirandîyan a ku bi qurbana çillekîya bêdawî ya sermayedarîyê, mêtîngehkarîyê, baviksalarîyê û çewisandinên wan ên dûvelang hemûyan kirine. Em li her berekekî serekî ne, jî ber ku erdnîgara me erdnîgara bêdadîyê û çewisandinê ye. Em ne her kes in; em ew kes in ku stû naçemînin wekî bikine qurbanî û jî ber hindê em li ber xwe didin. Me rûmet û keramet heye.

— Boventura de Sousa Santos, *Epistemologies of the South* (Epîstemolocîyên Başûr)



Çalakî

BABETA ÇÎROKÊ YA MÎTÎ

Zemanek hebû, zemanekî dîtir. Mît.

- Qereqteran bineqînin ji çîrokên mitî yên ku we bihîstine li ciyê ku hûn pê mijûl in. Hûn dikarin wan di sepanên devkî (stranan, hevpeyvînan, lawjeyên şifayê), serçaveyên nivîskî (berhevokên mitên Xwecî, çîrvanokên bo zarokan), serçaveyên dîmenî û madî (keltora devokî û zaravayî, peykerkên axesork, kitêbên destnivîsî î dêrîn, hwd.) de û di sepanên civakî (ritûwelan û cejnan) de peyda bikin. Li gel mirovan biaxêvin, ên ku bi mitên ji herêmê dizanin. Ji bo babeta xwe ya çîrokê ya mitî kerese yên ciyawaz vecemînin û wan (di defterekê, tomareke seyr û seferê, belgedankeke kompîteran yan jî qutîyekê, li ser mêzekê, hwd.) de bicivînin.
- Bi serê xwe, nexşeyeke têgehî binivîsin yan jî çêkin ku bila van pirsên hanê bîne: Çîrokên wan çi ne? Kî ne ev bûnewerên mitî? Zerengî û qasidiyên wan çi ne? Rolên wan çi ne di jîngehê de? Li gel kê/i/kîjanan û bi çi awayan ew têkildar e/in? Li nava şûnwarekî bêmilkkirinê çi li wan diqewime? Milmilane û viyanên wan çi ne? Çawa ew serederiyê dikin? Bi sêwra we, di dahatûyêke dûr de jîyana wan dê bikeve kirasekî çawa?
- Gelo hûn dikarin layenên mitê pênase bikin ku çewisîner in? Çawa hûn bikaribin mitê bêjî bikin bi awayekî ku dêrî li hêzên veşarî yên azadker veke, li şûna ku dêrî bi ser wan de bigire?
- Demkîtîyên mitê, nihayê û dahatûyê, ser di yek de beherin.
- Nexşeya babetên çîrokan ên mitî yên komê yên li pey girêdanan daynin.
- Li hevdengvedanan bigerin û tîmekê pêk bînin.
- Sinopsiseke vegêrranî binivîsin. Vegêrran divê li ciyekî bihê edilandin ku komê bi xwe ve digire.

Çalakî

DÎTBARÎKIRIN

- Dîmenên ciyawaz ji serçaveyên curecur bînin (kitêbên destnivîsî î dêrîn, peykerkan, keltorên devokî û zaravayî, hwd.) û qereqterên xwe bi kurtî û bi giştî dereve bikin.
- Bi koman: bedenên xwe bi kar bînin ku di bizavê de hûn sê wêneyên bêliv î ciyawaz ên qereqter/ê biafirînin. Her sê wêneyan bi kar bînin ku hûn çîrokekê bînine holê. Hûn dikarin dayalogan di navbera qereqteran de binivîsin, “zarevekirin”ekê bisêwirînin ku çîrokê vegêrre, ji bo wê pergaleke dengî biafirînin, hwd.

MADÎKIRIN


- Awayan bisêwirînin ku pê hûn bikaribin vê çîrokê vegêrrin (bi rêya bo nimûne wêneçîrokekê, wêneromanekê, performansekê, şanoyeke kûklayan, vîdyoyekê, piyêseke dangan, stranekê yan jî kombîneyşîneke van şeweyan).
- Berê xwe bidine zanyarî û hunerweriyên nexşeyê ku roja pêşîn komê çêkirin. Pênase bikin bi kê/i re hûn dikarin hevkarîyê bikin ji bo ku hûn çîroka xwe madî bikin.
- Pîlansaziya berhemhênanê bikin.
- Li gorî pîlana xwe berhemhênanê xwe bidin kirin.

DEQDANA MÎTÊN BÊJÎKIRÎ

Berçav bikin awayên ku pê û bi kîjan kesan ve xebata we dikare wekî desttêwerdaneke mîkro-polîtîk a dûajo beşdarîyê bike. Çawa xebata we dikare xwe bigihîne mirovên ku xebata we rewayî wan bûye û ji wan zeyinîye?

- Şêwe, qewam û rêxiraweyên civakî yên jîyanê yên heyî pênase bikin ku çîrokgotina we dikare lê deng vede. Peywendîyê li gel wan daynin. Bi hev re li rê û dirban bifikirin ku çîrokgotina we bikaribe tê de zîl bide.





CENERĪK

Qewīniya Cirboqē Bikís, xebata Naomi Rincón Gallardoyê. Vidyoya HD, 16'00", 2019. Li Oaxaca, Meksikoyê hat kêşan. Kesên Performe Kirî: Hill – Luis Enrique García; Agave – Chichis Glam; Opossum – Naomi Rincón Gallardo; Lady Reed – Diana Gómez Córdoba. Sînematografî: Masha Godovannaya. Belgekîrîna wêneyî: Claudia López Terroso. Gotinekan û Deqekan: Enrique Arriaga. Gotinekan û Deqekan: Dengê rasterast: Konk Balam Díaz. Gotinekan ji bo Hill: Claudia López Terroso. Gotinekan ji bo "I dreamt about the nagueales": Naomi Rincón Gallardo. Gotinekan ji bo "Opossum": Naomi Rincón Gallardo. Mosîqayî: Fernando Guadarrama. Deng: Paulina Jiménez. Jaranas (gîtarên biçûk): Oliver Martínez Kandt and Fernando Guadarrama. Gotinekan ji bo "Fermented, adulterated, hyper-fertilized": Naomi Rincón Gallardo. Muzîk û dengbêj: Chichis Glam. Gotinekan ji bo "Rosy": Naomi Rincón Gallardo. Rappers: Yadhî Boz ft. Doma. Props: Naomi Rincón Gallardo. Rûpoşê Opossum: Ezequiel Marín "Máscaras". Cildirrûn: Mayra Angélica Cernas. Ronahî: Jakob Aguilar. Spasî ji bo: Tepelmeme Community Organization, Pollos Bar, Pablo Arellanes, Lorena Ancona, û Moisés García. Malavayîyên taybet bo koma vekolanê FWF/PEEK "Bê/Milkîrîna: Estetîka Pişt-Beşdar û Pedagogîya Xakê."

JÊDERKÛN VESER

- Gil, Yásnaya Elena A. *¿Nunca más un México sin nosotrxs?*. Oaxaca: Fusilemos la Noche, 2018.
- Rivera Cusicanqui, Silvia. *Ch'ixinakax utxiwa: Una reflexión sobre prácticas y discursos descolonizadores*. Buenos Aires: Tinta Limón, 2010.

BERHEMÊN HUNERÎ

- A Tribe Called Red, artist. 2016. *We are the Halluci Nation*. Studio Album. Radicalized Records.
- Caycedo, Carolina, artist. 2014. *Land of Friends: Descolonizando la Jagua*. Video, 38'10".
- Huichaqueo, Francisco, director. 2011. *MENCER Ñi Pewma*. Video, 32'34". Online at: vimeo.com/284993347.
- The Karrabing Film Collective, director. 2018. *The Mermaids, or, Aiden in Wonderland*. Video, 26'29". Karrabing Indigenous Corporation.

↑ *Qewīniya Cirboqē Bikís*, Naomi Rincón Gallardo, 2019

XEMXURÎ Û HALGUHESTIN




Berhanu Ashagrie Deribew

Addis Ababa, Hebeşistan

Tu şîné digerînî, ... ji ber ku tu xemxur î
 Tu xemxuriyê dikî, ... ji ber ku tu diwêrî
 Xwe bikî şiyandar
 Dilzîz bibî li vir û li dereke dîtir

Alîyê me (civakên li Başûrê Global) ê hevbeş ew e ku divê em hemû li dijî gelek kend û kospan tê bikoşin ji bo ku em bi rûmet û kerameta xwe bijîn – bi gotineke mayîn, em baş bijîn. ... Bi qinyata ku çêdibe ew bêne berterefkirin em li dijî kend û kospan tê dikoşin. Lê, li bara hewildana bo ku em xwe bigihînine wan, têkoşana me kêmtir ji çawanîya kiryar û hestên me girê dayî hedefen me ye.

— Boaventura de Sousa Santos, *Epistemologies of the South* (Epîstemolocîyên Başûr)



Addis Ababa yek ji bajarên li parzemîna Efrîqayê ye ku herî bi lez mezin dibin. Bajar navendeke polîtîk a Hebeşistanê ye û, ji damezirana OUAyê (Rêkxiraweya Yekîtiya Efrîqayê) di 1963yan de û vir ve (di pey re navê wê bû “Yekîtiya Efrîqayê”), Addis bi erka bûyîna navenda serekî ji bo parzemînê jî radibe. Peywendiyên min ên xurt ên li gel Addis Ababayê bêtiirî berîya bîst salan dest pê bûn. Berîya wê yekê, min çend heyamên havînê li bajêr derbas kiribûn, lê bi min ve bes wekî bajarekî mezintir xuya dibû, li kê derê bar û dox heçku di heman katê de gengaz û ne gengaz bûn. Piştî ku bi mebesta ku bibime niştêciyekî daîmî min bar kire bajêr, bajar bû bajarê ku min dikaribû peywendiyên germ li gel daynim. Çawa ku têgeha malê çalak e û her tim hêza xwe ya veşarî heye ku berê xwe biguhêze, Addis, bêtiir ji bajarê ku ez lê ji dayîk bûme û mezin bûme, bû mala min. Va ye, ez serpişkîyan dikime abîde ku hawira bajarî dikare pêşkêş bike û, pê re jî, ez vedigêrim êş û azarên ji ber destê encamên ku ev yek bi xwe re tîne. Ez lê dixebitim xwe hînî rewşan bikim û bi seheka mayî ya aîdîyetê rê bikudînim, lewma Addis mala min e ku ne vala ye, ne jî tijî ye, lê her tim mişt e ji jîyanê.

Sala 1886an, piştî ku pê hesîya bergeha siruştî dikare çî jêderkên potansiyel pêşkêş bike, Şahînsah Menilekê Duyem¹ ji Çiyayê Entotoyê dagêr bû û hate devereke ku niha dibêjinê, Arat Killo, ya ku di pey re bû dilê bajêr. Paşê artêş, torin, karbidest û xulam û xizmetkarên wan dest pê kirin li dor û berê qesra Şahînsahî akincî bûn û dever hêdfika veguherî û bû gund, paşê bû şaroçke û dawîyê bû bajar. Ji firehbûna xwe ya berwext û vir ve, bajar bûye gastî ji bo mirovên ji herêmên welêt hemûyan, hindî ku çînen civakî hemû bar dikin û tînen li wê derê akincî dibin. Koça bo bajêr hê jî rastîyek e, dike ku bajar bi lez fireh bibe û gelheya wî giran bibe. Niha Addis bi dîroka xwe ya 130 salan ve bajarekî di serdema xwe ya kemalê de lê dîsa jî temenciwan e, ku bûye mal ji bo sê nîfşên şênîyan.

Şahbanû Taytuya² jina Şahînsah Menilekê Duyem, di destpêka akincîbûna bajarî de, navê “Addis Ababa”yê lê daniye, yê ku bi zimanê Amharî wateya xwe “Kulîlka Nû” ye. Bajar li ber dema hevçerx a li Hebeşistanê hat şewandin, lê bêyî mebesteke serekî ku wekî platformeke bajarî geşeyê bide. Nebûna qadên akincîbûnê yên pergala caxûcaxû, ya ku hevbeş e ji bo gelek bajarên, qereqterekî yekta daye Addis Ababayê. Nefermîtiya dêsmana bajêr şewe daye tevîneka civakî ku rê dide wekî peywendîyeke bi dil û can bihê domandin. Dema ku dewletê destpêşxerî kir û projeyên bajarbûnê/hevçerxkirinê yên çapanmezin xistine merîyetê, berîya devîdevî deh salekê ve rastîya bajarî dest pê kir bibe dîroka kolektîv. Ji wê hingê ve ye, pêlên hûtasa yên warşihîtibûnê rahiştine bajêr. Bê hesab malbat û tax bi zoremilî hatin warşihîtkirin berev perên bajêr, li kê derê ew ê tûşî jîngeheke ji binî ve cîyawaz bibûna. Derbasbûna di nava şantîyeyên rûxandinê/avakirinê re bûye binemayeke sereke

¹ Şahînsah Menilek di henga damezirana bajarê Addis Ababayê de Keyê Showayê bû. Sala 1889an, ew bû Şahînsahêkî Hebeşistanê.

² Şahbanû Taytu zehf tevî gelek mijarên peywendîdarî polîtîkayê, diplomasîyê û serokatîyê bûye ku hiştine di heyna xwe de ew bibe yek ji hêzdarîrîn jinên li parzemîna Efrîqayê. Lbnr: Prouty, 1986


ya her roja bajarî. Taxên kevn, qesirbendîya dîrokî, qadên giştî û abîdeyên giring jî neçar man ku veçiqin û rê vekin ji projeyên qaşo geşedanî yê dewletê re; hindî ku diçe ew bêtir betave dibin ji bîra kolektîv.

Rastîya ku tevayîya bajêr bi lez dibe şantîyeyeke avakirinê bûye sedema bê jimar pirsên ku ta vê gavê bersivên têrker bo wan nehatine peyda kirin. Nehevsengîya di navbera ya pêdivîya şênîyan pê heye û ya ji aliyê dewletê ve cî bi cî kirî de bûye dêredêrîyeke bêzarker û berdewam wekî mirov baristanîyê lê bike. Wekî hunermendekî ku hewil dide bi şêweyekî rexneyî peywendîyên pihêt li gel rastîyên bajarî yê cîyawaz dayne, wekî bersiv bo jîngeha bajarî ya ku bi lez diguhere û rewşên mirovî yê di wê de, min destpêşxerî li projeyên hunerî yê firehhêl kiriye. Balcivandina min bi pirranî li warşihitîbûna bajarî, rapêçkirina erdan û guherana mekanan û cîyan bûye. Bi wê wateyê, min bi pirranî bala xwe li kêliyên li vir-nihayê yê vê gavê civandiye ku şêweyê bûna kolektîv û mêjûya cîgehê bajarî têk didin.

Bajarê Addis Ababayê li herêma bi navê Oromiayê hatiye danîn, li devera yek ji mezintirîn komên civakî yê li Hebeşistanê. Li seranserê firehbûna berwarkî ya bajêr, mirovên ku li perawêzên bajêr dijîn (bi pirranî cotkar in) her tim bi zoremilî berev rexekî hatine dehfandin û ji danîna peywendîyên baş û ji çandin û dirûnê hatine bêparkirin. Projeyên bajarbûna bilez bi qasî deh salekê bajar xiste binê lepên xwe, heta ku bajêr cîgeh qedand wekî hew bikaribe bêtir firehbûnên berwarkî bihêwirîne. Di pey vê yekê re, di 2014an de, rêveberîya bajêr pîlaneke avadanîyê ya giştî ya tekûzkiirî ya nû ragihand ku dê erdên li derdorê yê herêma ji tixûbê bajêr û bi wê de bigihandana hev.

Ev kiryar derbirraneke nefsmeziniya dewleta geşedanî-otorîterîyen û têgihiştina 'eletewş a li ser xakê ye wekî tiştêkî ku hêza dewletê dikare tevî milkîyeta xwe bike. Hebeşistan bi zêdeyî civakeke kişawerziyî ye, li kê derê xakê gelek wateyên xwe hene. Xak ne bi tenê wekî milkekî tê dîtin, lê ew mafekî zikmakî, peypêbirinek e û zanyariyek e ku raçandî ye li her dera rûpela demê. Vê kiryara cîyê neheqîyê ya dewletê di nava ciwanên li herêmê de agirê înfialê dada, ku di pey re li seranserê welêt protestoyên cemawerî rû dan. Ev rapêrîna ciwanên li herêmê bêtirî sê salan berdewam bûn û di pey re bûn motora serekî ya ku destpêşxerî kir li vesazîyeke serekî ya dêsmana polîtîk a dewleta ku bîst û heft salan bi dirrindeyî welat li ser pêyan hiştibû.

Di domana têkoşana ciwanên li herêma Oromiayê de min ji nêzik ve înfial dît ku dihate derbirrîn. Ez hîn bûm ku pîlana avadanîyê ya giştî ya tekûzkiirî ya berpêşkiirî, ji bo protestoya ciwanan a bînavbirî, a rast sedemek bû, lê ne yekane hêza bizwêner. Înfial bi zêdeyî berhemeke kerb û kovana girokiirî bû, hatibû ragirtin ji dameziran û firehbûna berwext a bajêr û vir ve çî ku bîngeha bajêr li ser tundûtûjîyê,



↑ Berhanu Ashagrie, Xemxurî û Halguhestin: Meşîna bi hev re bo Çiyayê Entotoyê; Rojnameya destnivîs ji bo Xemxurîyê û Şingerandinê; "Vehesan", (xwarîna bi hev re bi hevkarî re); Performansa xwendina şî'ra binoriyê li hundirê baseke gel a bi gerê ketî; Performansa xwendina şî'ran; hemu li Addis Ababa, 2019



Rapêçkirina erdan, warşihîtkirinê, bikaranîna jêderkan bi xerabî û zordestîya keltorî ya li ser civakên li deverê hatiye avakirin. Heta vê axirîyê jî, ev rabirdûya hovane eşkere nedihate gotûbêjkin, ne ji alîyê dewletê ve, ne jî ji alîyê komên civakî yên cîyawaz ve. Ji bo zorîneya komên mirovan ne gengaz bû ku bi rêya vegêrrana serpehatîyan xwe bigihînine cîgehê berîya bajarî. Mercên xakê yên berîya û di henga damezirana bajêr de bi tenê di nava komeke civakî ya dîyar a li herêmê de bi devkî hatine naskirin û zindî hatine hiştin. Ev mêjûya devkî ya bendkirî îdiaya lêqewimîtiyên di henga damezirana bajêr de tîne. Û vê mêjûya tundûtûjîyê û xusaretê çu caran warek nebûye ku bihê nasîn û bi şeweyekî guncan serederî pê re bihê kirin. Jêderka peypêbirinên cîyawaz ên di nava komên civakî yên têvel de çêdibe ew rastî be ku daxwaza mafan ji ber bêmilkkirinê nakok e li gel vegêrrana sosyo-polîtîk a 'ezîm a li ser rol û giringîya Şahînşahî ji layê pêkanîn û geşepêdana neteweyê ve.

Bi dû çaksazîya polîtîk a vê axirîyê re, mêjûzanan, ektîvîstan, sîyasetmedaran û ciwanên ji herêmê dest pê kirine mêjûya hovane ya pêkdadana bajarî eşkere gotûbêj dîkin û, bi gavekê pêştir jî çûne, doza xwedîtiya cîgehê bajêr dîkin. Vê daxwaza seretayî gelek vegêrranên dij-mêjûyî yên ji komên civakî yên cîyawaz bi xwe re anîn, ku gelek ji wan bêtir hêrs, xezeb û hêmanên rûxîner ên dîtir tevî cîr û cedekekê kirin ku ji berê de cîyê neyarîyê ye. Di nebûna guhdarîkirina bi baldarî de, ji ber komên civakî yên cîyawaz ên ku bi şeweyekî çalak xerîkî çêkirina bîyanîyan in³ û "Dîtirên etnîk" diqewirînin û ji nava tixûbên herêmî derdixin, tixûbên herêmî bêtir bûne çavnetirs. Sala 2018an, vê rastîya kolektîv a cîyê 'acizîyê kir ku, ji ber (hin) xaka cîyê desteserkirinê hesabandî û (hin) jîyanên ne bi destê xwe hesabandî, welat di bîyavê warşihîtbûna navxweyî⁴ de li rêza yekem be. Ev çêkirina bîyanîyan naskirina rabirdûyeke kolektîv a hevbeş mandele dike ku bi awayekî eşkere kar di hêvîya kolektîv a ji bo "jîyana xweş" (*buen vivir*)⁵ dike. Niha, komên civakî yên cîyawaz heçku tevî şerekî bûne, di kîjanî de yekane ihtimal têkçûna bi şeweyekî kolektîv e.

Hindî ku tovên ferhengeke tîrsê û tundûtûjîyê li hundir û ji navendê û bi wê de bi kartêkerî têne reşandin, ev sawêrên tundûtûjîyê li peywendîyên civakî radiselitin. Li hemberî vê pêkdadana berdewam, bertekên takekesan, xwe jî ên kombendan, ji derbiranên xemê ta bi ên xezebê diguherin. Hal û mede wiha, a duyem xetera rûxanê û xusareta neberevajîbar davêje guhê me, a pêşîn, di gel û ji ber cîyawazîyan, li derfet û delîvên biserhevdehatinê digere. Biserhevdehatineke bi vî rengî çênabe ku bihê texeyyulkirin bi mebesta ku em ji bîr bikin yan jî serederîyê bikin li gel tiştê ku jixwe di mêjûyê de qewimîye, lê çêdibe ku em hevrûbûneke karîger pêk bînin ku tê de em rê bidine xwe wekî em bi baldarî li mercên yek û din guhdarîyê bikin û pê xeman bixwin. Biserhevdehatina ku dikare qonaxêke şifaya

← Berhanu Ashagrie, *Xemxurî û Halguhestin: Performansa afirandina ritûwela şingerandinê li Çiyayê Entotoyê; Vehesan (Nîfro, yek ji xwarinên sivik ên 'edatî yên dema şingerandinê, ya ku di henga kargehê de hat dayîn); Performansa şingerandinê li qada gîştî (Meydana Menilekê); Gotûbêj li ser Ritûwelên Şingerandinê; Performansa şingerandinê li qada gîştî (Arat Killo); hemu li Addis Ababa, 2019*

3 Zygmunt Bauman, *Liquid Modernity* (Cambridge; Polity, 2000),95.

4 Rêzandina warşihîtbûna navxweyî di raporta maweya navîn a global a Navenda Raçavkirina Warşihîtbûna Navxweyî – IDMC (2018) de hatiye.

5 Têgeha "jîyana xweş" (*buen vivir*) ji peyva "sumak kawsay" a bi zimanê Keçwayî peyda bûye. Têgeh li vir bi awayê ji aliyê Sousa Santos ve adeptê kirî tê bikaranîn. Lbnr: Santos, 2014.

kolektîv sanahî bike ji birîneke kartêker û lêkvegir dest pê bike, ne ku ji şûnên birînan.

“Xemxurî û Halguhestin” projeyek e ku mebesta nazik bi xwe ve digire wekî di kêliyên metirsîdar ên bi vî rengî de ji bo biserhevdehatinekê seyr û sefer bihê kirin. Proje pesend dike ku boçûna biserhevdehatinê çênabe ku bi rêya zimanên sahibrewac ên polîtîkayê bihê destpêkirin û domandin, ber’eks, bi rêya zanyarîya û ezmûnên şênberkirî yên hevbeş di nava civakan de. Jiyanên me yên polîtîk sereqet duçarî tundûtûjîyê bûne û civakên çewisandî yên bi vî rengî şêweyên firehhêl ên xusaretê tecrube dikin ku pirr giring in wekî şîn bo wan bihê gerandin. Li derên ku cîyawazî tê berhembênan da peywendîyên civakî pênase bikin, reng e kovan di nava komên mirovan ên dîyar de bibe ezmûneke bendkirî. Di kêliyên metirsîdar ên bi vî rengî de, divê mirov stûyê xwe bikine kindir da eşkere û bi kombendî li ser lêqewimîtiyan binorîyê bigerin.

Projeya “Xemxurî û Halguhestin”ê derdibirre vîyana bo vekolîna çî ka çawa boçûn û sepana şîngerandinê çêdibe bihê tercumekirin bo pergaleke estetîk, pedagogîk û polîtîk da ku mirov peywendîyên xurt dayne li gel qonaxa şifaya kolektîv û tevkarîyê li wê bike. Wateya danîna peywendîyên xurt li gel şîngerandinê ew e ku mirov xwedanmebest bin wekî demên metirsîdar bi kar binin da ku rê bidine xwe bo xemxurîyê bikin, bimesixin, kar tê bikin û mercên kesên dîtir kar di wan bikin. Lewma, peywira şîngerandinê ew e ku mirov ji hêza wê ya sosyo-polîtîk fam bike û bibe qasid û govaneke/lî wê ya/ê çalak. Di gelek peywendên keltorî de, têgihîştineke kolektîv heye ku nabe çu kes bi tena serê xwe şîne dayne. Li derên wek Hebeşistanê, hem li deverên gundewar hem jî li deverên bajarî ji bo rêwresmên cenazeyan hetta komeleyên alîkarîya beranber ên gerdîşî hene. Modêlên gerdîşî yên bi vî rengî yên sazîyên civakî yên li ser xîmê bêberevanîyê û xusaretê, tê de “Dayîkên Plaza de Mayoyê” yên li Arcantînê, “Dayîkên Şemîyê” yên li Tirkîyeyê, “Jinên Reş Wergirtî” yên Îsraîlê, Serbîyayê û li ser asta navneteweyî û “Jîyana Reşikan Giring e” ya li DYyê û li ser asta navneteweyî, rêberî li têkoşanên civakî û polîtîk kirin.

Di projeya “Xemxurî û Halguhestin”ê de, têgeha şênberkirinê xala destpêkê bo teorîya wê ya guheranê dabîn dike. Boçûna şênberkirinê hêzeke xwe ya veşarî heye ku destpêşxerîyê li etîkekê, estetîkekê û polîtîkayekê bike ku tê de jîyan, bêberevanî û lêgerana bo hevkarîyê sereqet tene nîqaşkirin.⁶ Li pey hizra şênberkirinê, gelek karîwerîyên afirîner, pedagogîk û polîtîk bi şikleki kombendî hatin perisandin û pêşkêşkirin: Wek mînak, li Addisê min kargeheke bi şeş rojan bi rêk xist, a ku takekesên ji zanistên afirîner û paşxaneyên keltorî yên curecur bi xwe ve girtin.

Çarçoveya giştî ya kargehê li dora boçûna xemxurîyê û şîngerandinê hat birêxistin, peywendîyên xurt danîn li gel azîneyên cîyawaz ên afirandina hevruûbûnên kartêker, ku hat

sanahîkirin bi rêya rahênana karta hevbeşîyê ji bo çîrokgotinê, rahênana afirandina wateyê li ser têtîgînên tundûtûjîyê û bêmilkkirinê, rahênana nivîsîna şî’ra binorîyê (zêmar) da ku serederî bihê kirin li gel hizra şîngerandinê wekî kiriyareke krîtîk a ku pûtepêdan divê jê re, meşîna bi hev re bo şûnwarên bêmilkkirinê, rahênanên dengî û zimanê amajeyan li qadên giştî wekî şêweyekî sistêmîk ê protestoyê, rahênana zimanî da ku çewttêgihîştin û çewtravekirin bihê tecrubekirin, tomarkirina helsengandinan ji bo zimanên amajeyan ên şîngerandinê û rahênana nivîsîna deqa nivîskî ya berevajî da ku serederî li gel çîrokgotina performatîv bihê kirin – ne ku bi tenê wekî cîbicîkerekê/lî, lê wekî govaneke/lî çalak. Bi bikaranîna hêza veşarî ya biserhevdehatinê, komê şî’reke binorîyê (zêmar) bi şêweyekî performatîv li hundirê baseke gel a bi gerê ketî xwend, li giringtirîn qadên giştî yên li bajêr (Meydana Meskelê)⁷ protestoyeke sistêmîk û afirandina rîtûweleke şîngerandinê li Çîyayê Entotoyê li dar xist û her wiha rojnameyêke destnivîs ji bo xemxurîyê û şîngerandinê weşand. Wekî berhemeke encamê ya hunerî û polîtîk a sereke ya projeyê, performansên şîngerandina kolektîv li sê şûnwarên bajarî yên bêmilkkirinê yên li bajarê Addis Ababayê hatin pêşkêşkirin.




⁶ Berhanu Ashagrie, Xemxurî û Halguhestin: Performansa şîngerandinê li tanga Qesra Neteweyî, 2019

⁷ Meydana Meskelê li Addis Ababayê meydana bajêr a sereke ye ku ji bo tevayîya jîyana bajarî ya rojane û mêjûya sosyo-polîtîk a bajêr, pê re jî ya welêt, qadeke lap zêde giring e.

⁶ Ben Spatz, “Notes for Decolonizing Embodiment,” *Journal of Dramatic Theory and Criticism* 33, no. 2 (2019): 9–22; doi: 10.1353/dtc.2019.0001.



↑ Berhanu Ashagrie, Xemxurí ù Halguhestin: Gotúbêj li ser helsegandinên ji bo zimanên amajeyan ên şingerandinê; Rahênana Performansa Şingerandinê; Rahênana Dengî li Meydana Meskelê, hemu li Addis Ababa, 2019



Çu guheran nîne bêyî xweguheranê, ji bo ku kend û kospên li ber jîyana bi rûmet û keramet, yan jî li ber jîyîna baş ...

— Boaventura de Sousa Santos, *Epistemologies of the South* (Epîstemolocîyên Başûr)

Boçûnên li ser şênberkirinê û hunerên şênberkirî tişteki taybetmend pêşniyar dikin ji hewildanên bo dîkolonîzasyonê re, ku nabe li jêr konseptê performansê bîn sercemkirin. Berevajîyê performansê, ya ku mecazên karîgerîtiya pîvanbar û hêza tavilê berçav hildigire, şênberkirinê hêza xwe ya veşarî heye ku destpêşxeriyê li etîkekê û polîtîkayekê bike yan jî wan dahêneve ku tê de jîyan, zindîmayîn, bêberevanî û êkolocî dê bibine têgînên kilîl.

— Ben Spatz, “Notes for Decolonizing Embodiment” (“Nîşeyên Ji Bo Dîkolonîzekirina Şênberkirinê”)

Amraz

ZIMANÊN AMAJEYAN ÊN JI BO ŞÎNGERANDINÊ

Em dilivin — em bi zimanên amajeyan dipeyivin, em diaxêvin — em bi zimanên amajeyan dipeyivin, em dixwazin — em bi zimanên amajeyan dipeyivin, em xemxurîyê dikin — em bi zimanên amajeyan dipeyivin, em li hev par dikin — em bi zimanên amajeyan dipeyivin, em ji dest didin — em bi zimanên amajeyan dipeyivin, em şîne digerin — em bi zimanên amajeyan dipeyivin, em berhingarîyê dikin — em bi zimanên amajeyan dipeyivin, em şer dikin — em bi zimanên amajeyan dipeyivin, em tê dikoşin — em bi zimanên amajeyan dipeyivin, ... Sereqet em bi zimanên amajeyan dipeyivin.

Zimanekî amajeyan hêzeke xwe ya veşarî heye ku bimesixe û bibe peyamek yan jî wateyek, vexwendineke ku bihê xwendin yan jî şirovekirin, sirûşeke ku destpêşxeriyê li dayalog û peywendîyeke pihêt li gel ezmûnên bedenî bike. Zimanê amajeyan bi fonksiyona xwe ve girift e, ji ber ku watedar û ‘emelî, bedenî û polîtîk e; ew dikare bi hevkatî perspektîvên wateyan derbibirre, ku ev yek wî dike şeweyekî potansiyel ê derbirranê yê ku dikare afirîner û pedagogîk be. Weku bi rêya berhemên hunerî yên curecur hatiye cêribandin, her wekî “Vekolana Perspektîvê” ya Ai Weiwei, hêza zimanên amajeyan heye ku danîna peywendîyên pihêt ên afirîner sanahî bikin ku polîtîk in. Bi rêya polîtîkaya protestoyê zimanên amajeyan dikarin bibine binemayeke pîrr giring jî, çawa ku bi rêya protestoya “Destên Xwe Rakin! gulleyê bernedin!” a li dijî hovîtiya polêsan a arasteyî civaka Efrîqayî-Emerîkan hat dîtin. Weku Anusha Kedharê nivîsiye, “koreografî, bizav û zimanê amajeyan bo polîtîkaya protestoyê ne perawêzî ne, lê navendî ne.”(1) Bi her keltorê re zimanên amajeyan ên xurt hene ku hêzeke xwe ya veşarî hene wekî bi rêya têkoşanên civakî yên ciyawaz bo zimanekî polîtîk bîn tercumekirin.

Armanç ji zimanên amajeyan ên ji bo şîngerandinê ew e ku bibine amrazên afirîner, pedagogîk û polîtîk ên ku bi rêya danîna peywendîyên pihêt ên bedenî rûhevûnên kartêker ji bo fêrbûnê û fêrbûneveyê, tercumekirinê û mesixandinê, kodkirinê û vekodkirinê, bizivînê û vebizivînê sanahî dikin. Zimanên amajeyan ên şîngerandinê berhemên xemxurîyê ne ku dibîrhêner in ji bo şîyana ku yek rê bide xwe wekî mercên metirsîdar ên yek û din kar di wê/i bike û bi rêya ezmûnên bedenî hevbeşiyê saz bike li gel bêberevanîyê û xusaretê. Her wiha, li pîrraniya derên li seranserê Başûrê Global bikaranîna qadên giştî li derî rewşên asayî ji bo egerên afirîner û polîtîk çu caran hêsan nebûye. Performekirina qadên polîtîk ên bi vî rengî ji bo xisar yan jî tacîza fizîkî û saykolocîk gelek caran dibe pêgeh. Zimanên amajeyan ên ji bo şîngerandinê her wisa bo wê yekê ne ku bibine zimanekî polîtîk û estetîk, minîmal û kartêker da ku danîna peywendîyên pihêt ên bedenî bihê sanahîkirin li şunwarên bêmilkkirinê yên ku ji ber sedemên çewisîner ên curecur delîv kême wekî mirov qadê performe bike. Pîrr giring e mirov pê bizanibe ku ji ber egerên polîtîk her tim reng e çewttêgihîştin biqewime ku dibe xwe berde nava qonaxa biserhevdehatinê. Di qewamên bi vî rengî de, bi hedefa ku ji bo biserhevde-hatinê rûhevûn bihê berhemdarkirin, divê bi helwesteke kolektîv berhingarî li rewşan bihê kirin.

- (1) Peywendîya di navbera zimanê amajeyan, koreografîyê û polîtîkaya protestoyê de di gotarên ciyawaz ên Anusha Kedharê de wekî referans hatiye. Kedhar li Kolêca Coloradoyê profesoreke cîgir a Dansê ye (2014).





ቁጭትና ገጹት በተቀላቀለበት ስሜት በሁለቱም አጾቻ መረቲን ደጋግሞ መምታት



በሁለቱም አጾቻ ጉልበትን በቁጭትና በገጹት ደጋግሞ መምታት

Çalakî

KÊŞEYÎKIRINA ZIMANÊN AMAJEYAN

Çar çalakîyên li jêrê hatî têne sazkirin ku ji bo komeke, di gel û jî ber cîyawazîyan, li ser bingeha xemxurîyê pêk hatî danîna peywendîyeke pihêt a kombendî li dar bixin. Mebesta vê çalakîyê ne performekirina zimanên amajeyan e, lê kêşeyîkirina qonaxê ye.

- Her kesek zimanekî amajeyan ê peywendîdarî gerdişeke xemxurîyê, kovanê yan jî şîngerandinê tîne.
- Tevî raveyeke kurt û kurte bi dimenekê yan jî gelaloneyê şêwe bidine kartan.
- Her yek ji we karteke zimanê amajeyan bigire û tê bigihîje bê ka puxteya zimanê amajeyan bi çi awayî dibîne.
- Cotecot lêk ve bibin û dest pê bikin zimanê amajeyan fêrî hev du bikin.
- Zimanê amajeyan performe bikin, pê re jî kiryarê bi peyvên xwe xwe rave bikin.



በሁለቱም አጾቻ ደረትን ደጋግሞ በቁጭት መምታት




Çalakî

TERCUMEKIRINA ZIMANÊN AMAJEYAN

Ev çalakî der barê afirandina meydana de ye ku hûn zimanên amajeyan tercumeyî şeweyên dîtir ên zimanên yan jî amajeyên dîtbar bikin. Ji bo ku hûn rahênanê çalak bikin, kerese-yên hunerî û sabit berhev bikin ku hûn dikarin bi hêsanî xwe bigihîninê.

- Her kesek li ser heman zimanê amajeyan ê ji çalakiya berê dixebite.
- Rêyên potansiyel bisewirînin ku hûn ezmûna bedenî bimesixînine şeweyên dîtbar û xerîkî qonaxa dîtbarîkirinê bibin.





Çalakî

DANÎNA NEXŞEYÊN ŞÛNWARAN

Ev çalakî der barê afirandina meydaneke de ye ku hûn şûnwarên bêmilkkirinê gotûbêj bikin û lê biçin û bîn. Du koman pêk bînin:

- Koma 1em: li şûnwarên bêmilkkirinê yên li deverê û mêjûya tundûtûjîyê ya peywendîdarî wan bihizirin; Koma 2em: seyr û seferê bikin ka çawa hûn ê ji cîyê ku kom di careke de lê hêwirîye xwe bigihînine wan şûnwaran.
- Her endameke/i koma pêşîn navê şûnwarekî polîtîk hildide û çirokeke bêmilkkirinê peywendîdarî şûnwêr tîne bîra xwe.
- Her endameke/i koma duyem bi amajeyan nîşan dide ka çawa ji cîyê ku kom wê gavê lê hêwirîye seyr û seferê bike bo şûnwarê navgotî.

PERFORMEKIRINA ZIMANÊN AMAJEYAN

Ev çalakî li qadên giştî/polîtîk yan jî şûnwarên bêmilkkirinê wekî şeweyekî sistêmîk ê protestoyê peywendîyên pihêt datîne li gel zimanên amajeyan. Ji ber mijarên peywendîdarî ewleyîyê zehf giring e ku hûn rewşa şûnwaran destnîşan bikin.

- Bînin mêjûya û mercên hevçerx ên qadên polîtîk yan jî şûnwarên bêmilkkirinê yên cîyawaz gotûbêj bikin.
- Şûnwarê/n ku performansa zimanê amajeyan ê şîngerandinê lê bi rê ve biçê hilbijêrin. Wekî kom cîyê xwe li şûnwêr destnîşan bikin.
- Her takekesek bi zimanê amajeyan ê di henga du çalakîyên pêşîn de pê dayî û standî komê perwerde dike (Kêşeyîkirin û Tercumekirina Zimanên Amajeyan).



Rê û rewanî tê de heye mirov li celebên govanîyê bihizire ku ji dîyarê sîmbolîk û bi wê de têkildarî şeweyên bûyîna li gel a/ê dîtir in. Bê guman ev celebê govanîyê ne yeksanî şeweyên me'lûm ên naskirina navkirdeyî ye, lê wisa tê xuyanê ku bêtir dirûvê ezmûnên nîgeranîyê pê dikeve. Nîgeranî, bi vê peywendê, dê – weku trawma – rengê celebê dîyar ê nêzîkîya li 'heqîqeta rastîyê' jî bide, ne ku bi tenê rengê nêzîkîya li şeweyên havîkirî yên 'zanyarî'yê (yan jî fentezîyan).

– Margarita Palacios, *Radical Sociality* (Civakîtiya Radîkal)

↑ Berhanu Ashagrie, *Care & Become: mapping exercise on Mount Entoto*, Addis Ababa, 2019

→ Berhanu Ashagrie, *Xemxurî û Halguhestin*, Rahênana zimanê amajeyan li Meydana Meskelê (Protestoya sistêmîk), li Addis Ababa, 2019



Amraz

DEQA NIVÎSKÎ JI BO ŞÎNGERANDINÊ

Deqeke nivîskî exlebe bi formatên deqî yên cîyawaz tê amadekirin weki biceribîne û rêberiyê li axiftin, kiryar, lîstik yan jî performanseke diyar bike. Deqeke nivîskî dikare bibe pîrr û gelek tiştên din jî, lê, heke mesele şanoya gerdîşî be, armanc ji wê ew e deqan bi xwe ve bigire ku rêberiyê li peyvên gotî yan jî li darêjên çirokan û li derhênanên çalakîyan dikan. Bi wê peywendê ve, armanc ji deqeke nivîskî ew e ku bibe belgeyeke tevî rênimayên ji bo cêrgeyeke performansên ku ji aliyê cîbicîkeran ve li hawireke taybet bîn pêşkêşkirin.

Deqeke nivîskî çêdibe bihê dariştin ku bi rêya çeşnekî taybet e performansê çirokan vegêrre, bi ramanên sereke û rê û dirbên çirokgotinê yên cîyawaz eleqedar bibe. Pîrsa pîrr giring di vir de ev e: Gelo çawa em deqeke nivîskî dinivîsin da ku çirokên tundûtûjîyê û lêqewimîtiyan vegêrrin? Gelo ew xwe bi çî digire da ku bi şeweyekî guncan peywendiyên pihêt dayne li gel kiryara vegêrrandina qewamên ku xwe dispêrine yeka ku Frank Wilderson dibêjîyê, “rêzimana nebêjane ya jankêşanê”? (2) Gelo çawa em dîrokçeyên tundûtûjîyê pê vegêrranên civakî rave dikan? Gelo çawa em ji sawêrên tundûtûjîyê fam dikan û peywendiyên pihêt li gel datînin ku li peywendiyên hevçerx ên civakan radiselitin? Gelo em dikarin ji pêş de bihesibînin ku di vê peywendê de “em”ek heye?

“Deqa Nivîskî Ji Bo Şîngerandinê” amrazek e ku vavêr dike derawayên kêşeyî yên govaneke/î yên ku bi rêya meseleyên li jorê diyar kirî hatine derbirrin. Lewma jî, ew xwe dût digire ji rol û fonksiyona gerdîşî ya deqên nivîskî, piştî ku beşdarîyeke performatîv a diyar li ser bingeha xemxuriyê diqewime, di dewsê de ew dibe tişteki ku di nivîsîna deqa nivîskî ya berevajî de bihê perisandin. (3) Di vê rewşê de,

amadekirina deqa nivîskî xwe dispêre nîqaşkirina vebûnan ji bo cîbicîkeran û şunwarên ku performans dê lê bi rê ve biçê. Lewma jî, “Deqên Nivîskî Ji Bo Şîngerandinê” kêmîr der barê deqa nivîskî de ye û bêtir der barê ezmûnên bedenî de ye û bi rêya wan ezmûnan pê bedenên cîbicîkeran çirokên bêmilkkirinê dikarin bîn vegêrran.

“Deqa Nivîskî Ji Bo Şîngerandinê” hevrûbûnên afirîner û rexneyî pêk tîne ku bi awayekî peywendîdarî xusaretê, kovanê û şîngerandinê zanyariya şênberkirî û ezmûnên bedenî tercume bike. Ew her wiha bi erka navgîneke pêkanîna hevrûbûnên kartêker ên ji bo parîhevkirinê, xemxuriyê û fêrbûnê jî radibe, bi rêya kîjanê di nava kombendan de weki kiryareke estetîk, pedagocîk û polîtîk çêdibe geşe bi ezmûneke bedenî bihê dayîn. Qonaxa perisandina deqeke nivîskî ji bo şîngerandinê bo wê yekê ye jî ku hevrûbûnên firehhêl pêk bîne ku texeyyulên kolektîv fireh bike, bi rêya kîjanan şeweyekî diyar e azadiyê çêdibe ji rastiyeke tepeserkirî û bi wê de bihê tecrubekirin. “Deqa Nivîskî Ji Bo Şîngerandinê” straticîyan ji sanahî dike ku, bi saya potansîyeleke bo xebata li ser deqeke nivîskî ya pêşverû ji bo kariweriya performatîv a pêştir a ku çêdibe di nava komên û peywendên cîyawaz de bihê parîhevkirin û adeptekirin, komekê tevî kiryareke performatîv a li ser qadên polîtîk yan jî şunwarên bêmilkkirinê bike.

(2) Frank B. Wilderson, *Red, White & Black: Cinema and the Structure of US Antagonisms* (Durham: Duke University Press, 2010), 1-32.

(3) Afirandina deqa nivîskî ya berevajî li ser şeweyekî diyar e beşdarîya performatîv ne kurteyeke yan jî sinopsiseke sade ya performansê ye. Lbnr: Adam û Marta (2017). (65), 177-194

Çalakî

NIVÎSÎNA ŞI'RA BINORIYÊ

Çalakî rahênanên firehhêl bi xwe ve digire û qewî giring e mirov hêjayiya gotûbêj û rokirin û pîvana li ser ezmûna her beşdarê/î piştî rahênanan bîne bîra xwe. Armanca rahênanê ew e ku tebeqeyên wateyan pêk bîne ji bo hindek peyvên ku giring in ji bo gotûbêja li ser peywendên destnîşankirî yên bêmilkkirinê û firehkirina hêza peyvên weki mirov şî'rên binoriyê(4) pêk bîne ku dikarin derbirraneke xusaretê, înfialê û kovanê sanahî bikin.

• Peyvên têkildarî tundûtûjîyê, xusaretê, kovanê, xemxuriyê, şîngerandinê û/yan jî têkoşanê pêk bînin.

• Her peyvekê gotûbêj bikin û tebeqeyên wateyan bidinê ku peywendîdarî peywendê ne.

• Her endameke/î komê yek yan jî bêtir peyvên digire û wan weki rêberekê bi kar tîne ku şî'reke binoriyê darêje.

• Şî'ran berhev bikin û kolacekê çêkin ku hûn takeşî'reke binoriyê pêk bînin.

• Şunwarekî hîlbijêrin û weki kom şî'ra binoriyê bixwînin û performe bikin.

(4) Şî'rên binoriyê şî'reke nevegêrranî ye ku li ser xusareteke şexsî kovan yan jî xemgîniya kûr derdibirre. Bi zimanê Amharî, weki ‘Ye hazen engurguro’ tê zanîn ku di gerdîşên şîngerandinê yên Hebeşî de ji awayên gelêrî yên derbirranên xusaretê û kovanê ye.





Çalakî

RAHÊNANA DENGÎ

Ev rahênan hevrûbûneke li gel şeweyên potansiyel ên derbirranê sanahî dike ku xweş bi kêr tîn heke rê tê re hebe û ew li qadên giştî yan jî li şunwarên bêmilkkirinê wekî kiryareke protestoyeke sistemîk bîn performekirin.

- Her beşdarek wekî bilêvkirineke înfialê, xusaretê, kovanê, şingerandinê û/yan jî protestoyê sewteke diyar diperisîne.
- Her endamek bi sewta taybet a wê/î peyda kirî komê perwerde dike.

AFIRANDINA RÎTÛWELAN

Rahênana Afirandina Rîtûwelan(5) bi rêya niqaşkirina li gel sawêrên tundûtûjîyê û xusaretê rê li ber peydabûna tebeqeya ezmûnên bedenî xweş dike.

- Der barê gerdîşên şingerandinê yên ciyawaz de gotûbêjê bikin û binemayeke şingerandinê ji her rênimayeke di vir de hatî bijibêrin: sewt, peyv, gotin, zimanê amajeyan, obce û binemaya siruştî.
- Bi biyekkirina binemayên şingerandinê yên ciyawaz ên li jorê diyar kirî rîtûweleke şingerandinê pêk bînin.
- Şunwarekî hilbijêrin û rîtûwela şingerandinê ci bi ci bikin.

- (5) Pirranîya keltorên li parzemîna Efrîqayê gerdîşên şingerandinê yên peywendîdarî şeweyên diyar ên rîtûwelan hene. Rîtûwelên bi vî rengî hedefên ciyawaz hene, lê di peywenda Hebeşî de, armanca rîtûwelên şingerandinê exlebe ew e ku bibîne rêyên sazkirina ragîhanê li gel mirîyan û bîrhatîya wexerkirîyan rûmetyar û pîroz bikin û zindî bihêlin.



Çalakî

PERFORMANSA ŞINGERANDINÊ

Ev beşa çalakiyê rê li ber performansên şingerandinê(6) yên li şunwarên bêmilkkirinê xweş dike ku ezmûneke bedenî bi şingerandinê bi dest ve bê. Tika ye berîya peywendîbestinê mercên qadan bihesibînin ji bo ku hûn xwe ji niqaşên nepewîst ên li gel dewletê bihêvişînin.

- Şunwarên bêmilkkirinê (mercên mêjûyî û hevgerx) gotûbêj bikin û yek yan jî bêtir şunwaran ji bo performansê şingerandinê bijibêrin.
- Rahênanên berê wekî jêderkekê bi kar bînin ku hûn performanseke şingerandinê ya kolektîv darêjin.
- Bi rêya performanseke şingerandinê ya komî bi şunwarê/n bêmilkkirinê yê/n bijartî rahênanê bikin û bi kombendî peywendiyên pihêt li gel wan daynin.

- (6) Gerdîşên şingerandinê yên Hebeşî pirrî caran zimanên amajeyan û bizavan bi xwe ve digirin ku çawanîyên xwe yên performatîv î ciyawaz hene. Projeya 'Xemxurî û Halguhestin'ê lê xebitî van binemayên performatîv wekî kiryarên estetîk û polîtîk pêştir biperisîne.

Çalaki

NIVÍSÎNA DEQA NIVÍSKÎ YA BEREVAJÎ

Ev rahênan rê dide yekê/î ku peywendiyên xurt dayne li gel nivîsîneke deqa nivîskî ya berevajî ya ji bo performansa şingerandinê ya ku di rahênana berê de li şunwarê/n bêmilkkirinê bi rê ve çû. Heke kerese-yên dîtbar wekî beşeke deqa nivîskî bi şeweyekî guncan bân bikaranîn, ew ê bihêle ku mirov bêtir bi hêsanî xwe bigihîninê û wê adepte bikin.

Berîya kariwerîya li gel çalakiya nivîsîna deqa nivîskî ya berevajî ya serekî, çêdibe rahênana asan cotecot bihê kirin. Rahênan dê bi tenê bi rêya derbirrana rûyî, zimanê amajeyan û bizavan li gel hevkarê yekê/î ragihanê saz bike. Bi dû re, her yek ji beşdaran ji ber ezmûnê çîrokekê diperisîne.

- Her kes bila bi şiklê rûyên xwe peywendiyê li gel şirîka/ê xwe dane.
- Her kes bila bi jestan peywendiyê dane.
- Her kes bila bi hereketan peywendiyê dane.
- Her kes bila ji bo xwe wextekê terxan bike û di dema rahênanê de hestên ku ji rûyê şirîkê/a xwe fêhm kirî bi kar bîne û pê çîrokekê binivîse.
- Çîrokê li gel komê parve bikin.

Di pêngava duyem da sê koman ava bikin; her kom, li ser performansa şinê ya ku rahênana berê de hate pêşxistin senaryoyê berevajî binivîsin. Ji bo ku hûn dest bi vê rahênanê bikin, sê pêşniyaz:

- Şertên rojane û dirokî yên mekanê bêmilkkirî yê performans lê hatî kirin çi ne?
- Ji bo pêkanîna performansa şinê çi cûre protokol û stratejiyên bingehîn hatin bikaranîn û çima?
- Çîrokên ku ji performansa mekanî derbûne, tecrûbeyên bedenî, arezû û fikr çi ne?



BERHEMÊN HUNERÎ

- Brown, Trisha, artist. 1971. *Accumulation*. Choreography.
- Mawimbi, Alex (Ato Malinda), artist. 2013. *Mourning a Living Man*. Performance.
- Nkanga, Otobong, artist. 2012. *Contained Measures of Kolanut*. Mixed-media performance.
- Norment, Camille, artist. 2016. *Prime*. Haptic sound installation composed for benches and four voices.
- Wei Wei, Ai, artist. 1995–2017. *Study of Perspective*. Series of photographs.
- Wilcox, Noelle Awadallah Hui Niu & Mihret Kebede, artists. 2018. *An Intimate Exile*. Video, poetry, and dance.

TÊKOŞÎN Û PROTESTO KIRIN

- Las Tesis, Las Tesis, *Un violador en tu camino* [The rapist is you], Chile (2019).
- *Hands Up, Don't Shoot!* Ferguson, USA (2014).
- *Women in Black*, Israel (1988) and internationally.
- *Madres de Plaza de Mayo*, Buenos Aires, Argentina (1977–2006).

CENERÎK

Xemxurî û Halguhestin, xebata Berhanu Ashagrie Deribew. Performansa şingerandinê li qada giştî Addis Ababa, Hebeşistan, 2019. Hevkar: Berhanu Ashagrie, bi Brook Teklehaimanot, Helen Zeru, Kassahun Hailu, Mihret Kebede, Martha Haile, Meron Hailu, Robel Temesgen, Tesfaye Bekele û Zerihun Berhanu. Beşdaran: Amenesheva Admassu, Dr. Elizabeth W. Giorgis, Julien Schmid, Lucie Strecker, Dr. Netsanet G. Michael, Dr. Surafel Wondimu û Tassew Wondimu. Alîgir: Agegnehu Adane, Eyob Kitaba, Ashenafi Mestika, Bekele Mekonnen, Desalegn Worku, Henok Melkamzer, Liya Girma, Meseret Hailu û Emuye Majet. Belgekirin: Habtamu Gebremeskel. Malavayiyên taybet bo koma vekolanê FWF/PEEK “Bê/Milkkirin: Estetîka Pişt-Beşdar û Pedagogîya Xakê.”

JÊDERKÊN VESER

- Cobbina, Jennifer E. *Hands Up, Don't Shoot: Why the Protests in Ferguson and Baltimore Matter, and How They Changed America*. New York: New York University Press, 2019.
- Kedhar, Anusha. “Hands Up! Don't Shoot!": Gesture, Choreography, and Protest in Ferguson.” *The Feminist Wire* (6 October 2014). Online at: thefeministwire.com/2014/10/protest-in-ferguson.
- Palacios, Margarita. *Radical Sociality: On Disobedience, Violence and Belonging*. London: Palgrave Macmillan, 2013.
- de Sousa Santos, Boaventura. *Epistemologies of the South: Justice against Epistemicide*. Boulder: Paradigm Press, 2016.
- Spatz, Ben. “Notes for Decolonizing Embodiment.” *Journal of Dramatic Theory and Criticism* 33, no. 2 (2019): 9–22. Doi: 10.1353/dtc.2019.0001.

↑ Berhanu Ashagrie, *Xemxurî û Halguhestin*, Rahênana nivîsîna deqa nivîskî ya berevajî cotecot, Addis Ababa, 2019

PAŞGOTIN

HEZKIRINEKE REXNEYÎ li ser kêliya hevçerx a başûrê global

Elizabeth W. Giorgis

Bi hizirkirina li ser peywendîyên dayelektîk î firehhêl ên di navbera rajêrîyê û desthilatîyê yên di rastîyên polîtîk û civakî yên Başûrê Global de, kitêba Digel Bêmilkkirinê: Kitêbeke Çalakîyan derfetan çêdike ji bo nimûneyên nû yên texeyyula estetîk a ku xwedanşîyan e tevkarîyê bike li şewandina kirdewarîyeke mirovperwer a nû. Henga ku hunermendên vê projeyê nedîyarîyên dahatûyê yên li Başûrê Global bi şeweyekî giring nas kirin, danezanên wan ên rijd ên ku di laperên çalakîyên cihêreng ên Zîwanên Xweragir de hatine amajekirin jî lê xebitîn ku çareyan peyda bikin ku bikaribûna şeweyekî bidine dahatûyê.

Weku hunermend di serdestpêka kitêbê de amajeyê pê dikan, jêderka wan a sirûşê “epîstemolocîyên Başûr in: têkoşîn da ku bi dûr bikevin (her çend lê bi cî û war bûyî bin jî) ji berhemhênana zanyarîyê ya Ewrûpa-navendî ya serdest.”¹ Wan “ji xwe re kire armanc ku peywendîyeke germ daynin li gel zanyarî û ezmûnên xwecî û binecî yên ku ji alîyê cîhanên cîyawaz ve têne pêşkêşkirin – li têgehane bigerin, ên ku têra rastîyên berçav ên li Başûrê Global bikin.”² Wan şeweyên texeyyulê yên beranber û kombendî yên welatîniyê û jîyana polîtîk vekolan. Wan peywendîyên germ danîn li gel nasnavên polîtîk ên nû û rewşên babet ên ku bi berdewamî berê xwe diguherînin, firehhêl û derezmûnî ne. Tevî ku ew li şeweyên dîyarkirî yên pênasekirina dernavendîkirî hûr bûn, çendîn faktorên zehf giring dubarebar û bînavbirî man. Wekî têgeha welatîniya hevçerx xût li başûrê global bûye warê kaş

û berkaşa pêdagir, ev kategorîyeke binçîneyî ye ku hunermendên Zîwanên Xweragir bi kel û şewat bi bîra me dixin.

Vegêranekê zortirîn şayanî behsê û berfireh a ku hunermend bi pêş de tînin mêjûya babeta li Başûrê Global e ku hunermend zareve dikan wekî babeteke aloz û firehtewqî ye ku, çî di dorbenda netewedewletê de çî jî li derî wê, em bes dikarin bi rêya sazûna mêjûyî ya neyeksanîya regezî, cinsîyetî û çînî fam bikin. Hunermend hêza sermayeya global didine ber jêpîrsînê, ya ku bi hûrgilî cihêti û tixûb danîne çî ka kî tê de ye û kî ne tê de ye. Bê guman, ev mafên endamîyê yên bendkirî li Başûrê Global li ser asteke giring dikevîne ber çavan û hunermendên Zîwanên Xweragir qeyrana xweser li warên dîyarker bi şarezayî û bi hêza xeyalê vedibînin. Wisa jî giring e dema ku ew têgeha “Bêmilkkirin”ê bi şeweyekî rexneyî vedikolin ku ji serçaveya tor û jêrxaneyê aborîyî ya firehneteweyî ya bere bere rapêçkar dizê. Weku kitêba wan a çalakîyan berpêş dike, “Li jê ronahîya tundûtûjîya hovane û talan û tajana kavilker, em ji xwe re ketine pey çîrokên ku me dixwest em di cîhanên jîyanê yên li jêr gefa rehbirbûnê de vegêrin û vegêrineve. Gelo em dixwazin li kîjan çîrokan guhdarîyê bikin, dema ku ekstraktîvîzma firehneteweyî, tundûtûjîya dewletan, şeweyên nû yên şer³...”

1 Koma Lêkolanê ya Zîwanên Xweragir “Bêmilkbûnê Giringiya Xwe Heye: Vexwendinek” di vê cîdê de 9.

2 Ibid.

3 Ibid., 10.

Têgeha bêmilkkirinê ya ku hunermend raber dikan di her tomareke çalakîyan a hunermendan de bi şêweyekî kartêker tê pênasekirin. Wekî pêdivîyeke cîyê lezê heye ku ji bo cureyên bêmilkkirinê hemûyan em cîgehên pêguhêr û bedil ên axiftinê û gotûbêjê biafirînin û ev yek bê qam giring e. Xût jî ji ber mercên aborîyî û polîtîk ên xumamî, guhêrbar û nedîyar e ku îstimlaqkirina erdan yan jî şêweyên dîtir ên bêmilkkirinê nişan didin ku wate û sepanên misoger ên azadîyê, dadperwerîyê û mafên polîtîk di demên hevçerx de hindî ku çû bêtir şêlî bûn.

Û ew ev jêpîrsîna bêmilkkirina cîyê qedperestîyê ye ku hunermendên Zîwanên Xweragir bi şêweyekî rexneyî kar pê dikan ku ez jî dixwazim di peywendên Hebeşistana hevçerx de xwe bispêrimê, li kê derê bizaveke protestoyê ya têvel û hê jî li ber geşedanê binçîneya nîzameke polîtîk hejand. Lê gelo çi encam da? Kirdeyên berxwedanê neşîyan têkoşana xwe ta bi jîyaneke polîtîk a veguherîner fireh bikin. Ron û eşkere ye ku li Hebeşistanê hizrên nû der barê welatîniyê û aîdîyetê de tene pêkanîn, hizrên li ser bingeha cografya û nasnava li ser bingeha nijadî. Serwerîya nîştîmanî bûye mijara gotûbêjê û welatîni jî nû ve tê hizirkirin, ne ku wekî peywendîdarî netewedewleta serwer, lê wekî peywendîdarî vebijarkên ku tene mexderê bo şêweyên nû û firehhêl ên aîdîyetê û nasnavê. Û di vê peywendê de ye ku kaş û berkaşên îro ro yê li dora levakirina erdan, daxwaz û mafê bo bikaranîna erdan li ser asteke giring derdikevine rastê. Ne cîyê gumanê ye, milmilaneya di navbera serwerîyê û şêweyên pêkhatî yê welatîniyê de bi zalbûna aborîya global ve girê dayî ye. Ji vê hêlê ve, kontrola li ber zêdebûnê ya sermayeya firehneteweyî li ser aborîyên me û jîyanên me yê civakî gurrayî bi heramoyîkirinên sistematîk da û tevkarî li şêwegirtina nasnavên polîtîk ên neseqamgîr kir.

Lewane ye ezmûna Hebeşistanê bikaribe bibe egera peydabûna berhengarîyên hevbeş li dijî peywendên

hevçerx ên bêmilkkirinê û li dijî pênaseyên mafên welatîniyê û aloziyên wê di peywendên xweser ên Başûrê Global de. Bo nimûne, heta hê ve axirîyê, (dawîya 2019an), Hebeşistan bi zêdetir ji 1.4 milyon kesan ve, ku bûne penaberên li nava welêt, di bîyavê koça zoremilî de li cîhanê di rêza pêşîn de bû, bi 1.2 milyon kesan ve jî Sûrî di rêza duyem de bû. Tevî ku rewşên dubendîyê aloz in, dijberîya li ser tixûban, levakirina erdan di navbera komên nijadî de û endamî û resenîya nijadî, di nava gelek faktorên de, faktorên arizî bûn bo zêdebûnê ve axirîyê yê warşihîbûnê, bêmilkkirinê û tundûtûjiyê. Ji ber vê peywendê aloz a bêmilkkirinê û warşihîbûnê, pîrsên welatîniyê jî ve axirîyê qewitir bûne. Bi sistematîkî desteserkirina erdan, ku bi awayên bi qeterehmî misoger û nemirovane hat birêvebirin, zor da ser warşihîbûneke nedîtî û nebînayî. Heramoyîkirina jî ber bêmilkkirinê û warşihîbûnê jî ber hindê mehfa mafên welatîniya yeksan anî.

A rast, mêjûya polîtîk a aloz a Hebeşistanê ya di sedsala 21em de mişt e jî nedîyarîyan. Ji aydîyolocîya împeryal a mutlaqîyetî ta bi sosyalîzma zanistî, ji pênaseyeke Stalîngerî ya serwerîya nijadî ta bi xeteke çepgir a navendîparêziya demokratîk, ji dogmayên geşedana aborîyî ya bi pêşengîya partîyê ya pêşdar ta bi rakêşerîyên naîv î hevçerx ên karnameyên neolîbiril ên xwemalîkirinê, kêmkirina rêzikên dewletê û birêvebirina cîgayî, veguheranên tundra di aydîyolocîyan de qewimîn. Ron û eşkere ye ku protestoyên cemawerî û tund û tûj ên 2015an lebt û liv da jihevketina Bereya Demokratîk a Şorişger a Gelê Hebeşistanê (EPRDF) ya ku jî têkçûna cûntaya serbazî di sala 1991ê de û vir ve li ser desthilatê bû. Kêşeya mafên bo erdan katalîsteke tewereyî bû bo pêlên protestoyê. Endamên dijber ên ji heman partîyê, ku wehda gorankarîya berfireh dan û pê ve, di 2017an de rêveberîya dewletê bi dest ve anîn. Ev devîdevî sê salan e, pêlwanên nû yê desthilatê hê jî kar bi wî


tûrikê peyvan ê polîtîk ê pîjker dikan ku bi kêrî wan hat wekî di 2017an de ew bêne ser desthilatê. Di gel vê hindê ev luxet bere bere qels bû hindî ku çû kêşeyên dor li îstimlaqkirina erdan û encamên wê yê qanûnî yê berfirehtir bo mafên welatîniyê girtî hê jî çareser nebûn û qeyraneke aborîyî ya ku dawî lê nayê berdeyam e ber li xwe fireh dike. Dewlet tîne bi hewildanên aborîyî yê neolîbiril ve dest li vê rewşa dijwar hiltîne ku van hewildanan axirîya xwe bi xwe re neanîn û xerabtir li jîyana hevvelatîyan anîn. Wekî din jî, tofên polîtîk pê de pê de bêtir ji hev belav dibin û bi pêş polîtîka û sepanên bêmilkkirinê ve bi awayekî neyekser lezê didine şilqana xeternak a polîtîkayên nasnavgerî.

Be daxawe, kirde û ektîvistên polîtîk ên çalak ên nemaze di van sê salên borî de derketî mexderê lê dixebitin ku berhengarîyê bikin li şêweyên bêdadîyê yê ku seretayî jî ber îstimlaqbûna erdan peyda bûne jî ber kêmserwextîya bayîsan jî projeyên bi darê zorê yê neolîbiril î global û êrîşa wan a tund a hovane da ku erdan bixine destên xwe; bi mebestên veberhênanê û bi navê berjewendîya gelemperî ya ku geşeyê dide bi gef û çewisandinê erdan desteser dikan, lê dawîya dawîn mafên mirovî û medenî yê mirovan dimehînin û îstimlaq dikan. Ne cîyê gumanê ye, aîdîyet bi rêya xwegihandina bo û bêparbûna jî tiştê ku yek wî erdê xwe dihesibîne durist dibe û gotûbêj dibe. Berkendalbûna mafê bikaranîna erdan e ku ya ku dêredêrî anîye nava jîyana polîtîk û medenî. Çîna bijarte ya rewşenbîr jî tûşî xiringêleyeke ramanî bûye ku, bêtir ji neyeksanîyên aborîyî yê ku li paş perdeya zêdebûna tixûbdanînen navxweyî yê li ser bingeha nijadî ya ku jî bêmilkkirinê dizê, dêhn û bala xwe dide rewşên qanûnîbûnê yan jî tixûbên li ser bingeha nijadî danayî. Bizavên polîtîk ên kombendî yê ku çewisandinên borî, rastîya çewisandinê û setmeborên polîtîk ên roja îro enelîz dikan hatine rawestandî. Û berjewendîyên bêhêzan careke din jî ber nedîyarîyan bûye wek seradê.

Ji ber ku siruştaya aydîyolocîya neolîbiril û peywendîya wê ya li gel faktorên civakî, aborîyî û keltorî tene feramoşkirin, faktorên dîyarker î rastîn ên li pişt qeyrana roja îro ya daxwaz û mafên bo erdan jî tene bindoşekirin. Di dewsê de, şêweyekî zexmandî yê polîtîkayên nasnavgerî radihêle gotarê bidêre bo korerêya neyeksanîyan ên ku polîtîkayên aborîyî yê neolîbiril pê berdeyam in ku ferz bikin. Hestgermîyên firehhêl ên neteweperestîyê hangava bûtîk dan û dewleta neteweyî ya Hebeşî wekî çarçoveyeke binçîneyî ya ku daxwaz û mafên bo erdan biparêze êdî text û bextê xwe nîne.

Polîtîkayên û cografyaya sermayeya global û şêweyên tepeserkirina dewletê ya ku bi berfirehbûna gurr a sermayeyê re tê şêweyekî rabêjeke global a bizvandî pêwîst dike her wekî şêweyê ku hunermendên projeya Zîwanên Xweragir lê dixebitin bînin. Hunermendên Zîwanên Xweragir me vedixwînin ku em li dora pêstûrîya demê hizra xwe bikin. A rast, polîtîkayên cografyaya bajêr, bêmilkkirin û warşihîtkirin, hayirarkîyên welatîniyê, aîdîyet û nasnav, jêrewtên nû yê dinavdebûnê û heramoyîbûnê jî gelek faktorên in ku sax di naverasta gotûbêjên hevçerx, bizav û têkoşanên Başûrê Global de ne. Ku seretayî çêlî mamik û girêfokên bi wî rengî yê bi dewleta postkolonyal dikan, hunermendên Zîwanên Xweragir me han didin ku em dinyayeke gotarî ya berfirehtir biafirînin ku tê de em bikaribin der barê ezmûnên kombendî yê Başûrê Global de li hev biaxêvin.

SERVEHÎ
ZÎWANÊN XWERAGIR
PROTOKOL



Dawîya dawîn, rewîştzanîyeke girîftîyê bi rêya berdana epîstemolocîyên împeryal û kirina berhemhênana zanyariyê navgîneke veguherana kombendî bangê li êkolocîstên polîtîk dike ji bo derawaya me ya polîtîk bibine berpirsyar.

— Juanita Sundberg, “Ethics, Entanglement, and Political Ecology” (“Rewîştzanî, Girîftî & Êkolocîya Polîtîk”)

Amraz

PROTOKOL JI BO XEBATA BI HEV RE

Ev protokola xebatê belgeyeke bernivîs e bi mebesta ku her endameke/i komê dê tevkarîyê li wê bike û wê dewlemend bike ji aliyê komê ve û li komê hatiye pêşniyarkirin. Reng e gelek ji me li gel pirraniya rêkarên berpêşkirî aşna bin, lê ew li vir careke din bi zelalî û bi ser û ber têne beyankirin. Hizr û pêşniyaz, fîdbek, şirove, pêşniyar û rexneyên bêtir li ba me zehf meqbûl in.

I. CIVÎNÊN LÊKOLÎNÊ

1. ERKÊN BIRÊKXERÊN CIVÎNÊ

Ji bo her civîneke vekolanê, du kes dibine berpirsyar da ku bibine birêkxerên serekî.

- Birêkxer bernivîsa nexşeyeke bihûrgilî durist dikin û cîyên civînan ên rojên me yên xebatê (b.n. ji Sêsemê ta Înê, du mehan carekê) diyar dikin.
- Birêkxer berdehamiyê li gel civîna bihurî misoger dikin û ‘esehiyê dikin ku mijarên berbiryar bêne helsenandin.
- Birêkxer ragihana çî di nava komê de, çî jî a li gel mêvanên vexwendî sanahî dikin.
- Beriya û di henga civînê de ji bo beşdarîyên diyarkirî birêkxer erkan dispêrin (b.n. kî nişeyan binivîse, kî bibe demgir, kî ji belgekirinê berpirsyar be).
- Birêkxer rêyên berhemdar ên pêşkar, hevwarer û pevguhestina fîdbekê berpêş dikin.

2. HER CIVÎNEK DEST PÊ DIKE BI

- Gotûbêjkirina nexşeya çalakîyan a hefteyê (ya ji aliyê birêkxerên serekî ve ji pêş de belav kirî),
- Gotûbêjkirina hedefên çalakîyan,
- Diyarkirina armanc(ên) civîna giştî,
- Belavkirina karên ku bêne kirin.

3. HER CIVÎNEK KUTA DIBE BI

- Fîdbek, rokirin û pîvan û nirxandina hefteyê,
- Gotûbêjkirina û danîna bernivîsa nexşeyeke sinêde ji bo civîna bê,
- Belavkirina karên ku bêne kirin,
- Çêkirina kurteyê dengî ya tomarkirî ya ku dubare qala xalên giring ên kar û xebatê/lêgeranên serekî bike (di nava yên ditir de, bihêle ku ew ên negihîştî ser civînê xwe bi asta civînê re bigihînin).

4. RAGIHANEKAN

Ta êsta, kom piçekî hêdî bû wekî bi rêya e-peyamê bersivê bide û dirêjîyê bi axiftinan bide. Gava ku reng e bandor li enerjîya kesa/ê şandyar dike, ev yek leza qonaxa ragihanê jî kêmtir dike. Ji layê pirsên e-peyamî yên li ser zanyariya bingehîn ve, em ê hewil bidin ku di nava du rojan de em bersivê bidin.

5. MÊJÛYÊN RADESTKIRINÊ/ SPARTINEKAN

Ta êsta ji bo me pirr û gelek sedem hebûn wekî me spartina kerese-yên vekolanê bi derengîyê xist. Em dixwazin bêtir xwe bidinê ku em spartinan di dema xwe de bikin û, di heman katê de, em ê hewil bidin ku em rastîbîntir bin dema ku mijar diyarkirina mêjûyên radestkirinê be.

Amraz

II. PEYWENDÎ

1. BERSIVÊN E-MAILÊ

Heya niha, komê bi rengêkî hêdî bersiv da û bi e-mailê sohbet kir. Ev yek dibe ku bandorê li ser enerjîya şanderê/a e-mailê dike û proseya ragihandinê hêdî dike. Derbarê pirsên e-mailê yên girêdayî agahiyên bingehîn, me li hev kir ku em di nava du rojan de cewabê bidin.

2. DÎROKA DAWÎ YA RADESTKIRINÊ

Di sertaserê proseyê de, gelek sebeb hene ku em materyalên lêkolînê dereng bişînin. Em dixwazin bêhtir li ser soza xwe bin ku em hewl bidin ji bo materyalan di dema diyarkirî de bişînin û di heman demê de li ser soza xwe bin ji bo diyarkirina dîroka dawî ya radestkirinê.

III. TEVKARÎYEKAN

Di nava vê projeya hevbeş de, hindêk endamên komê bi hizran, kitêban û projeyên hunerî ve bi şeweyekî çalaktir tevkariyê dikin, lêbelê yên mayîn sexbêriyê, locîstîkê û piştevaniya dilnî dabin dikin yan jî bi tîrquetîrê û yarîkeriyê cîyê qewamê dewlemend dikin. Ev çêdibe kartêkeke kesayetiyên cîyawaz, pişdarîya kesên xwedanên ezmûnên û paşxaneyên cîyawaz li komê bihê hesibandin. Di xebata kombendî de gotûbêjîkirin û êşandina serê xwe bi cîyawazîyan zor giring e da ku ew reqî nava peywendiyên asimetrîk nebin ku binçîneya daynamîkên komê dirûxînin. Pesenda tevkariya her endamekê/î giring e, çawa ku eşkereyîya bo çêlîkirina ji rageşîyan, kaş û berkaşan û dubendîyan. Wekî din jî, me armanc e ku em bibine komeke ku bi civakî hestgerm be û bikaribe bi şarezayî bixwîne û ji şeweyê devkî û bi wê de ji hev fam bike. Ev beşeke sexbêriya qonaxa komê ye.

1. TEVKARÎYÊN NIVÎSKÎ

Sêla esmanî: “Sêla esmanî” ya vekolanê asoya hevbeş a projeyê ye, ji bo ku ji perspektîvên û peywendên cîyopolîtîk ên cîyawaz de nêzikayî di wê tê dayîn. Pê têgehên her wekî xeta dojehî, jîyana xweş/buen vivir, firehgerdûn, hizirîn/ hestkirin, lê her wiha xalîxerezîya spî, sawêrekan, cinawirekan, fulgor, komên kavilan, sêla esmanî “girêkan” dabin dike ku binemayên projeyê bi hev ve digirin. Lewma, giring e ku her lêkolanek peywendîya xwe ya li gel sêla esmanî pênase bike û pevgerêdanan ron bike hem bo endamên komê, hem jî bo xwînerên di dahatûyê de.

Amrazekan: Ji bo ku me bikaribûya di nivîsîna xwe ya kombendî de hevgerî bi ser bixista, di gel cîyawaziyên takekesî û şewazên nivîsînê, me ji bo nivîsînê takekesî xetên serekî danîn. Her endamekê/î komê berpirsyar e ku (bi qasî ku pêk bê) bide ser van xetên serekî.

Erkên nivîsîna kombendî: Her cara ku erkeke nivîsînê ya peywendîdarî projeya me ya hevbeş hebe, em dixwazin xerîkî wan yekan bibin ku dibêjinê, “sê-in”:

- Kesa/ê yekem bernivîsa deqê amade dike,
- Kesa/ê duyem li ser bernivîsê dixebiteve,
- Kesa/ê sêyem dirûvê dawîn dide deqê.

Amraz

2. NIVÎSÎNA TAKEKESÎ Û KOMBENDÎ

Nivîsîna takekesî

Her endamekê ê der barê lêkolana xwe de bi takekesî bixebite. Em dinivîsin, fîdbekê dabin dikin û wê hingê di pey re dinivîsîneve. Her endamekê/î kome dikare hizrên nivîsîna xwe ji bilî mebestên projeya me ya vekolanê ya hevbeş ji bo mebestine dîtir bi kar bine. Di gel vê yekê, eger hat û jêwergiranên hevpuخته hatine bikaranîn, giring e ku wekî komekê qala me, wekî piştevana darayî qala FWFyê û wekî mazûban qala Peymangeha Hunerên Ciwan a Vîyanayê bihê kirin.

3. PÊŞKÊŞIYEKAN

Dema ku pêşkêşiyên endamên komê hebin, cîyê berhemdariyê ye ku xalên li jêrê hatî bîne raçavkirin:

AMADEKIRINA PÊŞKÊŞIYAN: Em ji Eve Tuckê fêr bûn ku henga hûrbûna li şûnwêr bi hemû taybetî û giriftiyên wî hemûyan ve her yeke/î ji me çî qasî kûrtir noqî peywenda vekolana xwe bibe, binema bi wî qasî zêdetir dikarin tevkariyê li sercema projeyê bikin. Pêşkêşî dewlemendtir dibin dema ku ew bi nimûneyan amajeyê bi giringtirin pirsan, armancan, têgehên û azîneyan dikin û, di heman katê de, rê didine bêberevanîyê û berê xwe didine duleman, dijwariyan û negengazîyan. Kom wê hingê dikare di nava vekolana kombendî de “girêkên” pevgerêdayîtiyê pênase bike û li ser van “girêkan” bi kombendî bêtir bixebite û wan bizeximîne.

FÎDBEKA GERÛYÎ: Ji bo fîdbeka rexneyî, ji bo her pêşkêşiyê em dixwazin endamekê/î komê erkdar bikin ku xûlên fîdbekê hevwar bike. Ji bo ku dibe jê re bêtir zanyariya veser yan jî bêtir demê bivê ku fîdbekan dereve bike, ev fîdbeka gerûyî dibe ku yan jî nabe ku li cîyê cî bihê dayîn.

REXNE: Xebitîna bi kartêkerî wekî komekê pêdivî bi eleqedarbûna bi hev û din heye. Dibe ku her tim ne hêsan be ku ev yek bihê domandin, lê hêja ye ku mirov bêtir xwîne ji xwe berde wekî wisa bike. Me armanc e ku em bi rastî û bi rexneyî serê xwe bi xebata hev û din biêşînin. Tê heye ku rexne ronahiyê berde ser xalên kor, nakokîyan, dulemên rewîştî

û derawayên mixrik; pêwîst e ku proje bizexime û werar bibe. Ji vî layî ve, rexne rahênanê merdîyê û dilsoziya hizrî ye. Di gel vê yekê, giring e ku mirov bihêle rexne avaker be. Ji bo ku mirov wisa bike, tê heye ku kêrhatî be ji bo keseke/î ku rexneyê tine heke berîya axiftinê pêşî bersivên xwe yên hestgerm venihêre, dibe ku bine nîşeyan binivîse û wan berfireh bike ji bo ku xwe bihêvişîne wekî berê rabînanên xwe yan jî nîgeranîyên xwe nede ser kesên dîtir.

TERXANKIRINA DEMÊ: Dem ji bo her pêşkêşiyê dikare li gorî naveroka wê bihê biserûberkirin. Cîyê berhemdariyê ye ku mirov bihizire wekî dema pêdivî ji bo pêşkêşiyê, li gorî kereseiyên û hizrên ku di carekê de bîne belavkirin, çêdibe serê her kesekê/î biguhere. Bi hesabê yeka li jorê hatî, sûdmend e ku ji bo her pêşkêşiyê mirov kêmtirîn û zehftirîn demê terxan bike, rê bide takekes(ê) ku biryarê bide di nava navbirriya pêşniyarkirî ya demê de çî qas dem pêdivî ye ji bo pêşkêşîya wê/î.

